

Nûbihar

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ



- ▶ Neyê serê dijminan jî... **Süleyman Çevik**
- ▶ Bersivêk ji bo Zana Farqînê **Perwîzê Cîhanî**
- ▶ Sar bûn şevên Diyarbekirê **Rojen Barnas**
- ▶ Tê li xwe werî xezebê **Berken Bereh**
- ▶ Peyva "ol" ji kîjan zimanê tê? **Huseyn Şemrexî**
- ▶ Mela Ehmedê Heyderî **Abdurrahman Adak**
- ▶ *Parîsabad* Enînivîseke Parîsê **Rohat Alakom**
- ▶ Seyyah **Hasan Huseyin Çevik**
- ▶ Serencama Pisîkê **Bro Omerî**
- ▶ Îbnu'l Ezreq û berhema wî **Ercan Gumuş**
- ▶ Bi Thomas Ripper re li ser Merwaniyan
Hevpeyvîn: Abdullah İncekan
- ▶ Mamostê min **Raîfê Bêçare**
- ▶ Berriya Mêrdînê û Qaçaxî **Konê Reş**
- ▶ ez ji Berlînê **Selîm Temo**
- ▶ Nanê Kel **Hatîce Mollakendî**
- ▶ Di edebiyata nivîskî de rola bajarê **Zilkîf Xweşhevî**
- ▶ Vajeya didîy **Bedîuzzeman Saîd Nûrsî**
- ▶ Memo, her bîji **M. Emin Bozarlan**
- ▶ Ji bo yekîtîya zimanê Kurdî **Mihemed Elî Ewnî**








SAL: 19 CILD: 15 BIHA 5 TL




DOSYE | REWŞA EDEBIYATA ZAROKAN

Amadekar Rojbîn Özkan, Ramazan Pertew,
Zeynelabidin Zinar, Ali K., Ali Çiftçi, Selman Dilovan

Ji Nûbiharê! berhemên nû!



Ji kelepora Kurdî



Li ser navê Pak Ajans Yayıncılık
Ltd. Şti. (adına)
Xwedî û berpirsiyarê Nivîsaran
(Sahibi ve Yazı İşleri Müdürü)
Süleyman Çevik
Büyük Reşit Paşa Cad. Yumni İş
Merkezi No: 22/29 Vezneciler/
Beyazıt - İstanbul
Tel&Fax: (0212) 519 00 09
www.nubihar.com
nubihar@gmail.com
Navnîşana Nameyan
P.K. 80 Fatih - İstanbul
Nûnertiya Almanya
Burhan Kaya
kizilkaya_burhan@yahoo.de
Tel: 0234 - 7922968
Kovara Nûbihar ji 3 mehan carekê;
Payız, Zivistan, Bihar û Havînê
tê weşandin.
Berg û rûpelsazî
Dawud Rêbivâr
Çapxane
Alioğlu Mat. Bas. Yay. ve Kağ. San.
Tic. Ltd. Şti Orta Mh. Fatih Rüşti
Sk. No: 1-3/A Bayrampaşa/İST.
Tel: 212 612 95 59
Yayın Türü: Yerel Süreli
Berdêla abonetiya salane
Tirkiye: 25 TL
Welatên din: 25 EURO, 30 \$
Jimareyên Hesaban
Hundirê Tirkiye:
Postgiro (Posta Çeki)
Süleyman Çevik: 658265
Süleyman Çevik, İş Bankası Laleli
Şubesi: 1084-0363459
Derveyî Tirkiye: Süleyman Çevik,
İş Bankası Yavuz Selim Şubesi:
1079-30100-3118770

Mesûliyetê ramana
nivîsaran aîdê nivîsaran e.
Berhemên hatine sandin bi san de
navên veşerandin.

Neyê serê dijminan jî...	
Süleyman Çevik	03
Bersivek ji bo Zana Farqînî	
Perwîzê Cîhanî	05
Sar bûn şevên Diyarbekirê	
Rojen Barnas	11
Tê li xwe werî xezebê	
Berken Bereh	12
Gelo peyva “ol” ji kîjan zimanî tê?	
Huseyn Şemrexî	13
qewarok	
sidîq gorican	13
Helbestvanê Muhbet û Xurbetê: Mela Ehmedê Heyderî	
Abdurrahman Adak	17
Lal	
Osman Îzol	20
Parîsabad Enînivîseke Parîsê	
Rohat Alakom	21
Seyyah	
Hasan Huseyin Çevik	23
Serencama Pisîkê	
Bro Omerî	24
Îbnu’l Ezreq û berhema wî “Tarîx’ul Meyyafarîqîn û Amîd”	
Ercan Gumuş	25
Nê Qûlî Dest Di	
Şaban Şenatesş	31
Bi Thomas Ripper re li ser Merwaniyan	
HEVPEYVÎN: Abdullah İncekan	32
Mamostê min	
Raîfê Bêçare	36
Berriya Mêrdîfînê û Qaçaxî	
Konê Reş	37

ez ji Berlînê	
Selîm Temo	39
Nanê Kel	
Hatîce Mollakendî	41
Bersiva kund û titî	
Seyda Ronahî	43
Di edebiyata nivîskî de rola bajarên û nimûneya Petersburgê	
Zilkîf Xweşhêvî	44
Em zêde neçin û neyên	
Selman Dilovan	48
Siûda bextewariyê	
Yılmaz Güney	52
Newroz	
Cemil Tellî	52
DOSYE Rewşa Edebiyata Zarokan Amadekar: Rojbîn Özkan	
Zarok û edebiyata bi zimanê zikmakî	
Ramazan Pertew	54
Di Çanda Kurdî de zimanekî zarokan ê taybet heyê ku ew pê dipeyivin	
Zeynelabidin Zınar	60
Şûna edebiyata biçûkan di edebiyata Kurdî de	
Alî K.	62
Li Ewropayê rewşa edebiyata zarokên Kurdan	
Alî Çiftçî	65
Mijara kitêbekê çî perwerde û exlaq be, çî jî mîzah û îronî be divê zarokane be	
Selman Dilovan	66
Min bihîstiyê tu qesda seferê dikî	
Mewlana Celaleddînê Rûmî	67
Ji Farsî: Hayrullah Acar	
Di wêjeya Kurdî de çend çîrokên dersdar	
Dilşad Mûtî	68

Dapîra Meyremê	
Hesen Polat	71
Çîroka pîrika Helîmê	
Rahmetullah Karakaya	73
'Hesretê Dewi	
Quda Arxwasî	77
henasa cinan ez girtim	
Kamran Simo Hedilî	77
Vîdono	
Ahmet Gemî	78
Gul	
Yılmaz Yalçın	79
Vajeya didîy	
Bediuzzeman Saîd Nûrsî	80
Payîz	
Jiyan Ahmed	81
Memo, her biji	
M. Emin Bozarslan	82
Mûraya sîya	
Ömer Faruk Çetinkaplan	84
Xewn	
Murad Pola	85
Tu	
Mehmet Öncü	85
Ji bo yekîtiya zimanê Kurdî	
Mihemed Elî Ewnî	88
Tewecuhê Xews / Xewsê Hîzan (Seyîd Sibxetulah)-Xeyda	
Ji tîpên erebî: Sîpanî.	90
Zimanê Medreseya Zehrayê û Dibistanên	
Herêmî Gernas	91
Te nizanîbû	
Şemoyê Memê	94
Li pîrsa Kurdî nêrîna bê pîrsgirêk	
Zahit Özkan	95



Neyê serê dijminan jî...

SÜLEYMAN ÇEVİK

ceviksuleyman@hotmail.com

Min cara pêşî navê Wanê, di zaroktiya xwe de bi gotina “Dunyada Wan, axîrette îman”ê bihîstibû.

Ev gotin çawa ketibû zimanê me ez nizanim, lê dema behsa bajarê Wanê dibû, ev gotina ku bi zimanê Tirkî bû bêhemd ji devê me derdiket.

Her çiqas me bajarê Wanê nedîtibû jî ji maneya vê gotinê dihate fêmkirin ku Wan cihekî gelek xweş e.

Ji bo merivê misliman îman li axîretê çiqas tiştek lazim û şert e, bi vê gotinê xuya dibû ku ji bo kêf û rehetiya dunyayê jî bajarê Wanê jiyar li meriv ewqas şêrîn û xweş dikir.

Ya Rebbî! Ev gotin, çiqas gotinek bi îddîa bû!

Bi derbasbûna dem û zemên re min dît ku ev gotina han li gelek deveran li ser zimanan digere û di nav xelkê de zêde belav e.

Herkesî xweşbûna Wanê tesdîq dikir.

Weke ku bihuşta vê cîhanê be behsa Wanê dibû; eger weha neba, çawa meriv dikarî ev bajara bi “îmanê” qiyas bikira û biqasî îmanê qîmet bida “xweşbûna” Wanê?..

îmanê qîmet bida “xweşbûna” Wanê?..

Merivê bawermend dema dunyaya xwe diguherîne dixwaze ku bi îmanê saxlem û tam here hizûra Xwedê.

Em dema ji yekî re dua dikin dibêjin, Xwedê îmanê bide te...

Ji bo merivên bawermend îman ewqas tiştekî muhîm e.

Heqîqeten jî kesên dîtine dizanin, di nav wan bajarên me de cihekî mustesna ji bo Wanê heye.

Sed sal berê ustad Bedîuz-zaman xwestiye ku li vê derê bi navê Medresetuzzehrayê zanîngehekê ava bike. Ustad hetanî dawiya umrê xwe jî li ser vê niyeta xwe maye û ji bo vê yekê xebitiye.

Gelek taybetiyên Wanê jî hene. Bi pisîka xwe navdar e, behra wê û cihên wê yên turîstîk hene.

Wan cihekî dîrokî ye jî. Payetexta dewleta Urartuyan bû û Urartuyan li gor dema xwe li vê derê medeniyetek mezin ava kiribûn. Dewletên wekî Hurrî,

Weka ku bihuşta vê cîhanê be behsa Wanê dibû; eger weha neba, çawa meriv dikarî ev bajara bi “îmanê” qiyas bikira û biqasî îmanê qîmet bida “xweşbûna” Wanê?..

Hîtût, Pers, Med, Sasanî, Bîzans, Selçûqî, Sefewî, Osmanî û wekî din gelek dewlet û begitiyan jî li Wanê hikûm kirine.

Ev Wana ku bihuşta welatê min e, mixabin van demên dawî li pey hev rastî du felaketên mezî hat.

Berê di roja 23yê Çiriya Pêşîn de Erdîş, paşê jî di 9ê Çiriya Paşîn de bajarê Wanê bi felaketa erdhejiyê hejiya û di vê serma û zivistanê de ji her komî gelek meriv mirin; yê sax jî bê xanî li der û dora man.

Çi heyf û mixabin e ku îro Wan hilweşiyaye, vala maye.

Mala me xirab bû...

Berê Erdîş, paşê jî Wan ser û bin bû.

Em dua dikin, dibêjin, "Xwedê îmanê bide te", dema em nîfir jî dikin dibêjin, "Xwedê mala te xirab bike"...


Mala me xirab bûye...

Bajarê behrê, Wan a bi hewa xweş û qezaya wê Erdîş xirab bûne...

Bihuştên me wêran bûn.

Xanî hilweşiyane.

Zar û zêçik mirine.



Zarok sêwî mane.

Bav û dêyan cîgerên xwe wenda kirine.

Kar û ticaret sekiniye.

Xelkê Wan û Erdîşê koç kiriye û ev koç dewam dike.

Heta doh Wan û Erdîş bihuştên me bûn, îro xelk ji wan direvin.

Li gor ku dibêjin li Wanê kesekî nemaye. Dibêjin, bi reqamên gelek zêde xelk çûye deverên din.

Hinek kes ji bo zivistanê derbas bikin çûne bajarekî din, cem merivên xwe. Hinek meriv jî ji binî ve ji Wanê çûne û bi îhtîmaleke mezin careke din venagerin.

Ma neçin wê çî bikin, di vê serma zivistanê de, di van ça-

diran de kî dikare îdare bike? Hem erdhejî, hem serma. Emê li ku derê sitar bibin?

Li alîkî erdhejî bi ser me de hatiye xan û manên me xirab kirine, li aliyê din şilî û şipiliya berf û barana zivistanê...

Di vê serma zivistanê de zarok, jin û extiyarên welatê min di çadirên sar û şil de li ber xwe didin.

Digel ewqas bela hatine serê Wanê jî ji ber endîşeyên siyasî hikûmetê dîsa jî ev der "herema afatê" îlan nekiriye...

Bajarê herî xweş wêran e.

Bihuşta me vegeriya dojhê.

Ya Rebbî tu neynî serê tu kesî...

Tu neynî serê dijminan jî...●

Înna lîllah we îinna îleyhî racîûn

Di roja 23yê Çiriya Pêşîn de ERDÎŞ, di 9ê Çiriya Paşîn de jî bajarê WANÊ rastî felaketa erdhejê hat.

Di vê erdhejê de gelek kes mirin û gelek kes jî birîndar bûn.

Xelk di vê serma û zivistanê de di çadiran de ye.

Em ji yê mirî re ji Xweda rehmetê, ji xizm û malbatên wan û ji hemû gelê WANÊ re sebr û metanetê dixwazin.

Bersivek ji bo Zana Farqînî

PERWÎZÊ CÎHANÎ

*Es'habê kemalê perdepoş in
Erbabê 'xerez di pirrxuroş in
Xanî*

Ferhengnivîsê me yê hêja Zana Farqînî nivîsarek li ser şiroveya min ya li ser Mem û Zînê nivîsiye û li kovara Nûbiharê hejmara 115ê da daye weşandinê.

Ez berî her tiştî sipasiyê li hêja Farqînî dikim, ku ew pirtûk bi çavekî rexnekarane xwendiyê û dîtînen xwe li ser nivîsîne. Ez pirr şad dibim, ku hêja Farqînî ew wêrekî û huner kiriye û li ser babetek wisan bîr û hizrên xwe ragehandiyê.

Lê mirov hînga dikare li ser babeteke zanistî rexneyeke serketî binivîse, ku mirov bi xwe li wê babet û mijarê da ne tenê melevan û somekar, belkû xoznebarekî/e kirarî û karkuştî be û mirov ew zanist xwendibe û dewreyên fêrbûn û hînbûna wê ne tenê li pileya debistanî da, belkû li pileyên bilind ên zanistgehî da rabihorandibe û tûrkê xwe ji wê zanistê dagirtibe. Em hemû dizanin ku, hêja Farqînî ne edebiyat û zimannasî xwendiyê û ne jî felsefe û 'irfan û 'erûz, lê muxabin li ser van

hemû babetana bîr û hizrên xwe ragehandiyê.

Hêja Farqînî dinivîse: "**Ez mamoste Perwîz Cîhanî ji zû de ye dinasim** û haya min **pir hindik ji ramanên wî yên li ser zimanê Kurdî (nemaze kurmancî) heye. Hin angaşt û îdiayên wî hene ku bi rastî ez tevî wan nabim. Ji bilî vê yekê, mamoste bi devoka xwe dinivîse û li ser awayê vekîta xwe ango rastnivîsa xwe jî birîjd** û israr e. Ji bo zelalbûna **van gotinên hanê ez ê jêgiraneke** ji nivîsa wî ya vê xebatê (rûpel: 15) **bikim ku nav ev e**" (Min ew peyvên nivîsa Farqînî yên şaş reş kirine. Li seranserî vê nivîsara Farqînî da zêde ji heştê hele û çewtiyên zimanî û rêzimanî hene. Eger pêdivî bû, li nivîseke dî da ezê li ser binivîsim P.C.)

Min ji hêja Farqînî ra gotiye: "Çima li ferhenga te da her **raderek (mesderek) du caran** hatiye nivîsînê? Çima te bi sedan peyvên latînî yên weke **egoîzm, egoîst, ekol** bi navê peyvên kurdî li ferhenga xwe da

Em hemû dizanin ku, hêja Farqînî ne edebiyat û zimannasî xwendiyê û ne jî felsefe û 'irfan û 'erûz, lê muxabin li ser van hemû babetana bîr û hizrên xwe ragehandiyê

anîne? Min jê pirsîye ka te ji bo çi peyva soranî ya **"bûmelerze"** ku tê bi wateya erdhejê, kiriye **"melerze"** û he ji xwe ra bîjepeyvên bêbinêşe yên wekî: **melerzenivîs, melerzepîv, melerzezan, melerzezanîn, çêkiriye?**

Min jê ra gotîye û nivîsiye, ez careke din jî li vira vedibêjim û vedinivîsim, peyvên: **qertaf, qedînek, qedanek, hevedudanî, rengdêr, kelijandin, kirde, veqetandek, melerze, û dehan peyvên dî ku li ferhenga Farqînî da hatine şaş in...** û li ser reh û rîşa zimanê Kurdî û bi pîvaneya rêzimanê Kurdî nehatine çêkirin û barên wan yên wateyî çewt in. Lê hêja Farqînî ji van nêrînên min ra dibêje **angaşt û îdia** û li batî ku ronkirneveyekê bide, dibêje: "Ez tevî ramanên wî nabim".

Îtibara Devokî û li hevdunegirtina peyvan!!

Farqînî çend peyvên ku li navçeyên cur be cur da bi şeweyên newekhev tene rabêjkirinê, yên wekî: xwe, xu, xo- ajave, ajawe, ... ji şiroveya min vergirtiye û dike serpelgeya wê hindê ku zimanê min ne hevgirtiye û ez bi devoka xwe dinivîsim. Lê hêja Farqînî destnîşan nekiriye, ka ew devoka ku ew îdia dike, kîjan devok e?

Bi karbirina peyvan bi rabêjên/telefuzên ne ji hev, bi xwe îdia û angaşt Farqînî red dike û gotina ku dibêje; bi devoka xwe dinivîse bi xwe xwe pûçel dibe. Çunku rabêjên curbicurên peyvekê nîşanên wê hindê ne, ku ew peyvana li devokên ne ji hev hatine berhevkirin.

Hêja Farqînî dinivîse, ku: Pêşpirtika "NA" ya Kurdan nîne, ya Farsan e!

Diyar e, ku haya hêja Farqînî ji bilî devoka xwe ji devokên dî yên kurmancî û zaraveyên dî yên zimanê Kurdî nîne. Îro bi mîliyona Kurd-ji Geverê bigre ta Şehrê Kurd- vê pêşpirtikê li jiyana xwe ya rojane da bi kar dibin. Lê hêja Farqînî he bêt lêkolîn û serpelgeyek zanistî îdia dike, ku pêşpirtika "na" kurdî nîne û farsî ye!!! Hêja Farqînî îdia dike, ku şiroveya Mem û Zînê bi çavekî rexneyî xwendîye. Lê çawa pê nehesityaye, ku li malka yekem ya Mem û Zînê da ew pêşpirtika ku Farqînî ji me distîne û dide farsan, hatiye:

"Sernameyê name namê Ellah

Bî namê wi/î natemam e, wellah"

Diyar e, ku haya hêja Farqînî ji bilî devoka xwe ji devokên dî yên kurmancî û zaraveyên dî yên zimanê Kurdî nîne. Îro bi mîliyona Kurd-ji Geverê bigre ta Şehrê Kurd- vê pêşpirtikê li jiyana xwe ya rojane da bi kar dibin

Biesil û bîesil

"Da xelq nebêjtin ku ekrad

*Bîme'irifet in **bi esil** û buniyad"*

Hêja Farqînî îdia dike ku bîesil durust e, ne bi esil. Lê ji nav deh nusxeyên li ber destên min da, li çaran da **"bi esil"** û li çaran da jî **"bîesil"**, li yekê da **"bêesil"** û li ya dî da jî **"ji esil"** hatiye. Lê çawa ku min li şiroveyê da jî nivîsiye, li vira jî dîsan vedinivîsim û radigehînim, ku **bi esil** durust e. Çima? Li ber van hegerana:

1. Çawa ku li sernavê vê pişkê da jî hatiye, Xanî ev pişka li hegera vehûnana vê pirtûkê bi zimanê Kurdî û li ser pirtûkê û edeb û me'irifetê nivîsiye, ne li ser nijadê û ber û neteweyê.


2. Bîesil kêşa helbestê ya 'erûzî dializîne. Lewra ku kîteya duyemîn ji rukna duyê ya kêşa vê pirtûkê kîteya nizim e, ne ya bilind.

3. Xanî li vê malikê da hunera cuwankariyê bi kar birîye. **Bî** û **bi** di gel hev tezadê saz dikin. Esil û neseb jî teraduf wate hevwatetiyê diafirînin.

4. Hozanekî wekî Xanî, ku xoznebarê deriyaya cuwankarî û edebiyatê ye, çi caran ewê sistiyê nake nav helbestên xwe da û peyvekê bi yek wateyê du caran li dû hev ra, li yek nîvmalikê da naîne û berewajî wê, ji bo cuwankirina gotina xwe tezadê saz dike û ji bo barê wateyî jî ji qerîneya wateyî û cuwankariya toreyî wecê werdigre.

Farqînî dinivîse: "Ez bi xwe qet tevî vê ramanê **nabim ku ji aliyê mantiqa zimên ve şaş û hele ye."**

Nizanim, mantiqa zimên li bal hêja Farqînî çû û çawa ye: Xanî kurt û kurmancî weha dibêje: "Min ev pirtûk bi zimanê Kurdî nivîsî, da ku xelq (bîhanî) nebêjin, gelê Kurd he ji esil û buniyadê û kal û bav û reh û rîşalên xwe va bêmeirifet in."



Zahra Farqînî

Kê dera vê gotinê bi mentîqa zimanî va şaş e!? Eger em bêjin Xanî gotiye; da xelq nebêjin ku gelê Kurd bêmeirîfet û bêesil û bêbinêşe ne, hînga hem riste ji cuwanîyê dikeve, hem jî (xiltê meb'hes) têkelaviya mijarê saz dibe. Çunku mijara vê pişka Mem û Zînê ziman, tore, pirtûk û me'irîfet e, ne nijad û ber û netewe.

Kêşa Mem û Zînê

Rêzdar Farqînî dinivîse: "Em tev **dizanin ku** hejmara **kîteyên** (heceyên) Mem û Zînê deh (10) e û..."

Hêja Farqînî li vê barê da çend malikên Mem û Zînê wek nimûne diîne û kêşa wan bi şêweya kîteyî dihejmêre û dibêje: *Cîhanî jî di xebata xwe de, hîn di destpêkê de dide xuyakirin ku **kêşeya** Mem û Zînê bi **behreya** hezec e û bi awayê "mefûlo, mefa'êlon, fe'ûlon" e.* Lê **mixabin ku** hejmara kîteyên beytên Mem û Zînê yên **latînkirî hev nagirin**. Hejmara kîteyan geh ji dehan **kêm geh jî zêde ye**."

Rêzdar Farqînî hem peyva kêş û hem jî ya behr bi şaşî nivîsiye. Li pileya yekem da debê bêjim kêş wate wezin, kêşe wate şerr, pevçûn, alozî, pirsgirêk, astengî... Li pileya duyem da, ezîzê min kêşa 'erûzî û kêşa kîteyî ne yek in. Cudatî û newekhevbûnek mezin li nîveka wan her du kêşana da heye.

Diyarkera di/de

Li ser amîra peywendê ya "di/de" da min nivîsiye, ev "di/de" ya li devokên dora Mehabdê da heye, û amîrek peywendê ye. Lê Farqînî du nimûne ji folklorê kurdî înanê û îdia dike ku ew ne amîra peywendê lê diyarker e.

Rêzdar Farqînî dinivîse: "Ev **diyarkera me di zimanên ewrûpî de jî heye ku di îngilîzî de /the/ û di almanî de jî /der/ û /das/ e.**"

Duruste ku "the" ya îngilîzî diyarker e, û der, die, das yên almanî jî pirtûkên diyarkirinê yên zayendê ne. Lê ev "di" ya kurdî ne ku diyarkera zayendê ye, belkû peywenda nîveka du navan, yan navan û adjektîvan nîşan dide, û di Mem û Zînê da zortir li dema ku nav pirrjimar bin, dihêt. Nimûneyên ku rêzdar Farqînî ji bo îdiaya xwe înanê, ev in: "**Ez nayem ser dînê di Îslamê.**"

Wekî em dibînin, ev "di" ya peywendê li nîveka her du navên dîn û îslamê da saz dike û artikela zayendî û diyarker nîne. Mînakê di: "**Saet şeşê di şevê bû.**" Dîsan ev "di" peywenda li nîveka şevê û saetê da nîşan dide û artikela zayendî û diyarker nîne.

Desttêwerdanek sosret li deqa

Mem û Zînê:

Li vê malika xwarê da Farqînî dest li deqa Mem û Zînê werdaye û deqa Mem û Zînê guherîtiye û li ser da jî min gunhkar nîşan dide û weha dinivîse:

"Xaleke din a girîng ku mamoste **destkarî lê kirîye** û bi ya min fikira wî hele û şaş e, **lêkera gêrîn e** ku di hin malikan de wekî xwe maye. Mînakek ji malika 81'ê (rûpel 144):

Hazir wî **dibû** meqamê me'lûm

Ger **xadimê wî** digêrrî mexdûm

Bila xwanindeyên hêja baş bera xwe bidenê, kanê min dest li helbesta Xanî werdaye, yan rêzdar Farqînî?! Xanî dibêje:

"Hazirwîdibîmeqamême'lûm" LêFarqînînivîsiye: "Hazir wî **dibû** meqamê me'lûm?!" Xanî dibêje: "Ger **xadim e**, **wî** digêrrî mexdûm" Farqînî nivîsiye: "Ger **xadimê wî** digêrrî mexdûm"

Xanî dinivîse:

"**Her çî ku tu bînî ser hidayet**

Vêrra bigirî bikî'inayet

Hazir wî dibî meqamê me'lûm**Ger Xadim e, wî digêrrî mexdûm"**

Xanî bi xudayê xwe ra diaxêve û dibêje: Xudêyo her kes û her tiştê ku tu bixwazî biînî ser rêya rast û rênimûnî bikî, tu pê ra digrî û arîkariya wî dikî û bera xwe didî wî. Tu demildest wî kesî dibî cîhê ewliya û payebilindan û eger ew xulamok û nokerek be jî, tu wî dikî axa û serok.

Ger xadim e wî digêrrî mexdûm: wate eger ew xulam be jî, tu wî dikî axa û serok. Lê rêzdar Farqînî dinivîse: "**Ango digêrrî mexdûm, yanî dibî mexdûm e**" Ev hevoka rêzdar Farqînî jî şaş e.

Radera **gêrrîn, gêrran, gêrrandin**, tê bi wateya kirinê, ne ku bûnê. Bera xwe bidene: raya vê raderê di gel navên dî, wateya kirin û bikiriyê dide: *şorişgêrr, xebatgêrr, kargêrr, pîlangêrr, bezmgêrr...* Raya gêrr li van peyvana hemûyê da jî kirinê nîşan dide, ne ku bûnê. Li ferenga Farqînî bi xwe da jî weha hatiye. *gêran: yönetme, idare*

Lê kirdara kiriya; wate hate kirin/ê, bû. Xanî li gelek cîhan da li dewsa radera passîv a kurmancî (hate kirin/ê) da, radera "kiriyan" bi kar biriye.

Xanî bi zanetî ev rader bi kar biriye. Çunku ew rader ji bo zimanê helbestê li kar e. Ew radera li bakurê Kurdistanê da li ber rewşa kambax ya ku gelê me û zimanê me tê da, ji bîr çûye û gelek kes ewê şaş dixebitînin. Lê li gelek zaraveyên Kurdî yên dî da, li axiftinên rojane da heye.

Xanî li cîhê ku bêje hate meftûhkirinê, dibêje: "kiriya meftûh":

"Nageh **kiriya** bi cûdê meftûh

Dergahê kerem li keştiya Nûh

Nimûne li Mem û Zînê da gelek. Ji bilî Xanî gelek hozanên me yên dî û bi taybetî Melayê Cizîrî jî ev radera bi kar birine.

Rêzdar Farqînî li vê barê da dinivîse: "*Tiştê ku ez **pê dizanim û agahdar im** ji bilî Perwîz Cîhanî kesî wiha ev lêker rave nekiriye û bi qasî **ez dîsan dizanim û haya min jê heye**, gelek meleyên me vê wek **gêrrîn an jî gerîn** bi lêv dikin ku ew bi wateya **lêkera bûnê** ye..."*

Erê durust e, kesê yekimîn ku ev radera li zaravê kurmancî da bi rêya Mem û Zînê peyda kiriye, ez im. Ji vî karî ra keşif yan têderxistin dibêjin.

Şemirandin

Rêzdar Farqînî dinivîse: "*Di bin vî sernavî de ez dixwazim dêhn û balê bikişînim ser ravekirina şaş a **hin peyvnan e jî**. Em **pêşî** malika 238'an (rûpel 224) **bidin**:*

Safî şemirand vexwar durdî

Manendê durrê lisanê Kurdî

Lêkera şemirandin, hemen di bin malikê de, di beşa peyvnasîyê de wiha rave û îzah kiriye: "*Şemirandin: dûr havîtin, firredan, rijandin- şumurandin: hejmartin, **hesap** kirin."*

*Dîsan di malika 660'î de (rûpel 412) şemirandin derbas dibe. **Pêşî** em malika nimûneyî **bidin piştre em bala** xwe **bidin** ravekirinê.*

"We zû şemirand ji bo çi sersal

Hûn rast bibên ku bûye e'hwal"

*Di beşa peyvnasîyê de îcar ravekirin wiha ye: "**Şemirandin: kutakirin, dest jê **kişan****."*


*Ev lêker gelek baş tê zanîn û bikaranîn, ku wateya wê jî **terkandin, terk kirin, dev jê berdan e**. Heta peyveke **din jê hatiye çêkirin** ku ew jî **mişemir** e û tê mehneya **metrûkeya erebî**.*

Dîsan hêja Farqînî dest li nivîsînên min werdaye. Min nivîsiye "hesab" rêzdar Farqînî wekî turkî "**hesap**" nivîsiye. Min nivîsiye: "**dest jê kêşan**", ewî nivîsiye "**dest jê kişan**."

Lê em bên ser şemirandinê. Ezîzê min, ez deqa Mem û Zînê şirove dikim û peyvnan gorekî karbirda wan ya mewze'î rave dikim. Li malika 238 an da peyv gorekî deqê, ewê wateyê dide û li malika 660 î da jî wateya wê û karbirda wê ew e.

Çendîn wateyên peyva "şemirandin" hene: rijandin, firredan, avêtin, ji xwe dûr kirin, terkkirin (terikandin), devjêberdan, hejmartin, hesabkirin... Xanî carekê dibêje: "min meya safî şemirand, wate min rijand. Li ciyekî dî da jî dibêje: we çima sersal zû şemirand. Li vê derê êdî ne bi wateya rijandinê, belkû bi wateya terikandinê ye.

Ez zendegirtî dimînim, rêzdar Farqînî ku ferhengê peyvnan ji me kurda ra berhev kiriye, çawa haya wî ji barê wateyiya peyvnan nîne? Her peyvek li her hevok û risteyê da dikare barekî wateyî bide ser milê xwe û gorekî karbirda di hevok û risteyê da wateyên wê dikarin bêne guhorrînê. Bo nimûne peyva dest li zimanê me da bi serê xwe



û di gel peyvên dî zêde ji 600 peyv û biwêjên nû saz dike. Wate peyvek dikare şeşsed wateyan bide û biafirîne.

Heyşet

Îrowerin, lêzimwerin, cîran û xelqê **heyşetê/hêşetê** Hûn rayekê li min bikin, **îro qewî giriya me tê** Feqiyê Teyran

Heyşet, peyvek erebî ye, û heman haşiyet e û li kurdî da weha lê hatiye. Lê çawa ku min li jorê jî nivîsî, her peyvek li her hevokê da dikare bi mebest û wateyên cuda-cuda bîne bi karbirinê. Li vê malika Mem û Zînê da bi wateya gund û bajar û avahî hatiye bi karbirinê.

Xanî dibêje: **“Naçar ji heyşetê diçû dûr...”** Wate bi neçarî ji gund, yan ji bajarî dûr dibû û ji avahiyan derdiket û diçû derva.

Feqiyê Teyran jî ew durust bi wateya ku Xanî bi kar bîriye, dixebitîne û gazî bajarî/gundî û cîranên xwe dike... Lê hêja Farqînî ji bîr vekirîye, ku ez deqek toreyî şirove dikim, ne ku ferhengê dinivîsim. Erê eger min ferhengê serbixwe binivîsiya, hînga debiya min wateya peyvê ya seretayî bi kar bibira û binivîsiya, Heyşet: hêşet, haşiyet, haşiyê, kinar,

nikar, dorûber, dewrûber, tax, mihele, serperr an binperrê gund û bajaran, bajar, gund... Rêzdar Farqînî nivîsiye hêşet wate sed û bend, lê hêşet bi wateya sed û bendan nîne, belkû bi watey bendgeha sed û bendan e.

Berginda peyvan

Rêzdar Farqînî dinivîse: **“Hêja Cihanî di bin sernavê “peyvnasî” de peyv, term, têgih, qalib û biwêjên ku di Mem û Zîna Xanî de dibihurin dest nîşan kirine.. Lê bi ya min diviya ku kok û eslên peyvan bihatina diyarkirin.**

Li pêş her tiştî da min çî **“qalib”** rave nekirine. Ez nizanim mebesta Farqînî ji qalibê çî ye? Qalib li edebiyatê da tê bi wateya form û teşeyên helbestan. Bo nimûne: çarîn, dubeytî, çarpere, ‘xezel, mesnewî, qesîde... qalibên helbesta klasîk in. Lê min li Mem û Zînê da ew kara nekirîye.

Li bersiva vê rexneya rêzdar Farqînî da dibêjim: Ezîzê min, min Mem û Zîn şirove kiriye. Min ferhenga rîşalnasiyê nenivîsiye, ku ez wekî tu îdia dikî, kok û esil (reh û rîşe û binêşe) yên peyvan binivîsim. Ji vê hizra te ra dibêjin rûxandin. Dena tu bixwe jî baş dizanî, ew tiştên ku tu îdia dikî, ne tenê li şiroveya deqek toreyî da pêdivî nîne, belkû li ferhengek asayî da jî pênavê. Tenê li ferhengek rîşalnasiyê da ew pêdivî ne.

Bajarê Qudsê?

Rêzdar Farqînî nivîsiye, ku herkes dikare bi awayekî cuda deqa Mem û Zînê şirove bike. Lê wisan nîne. Eger her kê dilê wî çawa xwast, wisan şirove bike, dê bibe girara gavanan û çêştî micêwir û tiştêkî bënaverok. Ya durust ewe, ku her kes dikare bi rêbaz û şêwaza xwe, lê li ser xîmê deqa binêşeyî şirove bike.

Hêja Farqînî dinivîse: **“Lê mamoste Perwîz ji bo malika 225’an (rûpel 216) a “Kurmanc dibin bi xûn mulettex/ Wan jêk vedikin misalê berzex” dibêje ku Xanî îşaret bi şerê Çardêranê dike. Gelo em jî nikarin bibêjin ku qest ji “Şehrê şohret” bajarê Qudsê ye ku Selhedînê Eyûbî ew ji xazçparêzan stendibû?!”**

Bersiv: Na, tu nikarî wisan bêjî. Lewra ku Xanî dibêje:

*“Her dû terefan qebîlê Kurmanc
Bo tîrê qeza kirîne amanc”
Ev qulzumê Rûm û be’hrê Tacîk
Gava ku bikin xurûc û Tehrîk
Kurmanc dibin bi xûn mulettex
Wan jêk vedikin misalê berzex”*

Xanî li van malikana da rasterast ji şerr û pevçûn û xûnrijandinên li ser axa Kurdistanê diaxêve û dibêje, gava ku her du zilhezên Îran û Osmaniyan hêrişî hevdu dikin, Kurd li nav dest û piyên wan da li xûna xwe da digevizin. Xanî nerazîbûna xwe li wê rewşê radigehîne. Kê mêjû xwandibe, dizanê, ew şerrê ku Xanî jê diaxêve- ku pirr nêzikî dema jiyana Xanî bûye-, şerrê Çardêranê ye. Şerrê ku li ser axa Kurdistanê qewimî û ardûyê wî şerrî jî li her du aliyan pişka zor her kurd bûn. Layek Saro Bîreyê Baneyî û layê dî jî Idrîsê Bitlîsî Kurd ji bo berayîka wî şerrî dişandin. Ew rewşa kambax ta roja îro jî li Kurdistanê da her berdeyam e.

Li wê malîka ku hêja Farqînî îdia dike, Xanî li ser bajarê Qudsê axiftiye, pirr şaş e. Durust e, ku Xanî peyvên şehr û bilad bi kar biriyê, lê berewajî dîtî û angaşta Zana Farqînî, Xanî li ser hiç bajarî naaxêve. Ew mêranîyê teşbîhî bajarkî û jêhatîbûn û himmetê jî teşbîhî welatekî dike. Lêre da peyvên şehr û bilad mecaz in, ew ne rast in. Min li şiroveya Mem û Zînê da **nenivîsiye**; “ku mêrxasên Kurdan bi şûr û mêrxasiya xwe bajarên binav û deng zeft kirin.” Min nivîsiye: “bajarê nav û dangan” Xanî jî wisan nenivîsiye.

Lê hêja Farqînî dîsan nivîsara min destvedayî kiriye û kiriye, “bajarê bi nav û deng.” Eger Xanî bigota şehrê meşhûr, hînga dibû bajarê binav û deng. Lê xanî dibêje şehrê şohret. Wate şehrê nav û dangan. Nav û deng teşbîhî bajarekî kiriye. Eger Xanî li ser Qudsê binivîsiya, dê rasterast bigota. Xanî li vê pişka Mem û Zînê da dijî kar û xebe- ta ji bo Ereba û Eceba û Turk û Tacîkan nivîsiye. Zevtkirina bajarê Qudsê ne ji bo Kurdan bû. Xanî gazindeyan li Kurdan dike û dibêje hûn ji bo çi ji xelkê ra bûne ‘kela û nobedar?

Eger Xanî bixwesta, dikarî li cîhê Rostem û Hatemî da navê Selaheddînî bianiya. Li cîhê ku dinivîsî:

*“Her mîrekî wan bi bezlê Hatem
Her mêrekî wan bi rezmê Rostem”*

Yê binivîsiya:

*“Her mîrekî wan Selaheddîn bû
Ew hamiyê xelq, selahê dîn bû
Wî Quds reha kirî ji Tersa
Ew naciye erdê Beytuleqsa
(P. C.)*

Buqrat

Xanî dibêje:

*“Serraf eger bibîte Buqrat
Texmîn biketin bi weznê qîrat
Bazar biket ji bo Felatûn
Mecmû’ê xezayînê di Qarûn
Sunma semenê di wan nigînan
Nabit bi wuqûfê dûrbînan”*

Min li şiroveya Mem û Zînê da nivîsiye, ku du Buqrat hebûne, yek bejîşk bûye, û yê dî jî endaziya. Mebesta Xanî ji Buqratî kesê dûyê wate ji Buqratê endaziya e, ne yê bejîşk.

Lê hêja Farqînî dibêje na, mebesta Xanî buqratê bejîşk bûye. Ezîzê min, Xanî dê ji bo kêşan û pîvan û buhalênana gustîlan çi ji bejîşkekî bike!?? Ew niyazmendî endaziya rekî hejmarzan e, ku wan gustîlan bikêşe û bipîve û buhayekî gorekî wan ji wan ra bi hisab û kitab, bi pîvan û kêşan peyda bike.

Hêja Farqînî dinivîse: “Her wiha mamoste dîsan diyar dike (binêre rûpel 398) ku Peyvên **Hîpokrat, Platon** û Qarûn telmîh in ji bo serhatî û çîrokên wan kesane.”

*Gelo em tenê dikarin wiha bi **serkî** ji van malikan behs bikin û bibêjin ku Xanî hema wisan ew nav bi kar anîne? Bi ya min na, divê em baş di van malikan bifikirin ku ew nav hemû bi mebest û armançê hatine bikaranîn. Nav giştî sembol, remz û hêma ne.”* Eger hêja Farqînî wateya peyva telmîhê bi baş zanîba, dê weha nenivîsiya. Çunku wateya telmîhê ya serekî her hêma û îşare û avîr û remz û sembol e.

Li ser rengê gustîlan, ku ya Memo yaqût û ya Tacdînî jî elmas e, min gotiye û ez dîsan jî dibêjim ku rengê sor nîşaneya evîna rastî û manewî ye. Lê hêja Farqînî tiştekî dî dibêje, ku ne cîhê jêaxiftinê ye.

Rêzdar Farqînî dinivîse: “Her wiha **divê** mirov li ser gotina heşt jî bisekine, **bê çima** hejmara heşt hatiye bikaranîn.”

Lê muxabin Xanî peyva heşt bi kar nebiriye, ew dibêje heştkek. Cudatîyek mezin li nîveka peyvên heş û heştkekê da heye.

Hikmeta Xudê û filosofiya Xanî

Hêja Farqînî ji bo wê hindê ku sabit bieke, Xanî filosof e, van her du malkan ji Mem û Zînê diîne.

*“Ez mame di hikmeta Xudê da
Kurmanc di dewleta dinê da
Aya bi çi wechê mane merhûm
Bilcumle ji bo çi bûne mehkûm”.*

Ji belge û delîlên weha bitew ra dibêjin: **“burhana qatî??!”** Em hemû dizanin, îro gelê kurd ji layê dagîrkerên Kudistanê va têne bombe û topbarankirinê û roj nîne, ku kurdek bi destên wan neyê kuştinê. Li dema bombebaran da pîrejinên Kurd, yên ku li jêr wî agirî da zar û zêçên xwe ji dest didin, wekî Xanî berê xwe didin asimanan û gazî dikin; xudêyo ma me çi kiriye, ku ev dewletên bi nav musulman, weha me dikujin û agirdadayî dikin!? Ma em ne mirov in!? Ma em ne musulman in!?

Eger mirov wê burhana Farqînî ya qatî' bipejirîne û bêje Xanî filosof e, çunku gotiye xudêyo te çima Kurd ji hemû tiştî bêpar û pişk hêlaye, hînga ew pîrejinên me yên ku li temenê xwe da alfabê jî nexwendine, bi wê pîvaneya rêzdar Farqînî, hemû jî filosof in.

Xanî bi xwe dijî filosofan dinivîse, û çendîn caran li helbestên xwe da nîşan da ye, ku ne tenê filosof nîne, belkû bi tundî dijî wan e jî. Kerem bikin û van her du malikan bixûnin:

*“Xelqê heye şubheyek di dînî
Behsê bi cedel biket ji dînî
Qurian û xeber çi mu'izat in
Ayat û suwer çi beyînat in”*

Herkesê ku felsefe xwendibe, dizanê ku behs û cedel çi ne. Em dibînin ku Xanî bi tundî dijî vê mebesê ye û dibêje her

Sar bûn şevên Diyarbekirê

Rojen Barnas

Sar bûn şevên Diyarbekirê, dizanî.
Lê ku min serî datanî ser balgîv
Û evîna te li xwe dipêça
Her sibe min didît wa balgîvê min şil
Û bijangên min
Bi xunav...

Min dizanî ku ne dûr î
Brûskasa dipekiyam ji nav ciya
Û dibezîm ber bi mîhraba tu lê.

Êdî xunav nagrin bijangên min
Û balgîvê min
Wekî êvarê
Zipîziwa.

kesê ku li dînî da behs û cedelê biket, ew dîn wate şê e. Tenê ev malika helbesta Xanî têra wê hindê dike, ku mirov bêje Xanî filosof nebûye û dijî filosofan bûye. Xanî hem li Mem û Zînê da û hem jî li 'xezelên xwe da nîşan dide ku filosof nîne û arif e. Xanî di 'xezelek xwe da jî weha dibêje:

*„Qelbê Xanî sedefa gewherê 'irfan e welî
Metinxwanek ku nebit, sahibê me'na çi biket?”*

Muxabin li ber kêmbûna rûpelên kovarê ez nikarim bersiva hemû îdiayên rêzdar Farqînî bidim û ez daweriyê bi hêviya xwanindeyên hêja va dihêlim.●

Tê li xwe werî xezebê

Berken Bereh

Ew deqên ji şevtariyên li ser rûyê te hatî nexşandin
Di ber herikîna hêviyên te re her bilind dibin
Û sibehên te yên ji dûmanê
Desten te yên ji xumamê
Keleheke ji gunehan dihêlin li dû xwe

Şeytên jî nikare li ber xwe bide
Li ber van derewên diçirûsin di eyneya heyî de
Hebûn û giyan
Çûn û hatin
Û ew xewn-koçera bayê bi xwe re anî
Ya ji emrê perperokekê naziktir

Werin dibêjim çi mabe ji we re
Ji wê talana min bi xwe tenûra wê vexistî
Belkî min ji min re biselihîne
Li wareke navnişana wê bi mij

Gotin û kavi
Her yek e ew pêlên har yê di pertûkê de
Tu jî nîn bî ey dilê bi hêminî berê xwe fireh
Şûn-piyê xwe kûr dike
Ma çi dimîne li vî bajarê kerr û lal
Ji destbirakên êşê re

Bi spêdeya rengesk re
Dê her tişt aşkere bibe teqez
Ew deftera razên te lê hatî bi cih kirin
Ew xameyên te navê wan ji bîr kirî

Paşê tê li xwe werî xezebê bi gunehan



Gelo peyva “ol” ji kîjan zimanî tê?

HUSEYN ŞEMREXÎ

Pêşî ez vê diyar bikim ku eger peyveke biyanî têkeve zimanekî û di nava gel de belav bibe, êdî ew peyv dibe malê wî zimana jî. Loma dijberiya peyvên biyanî tiştekî şaş e. Îcar tew ev dijberîti, bi awayekî korane bê kirin, ev tiştekî şaştir e.

Gelek kes bi zanebûn peyva “dîn” diterikînin û peyva “ol” dibijêrin. Evê bijartina ha jî dîkin, goya peyva “dîn” Erebî ye û peyva “ol” jî xwerû Kurdî ye. Lê bi vî awayî dijminî û bijartina wan ne tiştekî rast e, lewra di peyva dîn de îxtilaf heye, pirê çavkaniyan dibêjin ew peyveke semîtîk û hinek jî dibêjin ew peyveke Îranî ye.

Jixwe mijara me ne peyva “dîn” e, îcar em vegerin ser peyva “ol”ê. Lewra îdîfa’ me ew e ku em dibêjin peyva “ol” ji peyva “yol” a Tirkî hatiye. Îcar evê peyvê ji çend hêlan emê îsbat bikin ku ne Kurdî ye:

Niha pêşîn ji hêla dengnasiyê (fonolojî) dema ku em li vê peyvê dinêrin, nimûneyek ji me re çêdibe ku ev peyv ne Kurdî ye, lewra di Kurmancî de peyvên

ku bi tîpa “o”yê dest pê dîkin ji peyvên biyanî hatine. Jixwe dema ku kesekî normal jî li ferhengên Kurmancî, li peyvên ku bi tîpa “o”yê dest pê dike binêre, dibîne ku pir kêma in, peyvên ku hene jî hema bêje hemî biyanî ne, hinek ji wan jî Tirkî ne. Ha di vê de şubheyek di Kurdbûna peyva “ol”ê de ji me re çêdibe. Herwekî:

ocax	ocak
ode	oda
olçek	ölçek
ordî	ordu
werdek/ordek	ördek
oxir	uğur
obe	oba

Dema ku îcar ji hêla wate-nasiyê (semantik) ve em li vê peyvê binêrin em karin di bara wê de bibêjin:

Eger du ziman ji famîlyeyekê bin û ew ziman ji hêla coxrafîk ve gelekî dûrî hev bin jî, mumkin e ku peyvek bi heman wateyê di herdu zimanan de hebe. Û meriv nikare îdîfa bike ku ew peyv ji zimanekî derbasî yekî bûye. Wekî mînak dema ku meriv li Kurdî û Îngilîzî dinêre gelek

Gelek kes bi zanebûn peyva “dîn” diterikînin û peyva “ol” dibijêrin.

Evê bijartina ha jî dîkin, goya peyva “dîn” Erebî ye û peyva “ol” jî xwerû Kurdî ye.
Lê...

peyv hevdu digirin, lê ew nayê wê maneyê ku ew peyv ji Îngilîzî derbasî Kurdî yan ji Kurdî derbasî Îngilîzî bûye. Lewra peyvên wisa ji Hindistanê ta bi Yûnanistanê yê hevpar hene. Ev tişt ji ber ku ew zimanên ha ji heman famîlyeyê tèn loma. Mînak:

Stêr	Star
Derî	Door
Hesp	Horse
Mişk	Mouse
Dar	Tree
Birû	Eyebrow
Dilop	Drop
Hêk	Egg
Lêv	Lip
Nû	New
Nav	Name

Lê îcar kû ew herdu ziman ne ji famîlyekê bin, ji bo ku ew herdu ziman peyvekê ji hev bigirin, divê yan ji hêla coxrafîk ve nêzikî hev bin, yan jî divê yek ji wan herdu zimanan ji hêla çandî ve gelekî bi hêz be.

Hem dema mirov îdîa bike ku peyvek zimanekî ji peyva zimanekî din hatiye, divê ji hêla maneyê ve pêwendiya wan ne bi awayê tesadufkî be, belkî divê pir-hindik têkiliyek di navbera maneya wan de hebe. Meselen nayê gotin peyva Tirkî ya “kar” a bi maneya “berf”, ji peyva Kurdî ya “kar” a bi maneya fayde û sûd hatiye. Lewra çu eleqe di navbera wan de tune, lê meriv kare bibêje ku peyva Tirkî ya “kar” a bi maneya sûd û fayde, ji peyva Îranî ya “kar” hatiye.

Îcar peyva “ol” jî ez bawerim ku bi arîkariya cîrantiya Kurd û Tirkan, ji Tirkan, derbasî Kurdî bûye. Û ji hêla maneyê ve jî “ol” û “yol” ne dûrî hev in, lewra Kurd dema ku ji hev re dibêjin, “filan kes bê ol û bê dîn e” yanî bê dîn û bê mezheb e, jixwe mezheb jî bi maneya rê ye. Di klasîkên Kurdî de jixwe ev peyv gelek caran dibore, lê ji ferhengên Kurdî yê kevin, bes di ya Cegerxwîn de ev peyv weha dibore:

Ol: dîn û bawerî ye. Êzîdî dibêjin: filan kes bêol e-dîn e. (الدين والمذهب).^[1]

Ji vê tê famkirin ku têkiliya wan herdu peyvên, ne tişteki tesadufî ye.

Hem di ferhenga Kurdî-Frensî de jî, ev peyv weha dibore:

اولداش (oldaş): oldach, compagnon; t. بولداش (yoldaş).^[2]

Alexander Jaba, ev peyva “oldaş” bi maneya “compagnon” mane kiriye ku ew peyv jî di Frensî de bi maneya “heval” e. Piştî manekirina peyva “oldaş” jî li dawiya şîrovekirinê: tîpa “t” û peyva “yoldaş” nivîsandiye. Maneya vê jî ev e ku: Ev peyv ji peyva “yoldaş” a Tirkî hatiye.

Îcar werin em bi berfirehî li jêr şîrove bikin bê ka peyva “yol” bi awayê “ol” çawa derbasî Kurdî bûye, li vê derê jî emê hem ji hêla rehnasiyê (etîmolojî) ve hem jî ji hêla dîrokî ve, vê peyvê şîrove bikin.

a) Ji hêla rehnasiyê ve:

Li gorî destûrên rehnasiyê, tişteki herî girîng jî tîpguhêzî ye. Yanî guherîna tîpan a di navbera du zaravayan yan du zimanan de ye. Eger ew destûrên tîpguhêziyê bêne zanîn bê çawa çêdibin dê gelek gencîneyên veşartî bêne dîtin, lewra ew destûr mîna kilîtan e. Wekî mînak dema ku em bibêjin peyva “mujde”ya Farisî û “mizgîn”a Kurdî ji bingehekê tèn, divê em vê bes bi rehnasiya gelêrî angaş nekin. Belkî ji bo îsbatkirina vê tezê, divê em delîlên xwe jî bînin. Meselen divê em ji bo peyva “mizgîn” û “mujde”yê destûrek wisan bînin:

Destûrek tîpguhêziyê ya di navbera Kurdî û Farisî de, guherîna tîpa “j” û “z”yê ye. Mînak:

Dirêj	Deraz
Dojeh	Dûzex
Jehr/jar	Zehr
Jêr	Zîr
Ji (daçek)	Ez\zi
Jin	Zen
Jinû/ejnû	Zanû
Jîr	Zîrek
Mizgîn	Mûjde
Nimêj/nemaj (Kirmanckî)	Nemaz ^[3]
Pijîn	Pezîden
Roj	Rûz
Şûjin	Sûzen
Tûj	Tîz
Zeng, jeng	Zeng
Jenîn	Zeden
Jîn	Zendegî kerden

Îcar eger bête gotin: Li gorî destûrên rehnasiyê, destûra di peyva “ol” û “yol” de çî ye?

Emê bibêjin ev destûra ha jî ev e:

Peyvên Tirkî yên ku bi tîpa “y”ê dest pê dikin, dema ku dikevin Kurdî, “y”eya wan bi tîpek dengdêr diguhere. Mînak:

Îlan	Yilan
Egît	Yiğit
Oldaş	Yoldaş
Êleg	Yelek
êgen ^[4]	Yegen
Aprax	Yapraq
Êmiş	Yemiş
Êm	Yem
Êmilk	Yemlik
Ardim ^[5]	Yardım
OI	Yol

Carinan ji zimanê din jî dema ku peyv dikevin Kurdî “y”eya wan bi tîpek dengdêr diguhere:

Ûsiv	Yûsuf
Êzîd	Yezîd
Ûnis	Yûnus
Aqûb	Yaqûb

b) ji hêla dîrokî ve:

Ji hêla dîrokî ve jî emê binêrin bê ka di metnên dîrokî de ev peyv kengî, bi kîjan formê û bi çi maneyê boriye:

Peyva “ol” û “yol” jî zûde ye ku di klasîkên Kurmancî de dibore, anku ev ne peyveke wisa ye ku hîç di kitêbên edebî de neboriye.

Melayê Cizîrî:

Ku dilber hate vê yolê
ji ber pur hin ketin çolê
Ji qencan ku revand holê
ji mehbûban birin nerd e^[6]


Feqiyê Teyran:

Dilo ya pîr bi kêr nayê
Eger aqil û zanayê
Mebe yoldaşê dunyayê
Ne yoldaşek wefadar e^[7]

qewarok

sidîq gorîcan

s.gorican@hotmail.com



berpayîz e
wextê qewarokan e
wextê kakilê terr û spî ye
ku di nava liba gûzê de kemiliye
libgûza ku hêj bi qûrçê xwe ve hişîn dike
û di nav belçimên tehl û pehn de aliqiye

payîz e
wextê qewarokan e
serdevê kêrika tîj li serê libgûzê diçe
lib tîş dibe
dibe du şeq
melkûka li navê dibe du nîvmelkûk
av li devan dibe cûk
her nîvmelkûk tê qewartin bi kêrê
dev û diran noşicaniyê dihêre li hindurê

berpayîz e
wextê qewarokan e
xwînkirina dest û tiliyan jî
ji êxtîmalê ye ku ecemîtî serdest be
û çi qas rast çi qas derew, nizanîm
tê bawerkirin ku sip li serê meriv çêdibe
ku di qewarokxwarinê de zêdegavî bê kirin

payîz e
wextê qewarokan e
xelk gûzên hişîn diqewêre
û li ber re kêfê dihêre
rebenê xwedê ez
bi dem û jiyane tîm qewêrin
nav leyz û eglaneke bezebez

rezber2011hizan

...

Ne serkar ma ne serdar ma
Ne **yoldaş** ma ne heval ma
Ne Harût ma ne Marût ma
Ne axê ma ne ruxsar e^[8]

Melayê Bateyî:

Benî-sultan û şîrînê
Xudanê **yol** û temkînê
Qumaşê Çîn û Maçînê
Ji sundoqan deranîne^[9]

...

Zivistanê li vê **yolê**
Li vê berryê li vê çolê
Gerovê girtî Daholê
Mijê havête zozanê^[10]

Selîmê Hîzanî:

Her dem bi temerrud û şîqaq in
Bêol in û b'hev re bêtifaq in^[11]

...

Babê bi hezar **yol** û sunnet
Axaz nihar ji boyî sunnet^[12]

Mela Mehmûd Bazîdî, peyva “oldaş” gelek caran bi kar aniye lê emê bes çend mînakên bi-dîn:

“Wekî dinê, Ekrad di şerî da ji yekûdu şerm dîkin. Eger di dil de jî cesaret tunebin, elbette ji şerma **oldaşan** (hevalan) dê şerî bike û yane bête kuştin.”^[13]

...

“Eger meselen biqewimitin li şerekî da Ekrad û yerlu (niştecih) heyîn, Ekrad nabine **oldaşêd** yerluyan. Dibêjin ew zû direvin.”^[14]

...


“Neqil dîkin ku carekê melayek û du nefer mirovêd cahilê nexwendî hersê bûyine **oldaşêd** yekûdu û bi rê da diçûn.”^[15]

Dema ku em li van mînakên jorîn dinêrin, wekî encam em dikarin bibêjin di tekstên klasîk de, pêşîn ev peyv bi forma “yol” boriye. Piştî forma “yol” bi awayê “ol” guheriye.

Hem peyva “ol” di çiyekî van mînakên de, bi maneya dîn neboriye, hemî jî bi maneya rê û rêbaz û mezheb boriye. Îcar ji vê jî tê fam kirin ku forma “yol” paşê bi forma “ol” guheriye û maneya wê ya “rê” jî paşê bi maneya “dîn” guheriye. ●

ÇAVKANÎ

- [1] Cegerxwîn, *Ferhenga Kurdî*, Camî'a Bexda, r. 45.
- [2] Dictionnaire *Kurde-Français* m. Auguste jaba, petersburg, 1879. r. 27
- [3] Nemah. (*avestayî*).
- [4] Ev peyv li derdora Melete tê bikaranîn.
- [5] Her çiqas ihtîmal heye ku peyva “yardim” a Tirkî ji peyva “yarî/arî” ya Îrani hatibe jî, lê em behsa forma “ardim”ê dîkin. Ev peyv li derdora meletê û di zaravayê Kirmankî/Zazakî de tê bikaranîn.
- [6] Melayê Cizîrî, *Dîwan*, Amadekar: Selman Dilowan, Nûbihar, Stenbol, 2011, r. 37
- [7] Feqiyê Teyran, Amadekar: Xalid Sadînî, Nûbihar, Stenbol, 2011, r. 238.
- [8] Feqiyê Teyran, Amadekar: Xalid Sadînî, Nûbihar, Stenbol, 2011, r. 243.
- [9] *Melayê Bateyî Jiyan û Berhem*, Komkirin û Vewjartina Tehsîn Îbrahîm Doskî-Musîn Îbrahîm Doskî. Spîrêz, Dihok, 2005 r. 173.
- [10] *Melayê Bateyî Jiyan û Berhem*, Komkirin û Vewjartina Tehsîn Îbrahîm Doskî-Musîn Îbrahîm Doskî. Spîrêz, Duhok, 2005 r. 179.
- [11] *Yûsuf û Zuleyxa*, Selîmê Hîzanî, Berhevkar: Tehsîn Îbrahîm Doskî, Spîrêz, Dihok, r. 37.
- [12] *Yûsuf û Zuleyxa*, Selîmê Hîzanî, Berhevkar: Tehsîn Îbrahîm Doskî, Spîrêz, Dihok, r. 49
- [13] Mela Mehmûd Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, Amadekar: Jan Dost, Nûbihar, Stenbol, r. 55.
- [14] Mela Mehmûd Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, Amadekar: Jan Dost, Nûbihar, Stenbol, r. 117.
- [15] Aleksandre Jaba, *Sê çîrokên ji kitêba Camîê Rîsaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*, Pêtersbourg. 1860. Tipguhêzi Huseyn Şemrexî, kovara Nûbiharê jimar: 110



Helbestvanê Muhbet û Xurbetê: Mela Ehmedê Heyderî

ABDURRAHMAN ADAK

Mela Ehmedê Heyderî, edîbê dewreke gelekî zehmet e; dewra dawîya Osmaniyan ku tê de şer û alozî hebû û destpêka serdema komara Tirkiyeyê ku tê de înkâr û qedexe hebû. Edîbê hêja yê wê dewrê Mela Ehmedê Heyderî, mixabin heta niha di bin perdeya veşartinê de maye û tu xebat li ser berhemên wî yên edebî nehatine kirin. Ji vê jî zêdetir dema em li sahayê dinêrin, em dibînin ku di nav derdorên medreseyan yên hevdemî de jî, ev edîbê mezin zêde nehatiye bihîstin. Ji çendîn melayên hevdemî re dema min behsa wî û berhemên wî kiriye, heyretmayîna ku çawa ew nebihîstine di wan de rûdaye. Bi baweriya min du sebebên nebihîstina wî hene: Yê yekem ew e ku, ji ber derbasbûna 75 salan li ser wefata wî re, îdî Mela Ehmed ne şexsiyetekî hevdemî ye, ew bûye malê tarîxê. Sebebê duyem jî ew e ku, berhemên Mela Ehmed yên edebî wekî destxet mane û bidestxetî jî be zêde nehatine istinsaxkirin û naskirin. Lê ber 'eqsê bavê xwe kurê wî Şêx Mihemed

Emînê Heyderî, ji ber ku hêj nû wefat kiriye (2003), li herême hatiye naskirin û berhemên wî yên edebî gelek caran bi destan hatine istinsaxkirin û vê dawiyê jî hatine çapkirin.

Gelo helbestvanê muhbet û xurbetê, stêrka veşartî ya edebiyata Kurdî Mela Ehmedê Heyderî kî ye? Li jêr em dê bersiva vê pirsê bidin. Bi vê munasebetê, ji ber ku agahiyên malbatî yên derbarê Mela Ehmed de û her weha hemû berhemên wî bi destê xwe teslîmî min kiriye, ez spasîyên xwe pêşkêşî neviyê wî û kurê Şêx Mihemed Emînê Heyderî Mela Diyaeddîn dikim.

Jidayikbûn û nasnameya wî

Mela Ehmedê Heyderî, di sala 1887an de li nahiyeya Dedeliyê ku niha li ser Patnosê ye û dikeve navbera Patnos û Erdîşê hatiye dinyayê. Mela Ehmed, kurê Salih, ew jî kurê Reşîd, ew jî kurê Hemze, ew jî kurê Elî, ew jî kurê Imadeddîn e. Ev malbat, ji eşîra Heyderiyan, ji bavikê Asiyan e. Eşîra Heyderiyan ku zehftir li herêma Serhedê belav bûye, her

Gelo helbestvanê muhbet û xurbetê, stêrka veşartî ya edebiyata Kurdî Mela Ehmedê Heyderî kî ye? Li jêr em dê bersiva vê pirsê bidin

weha li herêma Dêrsimê û Başûrê Kurdistanê jî xuya dibe. **Wate:** Mela Ehmedê Heyderî ji herêma Serhedê ye û ji eşîra Heyderîyan e. Mela Ehmedê Heyderî di van beytên xwe yên jêrîn de weha behsa herêma xwe Serhedê kiriye:

*Rencûr û zer bûm bê hebîb bê hogir û yar û qerîb
Ez mam di vê semtê xerîb nalîn ji min çûn Serheda*

*Îro di êşan ezyetê yad û mihacir Ehmed î
Xweş ke bi sewta Serhedê şîrê di hengamê xerîb*

Di gelek beytên xwe de jî, navê eşîra xwe bi şiklê ku ji xwe re bike mexles bikaraniye:

*Ey Heyderiyê dil-keîb perwaneê şem'a hebîb
Xemrê binûş hilgir selîb ger sadiqî ya Ehmeda*

Xwendina wî

Mela Ehmedê Heyderiyê ku asta wî ya bilind ya ilmî ji berhemên wî û jiyana wî ya dersdariyê hişkere xuya dibe, bêguman di medreseyan de perwerdeyê baş dîtîye. Tiştê ku di vî warî de tê zanîn ew e ku wî xwendina xwe ya medreseyê li Hîzanê li cem Şêx Şehabeddîn kiriye. Ev Şêx Şehabeddîn kurê Şêx Nûr Mihemed, ew jî kurê Seyid Sibxetullahê Erwasî ye. **Wate:** Mela Ehmed di medreseyê baş de perwerde bûye.

Li gor agahiyên ku malbata Mela Ehmed ji Mela Ebdullahê Sergelya (Sergelya, gundê Bismila Diyarbekirê ye.) stendine, Mela Ebdullahê Sergelya, Bedîuzzeman Se'îdê Nûrsî û Mela Ehmed demekê di medreseyê de bi hev re xwendine. Wê demê Bedîuzzeman di ilmê tefsîrê de, Mela Ebdullah di ilmê tesewwufê de û Mela Ehmed jî di ilmê şîr û Erûzê de jêhatî û zîrek bûne. Li ser teqdîra ku ev agahî rast be, pêwîst e ku ev medrese, medreseya Hîzanê ye. Lewre Bedîuzzeman jî di medreseya Hîzanê de li cem Şêx Nûr Mihemed xwendîye. Wate seydayê Bedîuzzeman Şêx Nûr Mihemed, bavê seydayê Mela Ehmed Şêx Şehabeddîn e. Ji bilî medreseya Hîzanê jî, tu medreyên ku her du kesan bi hev re tê de xwendibin em nizanin.

Mela Ehmedê Heyderî ji bilî xwendina medreseyên Kurdan yên klasîk, her weha li Tebrîzê mekteba sen'et û hunerê jî xwendîye. Ji ber vê yekê di karên destan û zeneetkariyê de gelekî jêhatî bûye. Di vê çarçoweyê de Sobeyên xwe

wî bi destê xwe çêkirine. Mela Ehmed di dîwana xwe de jî behsa Tebrîzê kiriye:

*Di semtê xurbetê bend im li Tewrîz û Hemawend im
Birûska hicretê jendim biqîmê hel kirim Hellac*

Hemawenda ku di vê beytê de derbas dibe, navê eşîreke li herêma Kîrmanşahê ye. Ev jî dide nîşan ku helbestvanê me demekê li Îranê maye û li bajarên Tebrîz û Hemawendê jiyaye. Jixwe li gor agahiyên ku malbat dide, Mela Ehmed bi Farişî jî dizanî. Ev taybetiya wî û mana wî ya li Îranê hev temam dikin. Serdema perwerdehiya Mela Ehmed, heta bi destpêkirina şerê cîhanê yê yekem dewam kiriye. Dema em sala jidayîkbûna wî (1887) bînin ber çavan, di wextê şerî de (1914) dibe 28 salî. Piştî vê demê serdemeke nû di jiyana wî de destpêkiriye.

Şerê Cîhanê yê Yekem û koça Nisêbînê

Şerê cîhanê yê yekem, jiyana Mela Ehmed bi tevahî guherandiye. Çawa ku me li jor jî got, Mela Ehmed di 28 saliya xwe de beşdariya vî şerî kiriye û wekî encam tê de birîndar bûye. Birayê wî jî di heman şerî de şehîd ketiye. Heçî bavê wî ye, ew hêj berî şerî çûye ber dilovaniya Xwedê. Dema ku di vî şerî de Rûsan herêma Serhedê dagir kirine, xelkê herêmê ji bêgavî koç kirine. Mela Ehmed jî bi qafilayekê re koçî herêma Nisêbînê kiriye û li Newala Bûnisra bi cih bûye.

Mela Ehmedê ku hêj li Serhedê xwendina xwe xilas kiribû, li wir dest bi melatiyê kiriye. Mela Ehmed heta ku ecelê wî hatiye li wê herêmê maye û zehfîr li gundên Kelehê û Bawernê û her weha li gundên Gurînê û Baqisyanê jî melatî kiriye. Ji aliyê tesewwufî ve, intisabî Şêx Ehmedê Xiznayê ku ew bixwe li Sûrî bû, lê li herêma Nisêbînê xwedî bandor bû kiriye û li ser wî medhiyeyek jî nivîsandîye. Ji xwe piştê kurê wî yê mezin Mihemed Emîn de bibe xelîfeyê vê malbatê.

Wefata wî û zar û iyalên wî

Mela Ehmedê Heyderî piştî koça xwe bi 23 salan, di sala 1937an de 50 salî li gundê Bawernê wefat kiriye û li wir hatiye defnkirin.

Dema em li zar û iyalên wî dinêrin rewşa wan wehaye: Piştî koça wî bi demeke hindik, xanima wî ya yekem wefat kiriye. Piştê bi keça Mela Eliyê

Koçer ku ew jî weke wî bibû mihacirê şerê cîhanê yê yekem û berya şer li Melazgirdê melatî dikir re zewiciye. Ji vê xanima wî bi navê Hemîde keçek û bi navê Mihemed Emîn, Mihemed Salih û Mihemed Seîd sê kur hatine dinyayê.

Dema Mela Ehmed wefat kiriye kurê wî yê herî mezin Mihemed Emîn deh salî bûye. Li ser wesiyeta wî xanima wî zarokên xwe şandiye medreseyan û ew dane xwendin. Helbet medreseyeke herî girîng ji bo malbatê medreseya Xeznayê ya li Sûriyê ye. Zarokê mezin Mihemed Emîn jî ji bo perwerdehiyê bo vê medreseyê hatiye şandin.

Mihemed Emînê ku perwerdehiyeke baş dîtiye, piştî bavê xwe derketiye pêş û wekî şexsiyetekî navdar malbata xwe temsîl kiriye. Wî hem melatî, hem şêxîti kiriye û di sala 2003an de wefat kiriye. Şêx Mihemed Emînê ku di herêmê de zehf dihat naskirin, bi Kurmancî gelek berhemên edebî nivîsandine. Bi taybet mewlûda wî ya bi zimanê xelkê hatiye nivîsandin gelek belav bûye. Ji bilî *Mewlûda Kurdî*, wî *Mewlûda Erebi*, *Eqîda Îmanê*, *Werdu'l-Etfal*, û *Dîwan jî* nivîsandine. Piştî wefata Şêx Mihemed Emîn, kurê wî Mela Ehmed niha wezîfeya postnişîniyê dike.

Dîwana muhbet û xurbetê

Mela Ehmed dîwanake gelekî girîng nivîsandiye. Wî jî li pey rêça helbestvanên klasîk di helbestên xwe de edeta bikaranîna mexlesê domandiye. Wî wekî mexles carna *Ehmed*, carna *Heyderî*, carna jî *Ehmed Heyderî* bi hev re bikaraniye:

*Tûtiyê şêrîn-zaban im Ehmedê şeker dehan im
Her seher şahê cîhan im Heyderê mîrane va*

*Ey Heyderiyê dil-keîb perwaneê şem'a hebîb
Xemrê binûş hilgir selîb ger sadiqî ya Ehmeda*

Mislê te *Ehmed Heyderî* ka şehdê peyxamê xerîb
Neqşê seraser cewherî geş kir dilê 'amê xerîb

Mela Ehmedê Heyderî helbestvanekî tebî'et nezm bûye. Ji vê beyta wî ya jêrîn tê fêhmkirin ku wî di ciwaniya xwe de hêj dema li Tebrîzê xwendiyê dest bi nivîsandina helbestan kiriye.

*Di semtê xurbetê bend im li Tewrîz û Hemawend im
Birûska hicretê jendim biqimê hel kirim Hellac*

Şerê cîhanê yê yekem û koç û hicreta wî, wusa xuyaye, bandoreke mezin li ser Mela Ehmed kiriye û wî derûniya xwe bi riya helbestê aniyê zimên. Ji vê benda jêrîn tê fêhmkirin ku Mela Ehmed piştî koça xwe bi demeke hindik ev helbesta xwe nivîsandiye. Lewre ev helbest di sîh salîya wî de, wate piştî koça xwe bi du salan hatiye nivîsandin:

*Min nema ismê heyatê faniyê sih sale me
Nam û nişanê tebatê qet nema dîwane me
Sa'eta badê seba tê pir bi ah û nale me
Çi dema reqs û sema tê serxweş û wîrane me
Can-fidaê şehdê xendan im exisnî ya xiyas*

Di helbestên Mela Ehmed de temaya xurbet, firqet û hicretê zehf heye. Ev temayên ku aidê jiyana wî ya şexsî ne, bi temaya eşq û muhebbetê ve yên ku malê hemû helbestvanan e, gihîştine hev û helbestvan ketiye nav renc û derdekî mezin de. Di wê pileyê de ku helbestvan dikare wekî "helbestvanê muhbet û xurbetê" bê binavkirin. Lewre dîwana Mela Ehmed bi van temayan hatiye dagirtin:

Ji ser ta pê birîndar im bi derba *hicretê* îro
Cunûn û bê hiş û har im ji kerba *firqetê* îro
Ze'îf û jar û naçar im ji te'ba *xurbetê* îro
Seyahê sîne sed-par im bi herba *muhbetê* îro
Bi mislê gestiyê mar im ji şewqâ qameta pur-tab

Îro di hebsa *xurbetê* ez dê bikêşim *zehmetê*
Heta bibînim fûrsetê rûnim li ser banê ferec

Narê *işq* û *muhbetê* sohtî li min qelb û kebed
Wan îş û rencê *xurbetê* kuştim nigarim el-meded

Daxan ji narê *firqetê* tîran ji qewsê *hicretê*
Top û tivingê *xurbetê* yekser helandim sed hewar

Îro bi derba *hicretê* dil tarûmar im el-xiyas
Sohtim birûska *firqetê* perwerdigar im el-xiyas

Bi derba *hicretê* har im bi mislê cemreyek nar im
Mudamê bendeê yar im çî qitmîr ber derî yim ez

Ji dîwana wî tê fêhmkirin ku wî jî wekî hemû melayên medreseyan dîwana Melayê Cizîrî xwendiyê û di bin bandora wî de maye:

Ela ya eyyuhe's-saqî ji zatê te ricakar im
Werîn camek meya baqî ji hicrê mest û xemdar im
Melûl im bê qedar saqî muferreh bim bi camê ra

Lal

Osman Îzol

Di axivîm bi sermê ra
sermê digot tu pir sar î
hatim ziman bi berfê ra
berfê digot tu wek ar î
dîfiriya wekî bazan
esman digot tu bêhal î
min wek Elî bîr vedida
avê digot tu bêzar î
dimeşiyam bi demê ra
demê digot tu yî kal î
disekinîm bi tenê ra
tenê digot tu ne yar î
dikeniyam bi girî ra
girî digot tu xemgîn î
dikelimîm b'bedengyê ra
bedengyê d'got tu yî lal î

Nûra te girî yekser rûyê cîhan lebaleb
Heft asîman beraber hûr û cinan lebaleb
Qedehên abê heyatê ne dî şî'ra me labaleb

Berhemên wî yên Edebiyata Dînî

Ji bilî dîwana ku li pey rêça dîwanên klasîk hatîye nivîsandin, Mela Ehmedê Heyderî her weha di edebiyata dînî de jî du berhemên hêja li pey xwe hiştine. Yek ji van *Eqîdeya Îmanê*, ya dî jî *Munacatê Heyderî* ye. Ji bilî aliyê wî yê edebî jî van berheman tê fêhmkirin ku ew zanayekî baş yên medreseyan bûye. *Eqîdeya Îmanê* li ser terzekî klasîk hatibe nivîsandin jî, *Munacatê Heyderî* wekî cûreyekî edebî di warê munacatê de di edebiyata Kurdî de berhemeke gelekî girîng û orjînal e. Bi taybet naveroka wê, çanda nivîskar ya fireh û çavkaniyên wî yên dînî, tesewwufî û edebî bi me dide nîşandan.

Teqwîmnameya wî

Teqwîmname yekane berhema wî ya pexşan e. Ev berhem ber'eksê berhemên wî yên edebî bi Erebi ye.

Heyderî jî wekî gelek zana û nivîskarên berî xwe, Kurdî hew di helbestê de bikaraniye. Dema ku xwestiye li ser mijareke cuda raweste, wê demê berê xwe daye zimanê Erebi. *Teqwîmname* jî bi sebeb ku ne edebî ye bi Erebi hatiye nivîsandin. Mijara vê berhema wî li gor zanista klasîk ya astronomiyê nîşandana wextan e.

Encam

Mela Ehmedê Heyderî, alim û edîbê dewreke gelekî zehmet e. Ew dewra ku hemû medrese ketibûne binê erdê û edebiyata Kurdî ya klasîk jî di nav wan şert û mercên zehmet de hebûna xwe berdewam kiribû. Çawa ku tê zanîn bi avakirina komara Tirkîyeyê (1923) û bi qanûna esasî ya sala 1924an hebûna Kurdan hatibû redkirin, zimanê Kurdî hatibû qedexekirin û medreseyan Kurdan jî bi qanûna "Tevhîda Tedrisatê" hatibûn girtin. Piştî bûyera Şêx Se'îd qewimî bû. Ji ber vê rewşa giran gelek edîb û çalakvanên Kurd koçî Sûriyeyê kiribûn û li Sûriyeyê di nav azadiyekê de xebatên xwe domandibûn. Heçî welat e, di vê dewrê de li wir medreseyan Kurdî ketibûn binerdê, lê heyîna xwe bi dizî û zehmetî jî be berdewam kiribûn. Îcar di van şert û mercên dijwar de jî hinek berhemên Kurdî yên edebî hatine dayîn.

Bêguman Mela Ehmed di nav wan kesan de cihê gelek mezin digire. Mela Ehmed jî ji wê nîfşa edebî ye ku di dawîya dewleta Osmanîyan de mezin bûne û qedexeyên Komara Tirkîyeyê bi ser wan de girtine, lê digel vê dîsa li ser piyên xwe mane. Helbet Mela Ehmedê Heyderî bi çar berhemên xwe, cihê xwe yê gelekî taybet di nav edîbên Kurdan yên medreseyan wê deme de yên wekî Mela Nesreddînê Zoqî (1930), Mela Reşîdê Comânî (berya 1950) û Seydayê Xasî (1862-1951) hwd. heye. Hêviya me ew e ku di demeke gelekî nêz de xebateke akademîk li ser vî helbestvanî bê kirin û cihê wî di ferheng û edeba Kurdî de bê tesbîtkirin. ●



Parîsabad

Enînivîseke Parîsê

ROHAT ALAKOM

Dîroka Kurdên koçber ku bi darê zorê nefî bûne û ji welatê xwe bi dûr ketine her tim bala min kişandiye, wek Kurdên Anadolîya Navîn, Kurdên Îstenbolê û Kurdên Swêdê. Di folklorê Kurdî de mirov gelek caran rastî vê mijarê tê, gelek stranên Kurdî wek tê zanîn bi cotepeyva “Kambaxa vê sirgûnê” dest pê dikin. Her wisa wêneyê edebî yê vê rêwitiya van Kurdên koçber bala min dikşîne. Di van salên dawîn ev mijara di çend roman, serpêhatî û helbestên Kurdî de jî hatiye nitirandin û bi kar anîn.

Yek ji van berhemên jî romana Fawaz Husên a bi navê *Parîsabad* e (Avesta, 2010) ku bi gelek aliyan ve bala min dikşîne. Nivîskarê vê romanê Fawaz Husên heta niha bi dehan berhem û lêkolînên edebî nivîsîne, her wisa jî çend berhem ji zimanê Fransî wergerandine Kurdî û yên Kurdî wergerandine Fransî. Ev romana wî ya bi navê *Parîsabad* dikare berhemê nivîsîyografîk bê hesabî, bi gelek aliyan ve dişibihe jiyana nivîskar ku her di rê de ye, Sûriye, Fransa,

Swêd û her dîsa Fransa. Fawaz Husên niha li Fransayê dimîne, li wir mamostetiya zimanê Fransî dike.

Romana *Parîsabad* bi zimanekî xweşik û zelal hatiye nivîsîn. Mirov li rastî gotin û îfadeyên nû tê, wek mînak nivîskar dema qala jineke ji Çînê dike, danasîna “Çîniya çavtepsi” bi kar tîne. Koçberan wek mirovên “Buxçeyên xwe avêtine ser milên xwe” dinavîne. Di romanê de, gelek beşên ku kêfa mirovan tîne, he-nin. Mirov di romanê de, wek neynikekê xwe jî tê de dibîne. Wek mînak, lehengê romanê dema diçe *Daîreya Bêkaran* (Saziya Kardîtîne) wek hergav wê rojê di nav streseke mezin de ye. Dema min ev beş xwend, wek xwendevan, ez xwe bi xwe keniyam. Lehengê romanê yê bînteng wek hemû mihaciran çî belge û dokumanan li mal dibîne, wan dipetisîne, dike çenteyê xwe. Nivîskar vê yekê wiha îfade dike: “segbavên Fransiyên” qet ji belgeyan têr nabin.

Ev romana Fawaz Husên ya bi navê *Parîsabad* ji 102 rûpelan

Nivîskarê vê romanê Fawaz Husên heta niha bi dehan berhem û lêkolînên edebî nivîsîne, her wisa jî çend berhem ji zimanê Fransî wergerandine Kurdî û yên Kurdî wergerandine Fransî

pêk tê. Di romanê de, 9 beş hene. Nivîskar ev beş, bi hostatî, bi hev re honandine. Dema mirov beşa yekem dixwîne, beşa dide pey wê û heft beşên din ku li pey hev rêz bûne, bi hin miftepeyv (peyvên anaxtar) bi hev re hatine kêl kirinê, girêdan. Ev miftepeyv di romanê de fonksiyoneke mezin dilîzin, wek peyvên: *bav, mal, qirmît, dilop, hinar, birinc, dehlîz, metro...* Ev sîstema sîgnalan ku ji peyvên wusa pêkhatî nahêle xwendevan berê xwe bide aliyekî din û bi vî tehrî hemû pirtûkê wek tekstekê dibîne. Mirov dikare bêje ku xwendevan xwe li malê dihesibîne û di nav van 102 rûpelan de her li Parîsabadê dimîne, van kurtebeşan wek romanekê dixwîne.

Lehengê romanê piştî ku li xerîbiyê xebera mirina bavê xwe dibihîse, êdî kerr û gêj e. Nivîskar wek stîlekê, di her beşên romanê de bavê lehengê xwe tîne bîra wî. Lehengê romanê her *bavo-bavo* ye! Nivîskar mirina bavê, jê re dike sala mîlad û sala hîcrî. Êdî lehengê romanê di jiyana xwe de hemû bûyeran berî û piştî mirina bavê xwe beş dike. Vê yekê wek deqek, fetlan û zivirekê qebûl dike. Gelo lehengê romanê çima wiha bi dil û bi xurtî bi bavê ve zeliqiyê? Di romanê de, qet behsa dayika lehengê nayê kirin. Xwendevan bi rehetî dikare bifikire “*Qet diya wî tuneye? Mirov qet bêdayik dibe?*” Wisa tê xuyan ku nivîskar bi vê “*bêdayikiyê*” xwestiyê fokus û balkêşî hertim li ser têkiliyên kur û bavê bimîne, vî aliyê jiyana bide nasîn û hin



Wêneyê keçeke bi navê Vodfa ji Amûdê, ji bajarê nivîskar Fawaz Husên.

Ev berhema hunerî gerok û lêkolerê xwêdî bi navê Sven Hedin çêkiriye. (1917)

tiştên jiyana borî ji bîr bike. Him leheng, him jî nivîskar naxwaze xwendevan hînî vê yekê bibin.

Fawaz Husên navê lehengê xwe yan jî lehengê romana xwe yê pêşîn nade. Lêbelê dema mirov vê romanê dixwîne, mirov dibîne ku ev lehengê mêrîn kesekî Kurd e, bîst û pênc sal in li dûrî welatê xwe, ji gundê xwe, nêzîk û nasên xwe dûr maye. Dûrwelatiyê ew girtiye, bi salan bernedaye û mora xwe li eniya wî xistiye. Bi giştî ji Fransayê, ji Parîsê û ji hemwelatiyên vî diyarî gelek aciz e, wek mînak xwendevan li hin ciyan dikare rastî îfadeya mîna “*segbavên Fransiyayê*” jî bê. Di salên dawîn de, li hemberî biyaniyan, mezinbûna wê dijayetî û dijminiya li Fransayê pêl daye, bîna lehengê romanê hin jî tengtir kiriye. Ev bajar, di dawiyê de dibe Parîseke bêreng, fetisokî ku lehengê romanê bi xezep diperitîne, dike yekî depresîv. Parîs, di romanê de dişewite. Her çiqas nivîskar bi

xwe nav nade jî, lê belê xwendevan dikare gelek bi rehetî vî kesê wiha bînteng bi navê “*Bîntengo*” binavîne. Ew Parîsa şeng û şox, Parîsa ku bi sedsalan bi femînînûna xwe hatiye nasîn, bîna gulavên xweş jê tê û bûye navendeke modeyê, ji çavên lehengê romanê dikeve. Angorî vî lehengê romanê êdî “*Bajarê Parîs*” ê (Parîsabad) cihekî mayînê nîne û bajar li ber çavên wî êdî bûye: “*Parîsopolîs*”.

Di hişê vebêjer (leheng) de, her tim bajarê wî yê bi navê *Amûdê*, gundê bi navê *Kurdo* heye, berê xwe dide rojhilatê, dixwaze here “*welatê bavê xwe*”, aliyê ku roj jê hiltê. Doxtorê wî jî di wê baweriyê de ye, nikare alîkariya wî bike, dêvla dermanan binivîse, hema jê re dibêje “*Here mal, bîna xwe derxe!*” Kîjan mal? Di romanê de, ev pirs her diçe girîng dibe, dibe pirseke sereke û mora xwe li mesaja romanê dixê. Ev pirs her wisa bê bersiv dimîne. Di eslê xwe de, lehengê romanê

kesekî bê mal û bê kok e. Nigên wî li erdê nakevin. Ev kesê ku me li jor navê *Bîntengo* lêkiribû biryara xwe digre, piştî bîst û pênc salan dixwaze here welatê xwe ziyaret bike. Rebeno, bi kêmanî dixwaze qet nebe, bi derengî be jî, here ser gora bavê xwe û wî bi *postum* (piştî mirinê) ziyaret bike. Wisa jî dike. Li welêt çend rojan dimîne, zêde na. Li vir jî, bîna wî teng dibe. Ew, her tiştî – tiştên ku berî bîst û pênc salan gelek mezin û rengîn dîtibûn- vê carê piçûk û reş dibîne! Êdî çavên wî li rêya Parîsê digere. Ew dixwaze zûtirekê jî vî erdê ku demekê welatî wî bû, roj lê hildihat, derkeve, ber bi Parîsabadê bifire.

Belê welatek diçe, welatekî din tê, Parîsek diçe Parîseke din tê. Dem û mekan her diguherin, angorî dem û meknan mirov jî diguherin. Di romanê de “teoriya angoriyê” xwe yekcar xwe dide dest û xwe nîşan dide. Êdî zora polîsê Fransî, dilopkirina serşokê û xirabiyên din nayên bîra lehengê romanê. Wî ev mijar bi kêmanî vê gavê jî bîr kirine. Ji ber ku roman bi vî awayî diqede, şansê xwendevanan jî êdî namîne ka fêr bibe gelo ev lehengê bîngteng piştî vê gera xwe, niha li Parîsê di çi halî de ye, gelo bînfirêhî û kêfxweşî wek pariyekî şans para wî ketiye?

Ev beşê dawî yê romanê kakil û mesaja romanê jî eşkere dike. Kesên ku berê xwe didin xerîbiyê, dûriyê, gelek tiştan wînda dikin. Di nav van tiştan de, welat û welatevînî jî heye. Dema gelek tiştan wînda dikin, vê carê bêriya van tiştan jî dikin. Ev qayîdekî jîyanê ye. Mirov gelek caran bêriya tiştên

Seyyah

Hasan Huseyin Çevik

Terkî wetan herin dergah li xurbetê cahê xerîb
Wekî Hewa li Ciddayê wekî Adem li Serendîb
Wekî bilbilê Nîsanê wekî feryadê Endelîb
Ban ke wî Ehmedê Muxtar ban ke wî Sebûrê Xufran

Piyê min saz ‘eşqê mecaz bibim seyyah Belh û Şîraz
Ban kim Ehmed û Muhemmed ban kim Heyder ban kime Baz
Negrim mesken Semerqandê biçime ez Rûm û Hîcaz
Bikşînim Esmaul Husna navê wî Xefûrê Xufran

Di nava behrê cehrê da min tu nedî hed û kenar
Canê birîn canan wahîd birîn ne sed û ne hezar
Mecrûhem pîrr birîn’em ez li babê te Perwerdigar
Birîna min pîrr xeddar e bike îlaç tu yî Lokman

1954

windabûyî/windakirî dike. Ji ber van mesaj û rastiyên romanê, herkesê ku li xerîbiyê jî xwe re hêlînek çêkiriye, li wir dimîne, dikare bi rehetî xwe di vê romana Fawaz Husên de yekcar xwe bibîne.

Nivîskar Fawaz Husên divê dûmahiya vê romanê bîne. Ez bi xwe gelek meraq dikim gelo piştî vegera ber bi Fransayê paşê wê çi bê serê vî kesê ku wiha bêwelat maye, hedûra (rehetî) wî ne li Fransayê tê, ne jî li Kurdistanê tê? Belkî jî em vî kesê derbider, tengazar û bêkok li wan “Giravên Antîlê” bibînin ku navên wan di romanê de çend caran derbas dibin. Em qet nizanin.

Mirov enînivîsa van dûrketiyên ku derodero bûne û ji cih û meskenê xwe leqiyane, gelek caran nikare bixwîne. Belkî lehengê romanê jî mîna qeder û enînivîsa hemû mirovên diasporayê nîgekî wî li Parîsabadê û nîgekî wî jî li “Amûdabad”ê be, rojên xwe yên mayî jî wiha bi seferan derbas bike. Ev jiyana wî ya nû: *jiyana du-welatî* dikare kesayetiya wî ya qurmiçî, çilmisî û baskokirî jî nû ve bibiriqîne, vejîne û wî agirê ku demeke dirêj vemiribû careke din sor bike. Ev yeka her wisa jî dikare destê vî kesê wiha qudumketî/şikestî bigre, rabike ser pêyan û gelek hêviyên mezin jê re bihêrine: “Dinya yek e derge hezar.” ●

Serencama Pisîkê

Bro Omerî

Pisîkê taxek feqîr
Baz û piling yek bi yek
Carek diçe mala Mîr
Hatîn balê bûne lek

Li nav baxçe, ber birkê
Gişan hilda darê xwe
Rastî peykerê şêr tê
Berê xwe dan warê xwe...

Bi baldarî lê nêrî
Bi def, borî û bilûr
Jê tiştê neket serî
Guran kire zûrezûr

Çû ber mirêka hundir
Gur û torîk çûn ser wan
Li xwe gerand çend awir
Şar û gund kirin wêran

Dît ku mîna peyker e
Bi guran re şer danîn
Ji qalibê xwe der e
Rabûn qira hev anîn

Ji yê malê dipirse:
Baz û pilingên leheng
“Ewê wek min çi kes e?”
Dinya li gur kirin teng

Got: Ew peykerê şêr e
Gur ketin bextê rovî
Pir bi hêz û xweş mêr e,
Ku hinek bibe hêvî.

Şahê ajalên kovî
Ew roviyê pir fenek
Gur li nik dibin rovî
Geh bi xap û geh bi dek

Hakimê çol û çiyê
Berê xwe da şoreşê
Ji fil ta bi mûriyê
Bi zikişkê bi meşê

Li daristanê ajal
Xwe gihande serleşker
Bi giyan û can û mal
Dît ku pisîkek çavzer...

Hemî jê re leşker in
Pisîk bazda kadînê
Bêyî wê tevnagerin.
Geh jî kete kulînê...

Piştî van pesnê şêran
Rovî ew girt û anî
Ku pisîkê malê dan
Li destê guran danî.

Biryar girt ku bibe şêr
Ji ber kirinên mekrûh
Rizgar bike jin û mêr;
Ahd da, kir toba nesûh

Awir vedan wek piling
Nema tiştê wiha kir
Terî rakir, kire sing
Giyanê xwe riha kir...

Rabû çû warek nenas
Rast e, beza kitikê
Pesnê xwe da bêqeyas...
Ji axo ta sifikê...

Li her derê bû dengî
Ev çi hêviya bêxêr!..
Bizava wî lehengî
Çawa pisîk bibe şêr?

Adar – 2005



Îbnu'l Ezreq û berhema wî “Tarîx’ul Meyyafarîqîn û Amîd”*

ERCAN GUMUŞ

KURTE/XULASE
Navê wî yê dirêj/kûnya wî “Ahmed bîn Yusuf bîn Alî bîn Ezreq” e ku ew digel teqwîma miladî di navbera salên 1117 - 1181an de li Farqînê (îro navçeya bajarê Diyarbekîrê ye, di wan salan û dewran de bajarekî herî mezin bû û demek dirêj paytextiya Merwaniyan jî kiribû) jiya ye. Ji berhema wî tê zanîn ku Îbnu'l Ezreq, ji welatê xwe û ilmê dîrokê pir hez dikir. Bi vê motîvasyonê berhema xwe ya bi navê *Tarîx’ul Meyyafariqîn û Amîd* nivîsî ye.

Ev berhem ji bo herêma ku Îbnu'l Ezreq tê de jiyabû ji ber du sedeman çavkaniyeke bêhempa ye. Ya yekemîn, ew agahiyên berhema xwe, bi dîtin û bihîstinên xwe û ji pirtûkên dîroknivîsên Misilmanan ku beriya wî jiyane pêk aniyê.

Ya duyem jî, Îbnu'l Ezreq berhema xwe ji bo pêşkeşiya tu kesî -wek hakim û fermanदारên wê deverê- nenivîsiye. Ev taybetmendiyê hanê ku di berhema nivîskar de derdikeve pêş ne ji bo tu kesî û ne di bin bandora

tu kesî de nivîsandiye. Ev taybetî berhema wî bêtir giranbûha dike.

Berhem bi zimanê Erebi hatiye nivîsandin. Mixabin heya îro serbiser nehatiye wergerandin. Beşên vê berhemê yê Artuqî û Merwaniyan ji bo Tirkî hatine wergerandin.

Wexta ku dîrokvan bûyerên dîrokî û qewmînan dinirxîne û diguhêze/neql dike, serî li çavkaniyan dide. Agahiyên ku neql dike/diguhêze li ser çavkaniyên berdestê xwe pêktîne. Berhemên xwe li ser çavkaniyan ava dike. Çavkaniyên dîrokvan çiqas xurt bin berhema wî jî ewqas/hinda xurt dibe, lêbelê çavkaniyên wî çiqas qels bin berhema wî jî ewqas/hinda qels dibe.

Xêncî ku babetên/xusûsên li jorê hate behskirin/qalkirin heke di çavkaniyan de kêmasî hebin ji agahiyên ku têne neqilkirin şik tê birrîn. Bi vê nêrînê, bûyerên dîrokî ku nêzîkî vê gavê dibe ji aliyê çavkaniyan ve xurt dibe. Ji bilî vî tiştî, bûyerên dîrokî çiqas dûrî vê gavê be, ji aliyê çavkaniyan ve qels dibe. Agahiyên têne

Berhem bi zimanê
Erebî hatiye
nivîsandin. Mixabin
heya îro serbiser
nehatiye wergerandin.
Beşên vê berhemê yê
Artuqî û Merwaniyan
ji bo Tirkî hatine
wergerandin

dayîn bi guman dibin. Ji aliyê din ve agahî dibin yê nezanistî. Wek mînak em agahiyeke ku bz (beriya zayîna Îsa) 3500 sal hatiye dayîn û agahiyeke ku sed sal berê ango pz (piştî zayîna Îsa) 1900î hatiye dayin bidin ber hev. Bêguman di nav van herdu mînakan de ya nêzî rastiyê bûyera dawî ye. Di vir de babeta/xusûsa bingehîn nêzîkbûna dema çavkaniyan e. Ji xeynî nivîsandina dema berhemê sê pîvanên zanistî jî hene. Ew jî ewlehî, cihêrengî û naveroka berhemê ne.

Ji bo lêkolîneke baş ya li ser sala 12ê pirsgrêka herî mezin berdestxistina çavkaniyan e. Tê zanîn ku berhemên di wan salan de hatine nivîsandin îro bi hêsanî nakevin destê me û nayên dîtin. Piraniya wan berheman hatine texrîbkirin û negihîştine vê rojê. Du sedemên vê hene. Ya yekem dagirkirina Moxolan a Rojhilata Navîn e ku ji sedsala 11ê dest pê kiriye û heta sedsala 14ê dom kiriye. Ya duyem jî dagirkirina Xaçperestan ya Rojhilata Navîn e. Ew jî ji sedsala 10ê de dest pê kiriye û heta sedsala 14ê dom kiriye. Texrîbata van herdu tertalanan bandoreke mezin li ser welatê Misilmanan û Kurdan hiştiye. Ji ber van herdu bûyeran, berhemên girîng ên Îslamî negihîştine vê rojê. Ev taybetî, qîmeta berhema Îbnu'î Ezreq zêdetir dike. Lewra *Tarîx'ul Meyyafariqîn û Amîd* di sedsala 12ê de hatiye nivîsandin û gihîştine vê rojê. Di pey re ev berhem, qala dîroka Rojhilata Navîn û dîroka netewên vê herêmê dike. Nasandina wan neteweyan û çanda wan dike. Ji vî aliyê xwe ve jî berhemeke bêhempa ye.

Jiyana Îbnu'î Ezreq

Navê wî yê rast "Ehmedê kurê Usîfê kurê Eliyê kurê Ezreq" e. Lêbelê ew bi navê "Îbnu'î Ezreqê Farqînî" hatiye naskirin. Di sala 1117ê de li Farqîna Amedê ji dayik bûye. Ji malbateke biesl û navdar e. Bedevî Abdullatif Avad -li ser berhema Îbnu'î Ezreq teza doktorayê li Zanîngeha Cambrige yê di sala 1949-1956ê de amade kiriye— di xebata xwe de behsa tunebûna agahiyên derheqê zaroktiya Îbnu'î Ezreq de dike. Dibêje ku "tiştê balkêş çawa Îbn-u Hallîkan, Îbn-u Şakir el Kutubî, Yaqut û nivîskarên wê demê behsa jiyana zaroktiya Îbnu'î Ezreq nekirine. Ji ber ku Îbnu'î Ezreq di dema lê jiyabû dîroknivîsekî navdar bû." (Îbn'ul-Ezrak, 1990, r. 49.)

Îbnu'î Ezraq ji malbatek bi nav û deng bû. Kalê wî Ebul-Hesen Reîs Elî kurê Ezreq bû û wî jî li bal Mihemedê kurê Cehir wezîrtî kiribû

Agahiyên derbarê jiyana Îbnu'î Ezreq de, ji berhema wî hatine girtin û ev agahî jî di nav pirtûkê de belavbûyî ye û ne bi hev re ye. Di derbarê zaroktiya wî de agahî tunebe jî, derbarê ciwantiya wî û rewşa zanebûna wî de agahî hene. Wekî din meriv ji rêwîtiya wî ya ku Ermenistan, Şam, Iraq, el-Cezîre û Îran daye ber xwe, gelek kevneşopî û çanda wan dibîne û şîrove yê wî yê li ser wan netewan hîn dibe.

Îbnu'î Ezreq ji malbatek bi nav û deng bû. Kalê wî Ebul-Hesen Reîs Elî kurê Ezreq bû û wî jî li bal Mihemedê kurê Cehir'î wezîrtî kiribû. Di dewra hilweşandina dugela Merwaniyan de li bal Mihemedê kurê Cehir û kurê wî Zaimuddewle Ebulqasim, di sala 1086an de Ebul-Hesen li Hesenkeyfê wezîrtî kiribû. (Îbn'ul-Ezrak, 1990, r. 50-51; Beysanoğlu, 2003, r. XV) Xêncî van agahiyan Ahmet Savran jî dibêje ku piştî vê demê Ebul-Hesen bû hakimê/parêzgerê Erzenê. Dû re ku Mihemedê kurê Cehir ji parêzgeriya Diyarbekirê hate hildan. Komîteyek ji Farqînê çû bal siltan û daxwaza lêvegerandina Mihemedê kurê Cehir kir. Di nav vê komîtê de Ebul-Hesen jî hebû. (Îbn'ul-Ezrak, 1992, r. 10)

Îbnu'î Ezreq ku mezin bû, ji bo xwendinê çû Bexdayê. Li wir dersên Qur'anê, fiqhê, feraîzê, hedîsê, tefsîrê û zimanzaniyê xwendin. (Îbn'ul-Ezrak, 1990, r. 51)

1) Ev Mihemedê kurê Cehir, demek wezîrtiya Selçuqîyan jî kiribû. Lêbelê ev meriv di dewleta/dugela Merwaniyan de di dewra Ehmedê kurê Merwan û kurê wî Nasr kurê Ehmed û birayê wî Seîd kurê Ehmed û yê ku derbasî dewsa wî bû biraziye wî Mensurê kurê Nasr de û wî re jî demeke dirêj wezîrtî kir. Dû re bi Selçuqîyan re tifaq/hevalbendî kir li hemberî Merwaniyan serî hilda û li ber serwerê xwe yê kevn yanê Mîr Mensûr têkoşîn kir. Ev bûyer bû sedema belavbûna dugela Merwaniyan. (Şerefname, 1990, r. 30-31; Zekî Beg, 2002, r. 341-342) Mele Evdillah Varlî dibêje ku evî wezîrtî jî bo bidestxistina dewletê dest bi sextekariyê kir. Kurê Cehir di sala 1085an de bi Mîr Mensur re kete şer û têk bir. Mîr Mensur li Cizîrê bendî kir û avêt hepsê. Mîr Mensur li zindanê nexweş ket û dû re mir. Mirina Mîr Mensur bû sedema belavbûna dewleta Merwaniyan û di sala 1095an de ev dewlet helweşiya. (Varlî, 1997, r. 179)

Wisa tê fêmkirin ku Îbnu'l Ezraq ji ilmê dîrokê pir hez kiriye û li ser dîrokê nivîsandiye. Li ser hînbûna dîrokê hewl daye

Li Bexdayê dersa Qur'ana Pîroz, ji şêx Ebu Mihemedê kurê Bint şêx Ewdilwehabê Heffaf; dersa hedîsê, ji Ewbekirê qaziyê Bimaristanê û ji kurê el-Semerqandî û ji Ewdilwehabê el-Enmaî yanê ji sê mamosteyan hilda. Dersa fiqhê, ji şêx Ewdilqadirê kurê en-Nerawî, ji Qaziyêqûdat el-Damganî û ji zarokên Usivê kurê ed-Dimeşqî hilda. Dersa feraîzê, ji şêx Ebu Mizaferê kurê eş-Şehrîzorî û ji el-Attâr hilda. (Sevim, 2005, r. 475)

Wisa tê fêmkirin ku Îbnu'l Ezreq ji ilmê dîrokê pir hez kiriye û li ser dîrokê nivîsandiye. Li ser hînbûna dîrokê hewl daye û pirtûkên hanê jî xwendine:

1. Dîroka Bexdayê- Îbn Ebi Tahir Tayfur
2. Dîroka Mûsilê- Muhammed bîn es-Simsatî
3. Ewrak- Sûlî
4. El-Exanî-Îsfexanî
5. Tarix- Sâbî
6. El-Axbar'ul-Tival – Dînewerî
7. Kitab'el-Maarif –Îbn Kuteybe

Ji xeynî van pirtûkan wekî din di derheqê Erdnîgarî/Coxrafi, Zimannasî û Wêjeyê de jî gelek pirtûk xwendine. (Îbn'ul-Ezrak, 1990, r. 52)

Hêj 19 saliya xwe de ji bo xwendinê ji Farqînê derketiye

Savran ji berhema Îbnu'l Ezreq hin tiştan tîne ziman û dibêje ku Îbnu'l Ezreq 19 salî bû (pz. 1134) gava ku ji bo xebatê ji Farqînê derket û çû Mêrdînê. Dema ku li Mêrdînê dima, di bin îdara Temurtaşê kurê Necmedîn Îlgazî de xebitî. Ev cara yekem bû ku Îbnu'l Ezreq di karûbarê fermî de cih digirt. (Îbn'ul-Ezrak, 1992, r. 10-11)

Piştî rewîtiya Mêrdînê sala pz. 1136an de berê xwe dide el-Cezîrê û Nisêbînê. Ku tê Nisêbînê Atabeg Zengî dibîne û li wir çend rojan dimîne. Di pey re vedigere Farqînê. Sala pz. 1138an de cara yekem ber bi Bexdayê ve diçe. Li Bexdayê 6 mehan dimîne. Dema Bexdayê dimîne bûyerên

dîtine dinivîse. Wek li jorê hate diyarkirin, dest bi xwendinê dike û didomîne. Dema li Bexdayê maye hemû tirbe û gorên mezinên dîne Îslamê dîtine û seradana wan kiriye. Dû re çûye Medînê û tirba Selmanê Farisî jî dîtîye. Dema ku li Bexdayê dima li wir lêkolîna serhildana Xelîfeyê Ebasiyan Mutsterşîd ku li hemberî siltanê Selçuqî Mesûd 4 sal ewil kiribû, kir. Bi es-Said Mueyyîddîn Ebû Abdulhah Muhammed Îbnu'l-Anbarî re peyivî û derheqê serhildana xelîfe de agahî girtin. Ku ew meriv ketibû wî şerî jî xeynî wî li civata xelîfe de tim mabû. Agahiyên ku ji wî merivî bihîstibû êxiste nava berhema xwe. Ji vî alî ve jî berhema Îbnu'l Ezreq bi qiymet e. Lewra wî berhema xwe him bi tiştê ku bi xwe dîtî, him jî bi kesên ku bûyer dîtine ve girêdaye. Bi vî aliyê xwe ve berhema Îbnu'l Ezreq çavkaniyeke xurt e. Berhem ji ber vê taybetiya xwe bêhempa ye. Di sala pz. 1140î meha Tebaxê de dîsa vegeheriya Farqînê. Salên 1141-1142yan li Amed û Mûsilê ma. Piştî ku Şemsudevleyê birayê Husamedîn Têmûrtaş mir, sala 1143yan de Husamedîn Têmûrtaş Farqînê dixwe bin destê xwe. Îbnu'l Ezreq jî van bûyeran dibîne. Ji ber ku wan rojan de Îbnu'l Ezreq li Mêrdînê dima; sala 1147an de Husamedîn Têmûrtaş dixwaze ku li ser navê xwe pere/dirav derxe, ji ber vê yekê Têmûrtaş jî bo vî karî Îbnu'l Ezreq dişîne Madenê ku sifir bikire. Sala 1148an de Îbnu'l Ezreq li weqfên dora Farqînê de serperîştî/mufetîşî dike. Sala 1149an de ji bo Husamedîn Têmûrtaş li Mûsilê dest bi firotina hesin dike. Sala 1150yan de wexta ku Husamedîn Têmûrtaş diçe Darayê dorpêç dike, Îbnu'l Ezreq jî li bal wî bû. Bi dorgirtina bajarê Darayê de amade dibe. (Îbn'ul-Ezrak, 1992, r. 11-12; Beysanoğlu, 2003, r. XV)

Îbnu'l Ezreq heta sala pz. 1151ê li Mûsilê ma. Wê salê di ser rêya Xelatê re derbasî Mêrdînê bû û dîsa di nav wê salê de çû Bexdayê. Wan dema de Siltan Mesûdê Selçuqî yê Iraqê ji bo zivistanê hatibû Bexdayê û Îbnu'l Ezreq Siltanê Selçuqîyan li wir dît û ev dîtina xwe di berhema xwe de nivîsî. Sala pz. 1154an de berê xwe da rêwîtiyê û çû Curcistanê. Demeke dirêj li vî welatî ma û Dîmîtriyê şahê Gurcî û Abhazan nas kir. Çendekê li bal wî şahî ma û dûra ligel wî şahî derket rêwîtiyê, ber bi welatê Abhazan li ser rêya Derbendê re çûn

û ew rêwîti 70 roj kişand. Îbnu'l Ezreq di berhema xwe de pesnê Şah Dîmîtrî dide û dibêje ku ev şahê Fileyan, ji Misilmanên di bin desthilatdariya xwe re pir adil e. Ji misilmanên hemwelatîyên xwe re alîkar dibe û di taxên Misilmanan de firotin û serjêkirina xinzîran/berazan qedexe kiriye, destûra derxistina pera/diravan daye wan Misilmanan û rojên îne li mizgeftên wî welatî li ser navê Xelîfe xwendina xutbeyê jî serbest hiştiye. Îbnu'l Ezreq dibêje ku bi van aliyên xwe ve şahê Fileyan serbestiyek ewqas mezin dabû Misilmanan ku belkî li Bexdayê jî Misilmanek ewqas serbest nîn be. Xêncî van gotinan dibêje ku Şah Dîmîtrî rojeke îne, piştî nimejê hate mizgeftê û xêra xwe 200 dînar da weqfa mizgeftê. (Îbn'ul-Ezrak, 1992, r. 13-14)

Mêvantiya Îbnu'l Ezreq ku li Gurcistanê demeke dirêj kêşandibû di sala 1154an de qediya. Piştî mayîna li Gurcistanê ew di ser rêya Serhedê re hate Xelatê. Dûra çû Sêwazê. Li wir bi Mîr Nîzamedîn Yaxîbasan re hevdişînek pêk anî. Dîsa di nav wê salê de vejeriya Xelatê. Ji Xelatê derbasî Erdîşê bû, ji Erdîşê hate Bêgîriyê², ji Bêgîriyê di ser xeta bajarên Nîşabur, Katwar, Xoy, Merend, Tebrîz û Zencanê re derbasî Reyê bû. Piştî vê gerîne jî di rêya ku hatibû de vejeriya û çû Farqînê. (Îbn'ul-Ezrak, 1992, r. 15-16)

Di sala 1162an de Gurcî li hemberî artêşên yekbûyî ku ji hêla Siltan Arslanşah, Nasrudîn Sokmenê IIê, Şemsedîn Îldeniz û Fexredîne Mîrê Erzenê pêk dihat re şer kiribû û Gurcî têk çûn. Wan rojan de Îbnu'l Ezreq li wir maye û piştî wî şerî derbasî Xelatê dibe. Sala 1167an de li Farqînê dibe serperîştê/mufetîşê weqfên Farqînê. Salek şûnda di sala 1168an de di ser rêya Riha, Heleb, Hama, Himisê re derbasî Şamê dibe û li wir dibe wezîrê/lênêrê weqfên Şamê. 5ê Tîrmeha sala 1170an de roja yekşemê serê sibê erdhejeke mezin çêdibe û Îbnu'l Ezreq vê bûyerê dibîne û di berhema xwe de bi berfirehî behs dike. (Îbn'ul-Ezrak, 1992, r. 16)

31ê Kanûna sala 1170an de Îbnu'l Ezreq wexta ku li Şamê dima rastî karwaneke pir mezin tê.

Avad dide nîşan ku, Îbnu'l Ezraq ev berhem ji bo nasandina bajarê Farqînê nivîsiye û mijara vê berhemê bûyerên dîrokî ne

Ev karwan ber bi aliyê Misrê ve diçe. Îbnu'l Ezreq dibêje ku "Li Gerdûnê/Dinyayê civîna karwaneke ewqas mezin ne mumkun/pêkan e" û diyar dike ku di wî karwanî de 70.000 hêştir hebûne. Di nav rêwîyên wî karwanî de keça Şemsudewlê Turanşahê birayê Selahedîne Eyyûbî û jin û zarên merivên di bin maiyeta wî, ji xeynî wan kesan, ji gelê Şamê jî hin kes di nav karwanî de hebûne. (Îbn'ul-Ezrak, 1992, r.17)

Îbnu'l Ezreq di sala 1172an de cara sêyemîn diçe Bexdayê. 1175an de li ser bi serketina hêzên yekbûyî yên Tirkan li dijî Gurciyan, Îbnu'l Ezreq careke din vedigere Xelatê. Ev serdan, di berhema wî de rêwîtiya dawî ye. Hin lêkolîner dibêjin ku di sala 1181an de jî Îbnu'l Ezreq hê jî sax bû. Lêbelê dîroka mirina wî nayê zanîn. (Îbn'ul-Ezrak, 1992, r. 17)

Tarîx'ul Meyafarîqîn û Amîd

B. A. Avad, di xebata xwe ya doktorayê de dibêje ku du destnivîsên berhema Îbnu'l Ezreq hene û ev herdu destnivîs jî di British Museum a li Londonê ne. Ji xeynî van, destnivîseke din jî heye lêbelê ew destnivîs li Pirtûkxaneya Budlîne ye. Baweriya B. A. Avad ew e ku di nav van her sê destnivîsan de ya ku nêzikî berhema Îbnu'l Ezreq, destnivîsa mezin a li British Museumê ye. (Îbn'ul-Ezrak, 1990, r. 14-15)

Em ji xebata B. A. Avad hîn dibin ku di derheqê berhema Îbnu'l Ezreq de hin agahî kêm in û hin tişt ne zelal in. Wek dîroka nivîsandina vê berhemê nayê zanîn û ka li kû derê hatiye nivîsandin jî ne diyar e. Avad dibêje ku Îbnu'l Ezreq di berhema xwe de bersiva van pirsan nade. Îstînsahê³ ku B. A. Avad lê îstîfade kiriye jî ji aliyê nivîskar ve aşkere nîn e û mustensihê⁴ nayê zanîn. Lê Avad

2 "Bêgîrî", îro navçeyê Wanê ye. Carna "Bergîrî" jî tê gotin û niha navê wê yê fermî Muradiye ye.

3 Îstînsah: Bi destnivîsê zêdekirin e. Beriya îcadkirina matbaayê pirtûk bi vî awayî dihatin zêdekirin û belavkirin.

4 Mustensih: Kesê ku berhemê bi rêya destnivîsê zêde dike.

**Îbnu'l Ezraq, dîroka Farqîna kevin,
dema Farsî û Romiyan jî dide nasandin.
Şah, mîr, fermanarên di vê deverê de
hukm kirine dide ber çavan**

dibêje, îhtîmal e ku Îbnu'l Ezraq berhema xwe di ciwantiya xwe de nivîsibe. Derheqê îstînsahê de jî dibêje ku mustensîh ev nushaya di sedsala 13ê de nivîsiye. Dîsa dibêje ku mustensîhê vê nushayê jî zimanê Erebfî nizane. Lêbelê destnivîsa wî pir xweş e. Dibe ku ew kes Tirk be. Avad dide nîşan ku du nusxayên vê berhemê hene. Ya mezin 418 rûpel e û ya piçûk jî 280 rûpel e. (Îbn'ul-Ezraq, 1990, r. 22)

Ş. Beysanoğlu, di xebata xwe de dide nîşan ku derheqê Îbnu'l Ezraq û berhema wî de nivîs û lêkolîna herfî kevn (beriya van lêkolînerê ku li jor navborî) di sala 1902yê de rohilatnasê Îngilîz H. F. Amedroz⁵ e. Amedroz li ser Îbnu'l Ezraq berhemek nivîsiye û weşandiye. (Beysanoğlu, 2003, r. XV)

Avad dide nîşan ku, Îbnu'l Ezraq ev berhem ji bo nasandina bajarê Farqînê nivîsiye û mijara vê berhemê bûyerên dîrokî ne û heta roja ku Îbnu'l Ezraq jiyaye wan bûyerên ku dîtine di berhema xwe de nivîsandine. Lêbelê berhem tenê bi serê xwe qala Farqînê nake, bi ser de behsa herêma ku tê de jiyaye jî dike. Dema ku lêkolîner bi çavê lêkolînê li berhemê binêrin dê rewşa çand û siyaseta sedsala 12ê a Rojhilata Navîn jî bibînin. Bi van aliyan ve di vê berhemê de, di derheqê jiyayî, tevger û kesayetiya xelîfe, siltan, mîr, beg, wezîr/paşmîr û zanayên wê demê de, neteweyên wê herêmê de, şer û cengên mezheban de û taybetiyên welatan de pir agahiyan bigrin. Her wiha Îbnu'l Ezraq di vê berhemê de di pirsgirêka xelîfetî û mafê xweyîbûna xilafetê de piştigiriya malbata Haşîmiyan dike. Îbnu'l Ezraq qala pirsgirêka xelîfetiya Yezidê kurê Muaviye jî dike, rewşa aborî ya hin welatan dide nasîn. Dîsa ji aliyê adet û çandê ve welatên ku lê geriyabû dide naskirin. (Îbn'ul-Ezraq, 1990, r. 18-19)

Îbnu'l Ezraq di berhema xwe de di derheqê Dugela Emewiyan û siltanê-xelîfeyê wan de, pirsgirêka navbera wan û tîkiliyên bi cînarên wan vedibêje û dûr û dirêj behsa wan dike. Dû re jî di derheqê Ebasiyan de jî agahiyan dide. Agahiyên ku di derheqê wan de bihîstîne tevî nêrîn û şîroveyên xwe neqî dike. Behsa siltan-xelîfe, wezîr û navdarên Ebasiyan dike. Ne tenê nasandina Emewiyan û Ebasiyan dike, di pey re Selçuqiyayî, Merwaniyan, Artuqiyayî û atabegîtiyên ku li wê herêmê hatine damezirandin jî dide nasandin. Tîkiliyên van dugelan bi hev re çawa bû? Wan kesan di nav civatên xwe de bi çi awayî hukm danîbûn? Û xelkê xwe çawa îdare dikirin? Bersivên van pirsan jî dide. Ji xeynî wan dugelan behsa dugelên ku bi van re şer û gengeşiyê de bûn (wek Fileyan û Şîayan, Bîzansiyan, Fatîmiyan, Ermeniyan, Gurciyan û Xaçperestên ku ji aliyê rojava ve hatîbûn) û behsa hevaltî û dijminatîya van dugelan dike. (Îbn'ul-Ezraq, 1990, r. 19)

Wek ku di benda ewilî de jî derbas dibe, em dikarin bibêjin ku Îbnu'l Ezraq, dîroka Farqîna kevin, yanê beriya dewrê Îslamê dema Farsî û Romiyan jî dide nasandin. Şah, mîr, fermanarên di vê deverê de hukm kirine dide ber çavan. Di dema xelîfe Omer de Iyaz bin Ganim van deveran bi çi şiklî tîxistiye bin hukmê Îslamê? Fethên van deveran bi zorê yan bi aştîyê bûye? Bersivên van pirsan jî dane. Dûra behsê tîne ser şah, mîr û fermanarên Misilmanan ku li vî bajarî hukm danîbûn. Yê ku di dewra Emewiyan, Ebasiyan û dugelên din li Farqîn, Amîd û bajarên Kurdistanê yê mayî de çi kar anîne? Xelk bi kîjan rê û rêbazan di bin îdara xwe de girtine? Ji van pirsan re jî bersiv dide. Ji xeynî van agahiyan, li ku dera Farqînê kîjan mizgeft, medrese, meydan û avahiyên taybet û girîng hene, ka kengê hatine avakirin? Kîjan şah, mîr û fermanar li vî bajarî miriye û li ku hatiye çalkirin (binaxkirin)? Îbnu'l Ezraq van pirsan jî di berhema xwe de zelal dike. Bi vê taybetîya xwe jî berhema Îbnu'l Ezraq jiyana civakî ya wê demê zelal û ronî dike. Agahiyên Îbnu'l Ezraq -ku endamê malbateke dewlemend û arîstokrat bû- di herêma Kurdan de ji aliyê zanîstî, olî, aborî, siyasî û jiyana civakî ve demeke tarî ronî dikin. Ew dîtinên Îbnu'l Ezraq pir girîng in; ji ber

5 Amedroz, Three Arabic MSS of the history of the city of Meyyafâriqin (Der heqê Dîroka Bajarê Meyyafâriqin de Sê Destnivîs) Journal of the Royal Asiatic Society, 1902, sf. 784-812. (Beysanoğlu, 2003, r. XV)

Pirtûka bi navê *Tarîx'ul Meyyafarîqîn û Amîd* ku bêyî ku bi armanca pêşkêşkirina mîrekî, begekî angosiltan û hukimdarekî hatiye nivîsandin bi vê taybetmendiya xwe cihekî girîng di dîrokê de girtiye

ku ev meriv kesekî rewşenbîr e, li derveyî welat maye, li derdora Kurdistanê geriyaye û rexne û şîroveyan xwe nivîsîne. Em dizanin ku Îbnû'l Ezreq demeke dirêj kar û barê memûrtiya dewleta herêmê kiriye û di dawiyê de bûye Wezîrê Weqfan, ku ew peywîr beriya wî jî di malbata wan de ji aliyê kalikê wî Ebul-Hesen Elî kurê Ezreq hatiye bi cih anîn. (Îbn'ul-Ezrak, 1990, r. 20)

Bedevî Abdullatîf Avad diyar dike ku Îbnû'l Ezreq ew berhema xwe ne ji bo kesekî/ê an berjewendiyekê, ji bo rûmet û hezkirina dîrokê çêkiriye. Evîna welatê wî hêz daye wî û bi hezkirina Farqîn û Amedê dest bi nivîsê kiriye. Ev taybetî berhemê dike bêhempa û ji aliyekî din ve jî bêhtir objektîf dike. (Îbn'ul-Ezrak, 1990, r. 28)

Dema ku mirov bi dorê li çavkaniyên dîroka Meyyafarîqîn û Amîdê hûr dibe, mirov dibîne ku Qur'ana Kerîm û hedîsên Pêxember di rêza pêşîn de ne. Di pey re bi dorê dîroknas, mufessîr û erdnîgarzanên wek Dînewerî, Îbnî Kuteybe, Muhammed kurê Elî el-Simsatî, Teyfur kurê Ebî Tahir, Eb'ul-Ferec el-Îsfehanî, Îbnî Xurdazbîh, Sûlî, Sâbî, Belazurî, Vahidî, Salebî tên. Cûreya çavkaniya sêyemîn û herî girîng jî serpêhatî û dîtinên ku Îbnû'l Ezreq di gera xwe de nivîsîne. (Îbn'ul-Ezrak, 1990, r. 28-30)

Alî Sevîm, berhemên ku Îbnû'l Ezreq weke çavkanî bi kar tînin dike du beş. Beşa yekemîn, yên ku rasterast navê Îbnû'l Ezreq bi kar tînin cih digrin. Îbn Xalîkan, Sibî Îbn'ul-Cevzî û Îbn Şeddad ji van hinek kes in. Di beşa duyemîn de jî kesên ku bêyî ku navê Îbnû'l Ezreq bi kar binin ji berhema wî sûd werdigrin cih digrin. Îbnul Esîr, Yaqûtî û Aynî ji van kesan in. (Sevim, 2005, r. 473-474)

Ew dîroknasên ku bêyî ku navê Îbnû'l Ezreq bi kar anîne û ji berhemên wî sûd wergirtine bi serê xwe dikarin bibin mijara lêkolînekê. Lê tiştê herî

girîng ku me ji vê xebatê bêpar dihêle pirsgirêka zimanê berhemê ye. Bi ya me, heke wergera berhemê biqede dê bê zanîn ku ka kê ev berhem bi kar aniye. Di vê çarçoveyê de, dema lêkolîna me de em rastî hin agahiyên hatin.

Di Şerefnameya Şerefxan de, di beşa derheqê Zirkan de Şerefxan, Îbnû'l Ezreq weke çavkanî bi kar aniye (Cengiz, 2009). Cengiz angaşt dike ku Şerefxan, behsa sedsala pîz 11-12ê de agahiyên ku dide ji wî sûd werdigre.⁶ Lê ji bo ku em vê agahiyê sererast bikin divê em li benda qedandina wergera vê berhemê bisekinin. Ku bê wergerandinê em rabin û wan angaştan qebûl bikin ji aliyê exlaqê zanistiyê ve tiştê ne rast e.

Li gor Savran, ji xeynî berhema Îbnû'l Ezreq ku navê wê berhemê *Tarîx'ul Meyyafarîqîn û Amîd* e, berhemên din nayên zanîn. Dîsa li gor Savran, îro destnivîsên ku di destê me de ne, beşa berhema wî ya dawî ne. (Îbn'ul-Ezrak, 1992, r. 18)

Encam

Pirtûka bi navê *Tarîx'ul Meyyafarîqîn û Amîd* ku bêyî ku bi armanca pêşkêşkirina mîrekî, begekî angosiltan û hukimdarekî hatiye nivîsandin bi vê taybetmendiya xwe cihekî girîng di dîrokê de girtiye. Bêguman taybetmendiyeke wisa rê li ber nixandineke bêalî vedike.

Ev berhem di sala 1949an de bi eleqeya Bedevî Abdullatîf Avad di encama xebateke aqademîk/zanistî de careke din hate rojevê. Di pey re beşa Merwanîyên Kurd ji aliyê Mehmed Emîn Bozarslan ve, beşa Artuqîyan ji aliyê Ahmet Savran ve û beşa Şeddadiyan ji aliyê V. Minorsky⁷ ve beş bi beş hate wergerandin û weşandin.

6 Dema Şerefname were kolandin tê dîtin ku di behsa koka Zirkan de Şerefxan berhema Îbnû'l Ezreq daye pêş. Li gor wî jî Erebên Şamê Şêx Hesen neçar dimîne ku dev ji welatê xwe berde û li Mêrdînê bi cih bibe. Ji ber ku Şêx Hesen her tim cilên hêşîn li xwe dikirin angosiltan jî ji ber rengê çavên wî wek Şêx Ezreq (Şêxê Hêşîn) dihate nasîn. Bi demê re navê "Ezreqî" weke "Zirkî" hatiye bilêvkirin/guhartin. (Şerefxan, 1990, r. 266)

7 V. Minorsky, beşa Şeddadiyan weke maqaleyekê bi navê "Studies in Caucasian History of Mayyafarqîn" çap kir. (Îbn'ul-Ezrak, 1992, r. XIII.)

Neqandina wergera berhemeke wisa ku pz sedsala 12ê de hatiye nivîsandin bi gelemperî ji bo Rojhilata Navîn, bi taybetî jî ji bo bakurê welatê me weke gencîneyekê ye, bi baweriya me, dibe sedema bi haydarbûna ji vê berhemê û nivîskarê vê berhemê. Ji aliyê din ve em ji zanîna di derheqê sedsala 12ê de, ji her aliyê ve bêpar dimînin. Hêviya me ev e ku, wergera vê berhemê ya Kurdî bi serbiser rojekê nêzîk de bê amadekirin. ●

* Ev xebata min a yekem ku derkete holê, berê ji bo keda dê û bavê min, di pey re di nivîsa Kurdî de rêberê min ê manewî Mele Evdîla Varlî re diyarî ye.

Di vê xebatê de ji bo alîkariya Tekin Çifçi, Tahir Demir û Zeki Gurûr gelek spas dikim.

ÇAVKANÎ

-Beysanoğlu, Ş. *Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır Tarihi*, Ankara, 2003, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür ve Sanat Yayınları.

-Cengiz, S., *Zeriki Aşireti*, di 26. 12. 2009an de hate gihîştin. www.gencimranlilar.com/zeriki-asireti-t12251.html

-Emirî, A., *Osmanlı Vilayât-i Şarkiyyesi*, Amadekar: K. Z. Taş û yên din, Ankara İlahiyat Yay., 2005.

-Hizmetli, S., *İslam Tarihi –ilk dönem-*, Ankara, 1999, Weşanxana Bizim Büro.

-Ibn'ül-Ezrak, *Mervani Kürtleri Tarihi*, Amadekar: M. A. Bozarlan, Ankara, 1990, Weşanên Koral.

-Ibn'ül-Ezrak Ahmed Bin Yusuf Bin Ali, *Meyyafarîkin ve Amîd Tarihi* (Artuklular kısmı), Wergêr: Ahmet Savran, Erzurum, 1992, Atatürk Üniv. Yay.

-Zekî, Beg, *Diroka Kurd û Kurdistanê*, İstanbul, 2002, Weşanên Avesta.

-Sevim, A. (). Makaleler 3. Amadekar: S. Yalçın-S. Özbek, Ankara, 2005, Berikan Yay.

-Sırma, İ. S., *İslam ve Tarih*, İstanbul, 2005, Beyan Yay.

-Şerefhan, *Şerefname Kürt Tarihi*, Amadekar: M. A. Bozarlan, İstanbul, 1990, Hasat Yay.

-Şeşen, Ramazan, "Eyyubîler", *Doğuştan Günümüze İslam Tarihi*, 6. cilt. İstanbul, 1992, Çağ Yay.

-Varlı, E. M. M. (Hoko) Xanî, *Diroka Dugelên Kurdan*, 600-1500. Derpeç 1. İstanbul, 1997, Weşanên Sîpan.

Nê Qûlê Dest Di

Şaban ŞENATES

Ez bestêya, ti serbesti
Eşti doşî tewre û girbesti
Dorîyê awdoyo neki hesti
Ez merda nê qûlî dest di

Pêla berda teşti merda
Ez no ca di gest di merda
Ne lordî, ne xemgînî berda
Ser û bin û tewro derda

Ti şîya aver, ez peyanver
Serqotî! Ez kotî, ti kotî?
Ti nanwera nan û ronî
Mi esteyê şaldê to kotî

Wazena bê ma bêre pêver
Ma rindeyrê akere gever
Birepisnê ger bikerê geber
Îşte xeberokî ardi xêrxeber

Xeberdana xeyrî tîya
Derd û çareyê ma tîya
Mijdîyana xwubi maro ki
Megeyrî canakî, naya tîya

Tîya û ûja û ata û nata
Xeyr û nebxejr a sehata
Weş û xrabo ma bînata
Tew ma mendîy pîya pata

Ay va çeki na pêçeki
A do girdi bo bibo hêçeki
Nîşana vernîya na qeçeki
Fesilîyaya ze qenabçeki

Na rindeki, na rebeneki
Şêligîrê bîya weşzîyareki
Weşzîyareka bimbareki
Bimbareka weştebareki

04/05/2011 Suwêreg'i



Bi Thomas Ripper re li ser Merwaniyan

HEVPEYVÎN: ABDULLAH ÎNCEKAN

aincekan@gmail.com

Li cîhanê kême netewe hene ku li hebûna xwe xwedî dernakevin. Li cem van qewman tu qedr û qîmeta çand, huner, ziman û sembolên neteweyî yê wan tune. Qewmên bi vî terhî xwe li sembol, ziman û çanda gelên serdest digrin; ji bo wan tarîx, folklor, muzîk û her tiştên ku qewmekî dike qewm bême'ne ne û loma jî ew bi gelemperî li van hebûnên xwe xwedî dernakevin.

Ku meriv li gelê Kurd mêze dike, meriv dibîne ku ev nexweşiya han di wîcûda wan de bûye kangren û em dikin-nakin xwe ji vê nexweşiyê xelas nakin û loma jî em yek ji belengaztirîn gel in li ser rûyê erdê. Herçiqas ku di salên dawîn de pêşveçûnên baş hebin jî, lê bixwehesandineke bi gişkî hê çênebûye û em -mîna zaroka teze hîne rêveçûnê dibebi gavên piçûk ji folklor, ziman, edebiyat, tarîx û coğrafyaya xwe haydar dibin.

Rojhilatnas û zanayên biyanî

Di vê karê xwenasîne de em dibînin ku rojhilatnas û zanayên

biyanî xwedî xîreteke mezin in û karê wan hêjayî pesnê ye. Di vê hêlê de tê xuyakirin ku gamera ewil ji hêla merivekî bi navê Garzonî hatiye nivîsîn, xebatên ewil yê li ser serîhildana Şêx Seîdê rehetî ji qelema Martin van Bruinessen û Robert Olson e, xebata ewil ya li ser Komara Mehabadê W. Eaglaton nivîsiye... Em dikarin dûr û dirêj behsa ked û xebata biyanîyan a li ser Kurdolojiyê û dîsîplînên nêzikî wê bikin. Lê mexseda min ne ev e... Bi van mîsalan ez tenê dixwazim nîşan bidim ku eger em wek gel "li xwe xwedî derketibana", emê îro di qonaxeke din de ban. Bi qasî ku biyanî "bi me re mijûl bûne, em bi xwe re mijûl nebûne".

Di dîroka me de gelek mijar hene ku em pê baş nizanin. Kar û xebatên danasîna wan di nav gel de kême in û bi vî şiklî em xiyaretê li tarîx û hebûna xwe dikin. Yek ji van mijaran jî mîrekiya Merwaniyan e.

Merwanî di tarîxa me de rûpeleke zêrîn e û divê em wan nas bikin û bidin naskirin. Her-

Yek ji pisporên tarîxa Merwaniyan Thomas Ripperê Alman e ku li ser vê mîrekiyê li Almanyayê xebata doktorayê kiriye.


Camêr bi qasî deh salan di kitûbxaneyên cihê cihê de geriyaye

çiças ku li Tirkîyeyê li ser Merwaniyan kêr xebat hebin jî, di cîhanê de li ser wan gelek xebat çêbûne û kar û barê dezgeh û weşanxaneyên Kurdan e ku van xebatan bigihînin me.

Yek ji pisporên tarîxa Merwaniyan Thomas Ripperê Alman e ku li ser vê mîrektiyê li Almanyayê xebata doktorayê kiriye. Camêr bi qasî deh salan di kitûbxaneyên cihê cihê de geriyaye û hemû agahiyên bi şiklekî têkiliya wan bi Merwaniyan ve heye, peyda kiriye û di xebata xwe de cî dayê. Ev xebata han niha bi çapa diduyan li ber destê xwendevanan e. Gava min ev xebat dît, min him ew û him jî nivîskarê wê gelek meraq kir û herçiças zehmet be jî, bi Thomas Ripper re hevpeyvînek kir û ew wergerand Kurdî.

Wekî ku xwendevanên jêhatî bibînin, zimanê hevpeyvînê zimanekî ne ji rêzê ye; cumleyên Thomas Ripper dirêj in û dawî li wan nayê. Hêjayî gotinê ye, ev terz û uslub di nav Almanan de gelek belav e û ew wek yek ji xisûsiyetên xebata ilmî û biserketî tê qebûlîkirin. Di wergera hevpeyvînê de min xwest ez vê cureyê xweîfadekirinê biparêzim. Ku heke hin cumle neyên fêmkirin, ji vê ye. **Va ye hevpeyvîn...**

-Birêz Ripper, ez dilşad im ku bi we re li ser mijara Merwaniyan hevpeyvînekê çêdikim. Ez dixwazim ji vir dest pê bikim: Zanebûna li Almanyayê li ser Kurdan gelekî kêr e. Gava meriv behsa Kurdan dike, yan kîtaba Karl May ya bi navê "Kurdîstana Wehş" yan jî Kurdên ku di salên 90î de di oto-



Thomas Ripper

banan de rê li ber xelkê digirtin, tê bîra mirovan. Di vê çarçoveyê de berî her tiştî ez vê meraq dikim: Bi we re fikra xebata li ser Merwaniyan çawa çêbû?

-Ji ber ku meraqa min li ser tarîxa herêma Îslamî heye, ez bi mîrektiyên Kurdan yê kevn jî hesiyam. Min meraq kir, ka îdareya otonom ya mîr û axayên Kurdan li herêmê ji hêla huner, avahiyên giştî, siyaseta îskanê bi çi terhî tesîr kirine. Min xwest ez bersiva van pirsan bibînim.

-Êêê.... We kîjan cewab ji van pirsan re dîtî? Surprîz hebûn?

-Ji hêlekê ve întibaya min ew e ku di demên aboriyeke xirab, hiqûqeke nediyar û îstismareke bêkontrol de serxwebûna herêmî li coxrafyaya xelîfatê îmkan da pêşdeçûna aborî. Ji hêla din, bi min wisa xuya dibe ku îdareya bi ihtiyad ya navendî ya sultanê Selçûkan Melik Şah karîbûye

avantajên împaratoriyeke mezin ji bo xwe bi kar bîne: Nebûna gumrukê û şerê li ser sinoran di nav hidûdê împaratoriyeke de, parastineke bi rêk û pêk li hember dijminên derve û derfeta yekrêzkirina problemên aborî li hin herêman.

Zimanê helbestê yê di Qesrên Merwaniyan de

-Ji aliyê çavkaniyan ve rewş çawa bû? Lêkolîna li ser vê meseleyê zehmet nebû?

-Zimanê serdema navîn yê herêma Îslamî tabîî kî Erebi ye. Hetta di serayên Merwaniyan de jî zimanê şîrê, bi qasî ku hatiye rîwayetkirin, Erebi bûye. Bi şoreşa Ebbasiyan re ji salên 750î pê ve misilmanên ne Erebi yê Împaratoriyeke jî wekhevînek bi şervanên Erebi ve bi dest xistin. Me'mûrên îdareyê, yê ji kevneşopiya dewlemend ya çanda

Îranê dihatin, êdî kariyer dikirin û mewkiyên gelek bilind bi dest dixistin. Ji ber vê jî kêmi kêmi Farisî jî di sedsala 11ê, yanê di dema Merwaniyan de, wek zimanê dudiyar yê cîhana Îslamî tê bikaranîn. Li hember vê, zimanê Kurdî ji ber devûdoreke koçberî nikarîbû li cîhana Îslamê bibe zimanekî din yê edebiyatê. Ji ber vê jî çavkanî bi pirranî bi Erebî û qismeke piçûk jî ji wan bi Farisî ne.

-Çavkaniyên we bi dest xistin, ji bo ku hûn Merwaniyan nas bikin têr dikirin?

-Ji ber hebûna xurtiya dezgehên îdarî û bi vê re jî girêdayî ji ber gulvedana çanda nivîskî ya wê demê li Rojhilata Navîn, gelek materyal hatine neqilkirin ku di heqê jiyana mîrektiya Merwaniyan de fikreke gelek baş didin me. Lê dîsa jî tesbît û agahiyên lêkolînerên din yê nû derdikevin holê hene ku ez di malpera xwe "Dokumente zur Geschichte der Kurden" de (Dokumentên li ser dîroka Kurdan) cih didimê.

-Di lêkolîna vê mijarê de kîjan astengî derketin pêşiya we?

-Ji ber ku min dixwest ez hemû xalên bi hebûna mîrektiyeye Kurd ya otonom re eleqedar in tesbît bikim, talûkeya ku ez di nav xebatê de wenda bibim, hebû. Mesela ez di waqayînameyan de li wê geriyam ka behsa neteweya hin kesan dibe yan na. Yan jî ez li bûyînên tabîatê (lehî, erdhej, hişkesalî) û gotinên talî hatine gotin ku di heqê civat, aborî, çandê malûmatan didin, geriyam.

-Gava meriv behsa Merwaniyan dike, meriv diçe kîjan herêmê?

"Ji ber ku min dixwest ez hemû xalên bi hebûna mîrektiyeye Kurd ya otonom re eleqedar in tesbît bikim, talûkeya ku ez di nav xebatê de wenda bibim, hebû"

-Herêma ku di bin kontrola Merwaniyan de bû, herêma Diyar Bekrê bû (bi Erebî: Welatê eşîra Erebên başûr ya bi navê Bakr ku di qirnê 7an de di çarçoveya fetha Îslamî de li wir bi cî û war bibûn). Yanê îro herêma Kurdên Tirkîyeyê.

Mîrektiya Merwaniyan ji eşîra Kurd ya bi navê Xarbutî/Xarbohtî derketiye. Ew ne di binê navê avakirê mîrektiyê, Bad Îbn Dûstak de hatiye naskirin; ew bi navê aşvan/qeraş Merwan hatiye naskirin ku bi xuşka Bad re zewiciye û sê kurên wî li dû hev ketine şûna Bad. Dîrokzan Îbn al-Atir dibêje ku Bad, beriya bibe hukimdar, şivantî kiriye. Herçiqaş ku ew xizan bûye, wî dîsa jî pezên xwe qurbanî xelkê kiriye, ji bo ku yê din tiştêkî ji bo xwarinê bibînin. Loma jî qedr û qîmetê wî her çûye zêde bûye û gelean xwe lê girtine, wî bi dû re wek serkeleşê çeteyekê kar kiriye. Di vê demê de Bad tenê li herêma Xerzanê aktîf bûye.

Dîrokzan Sibî Îbn al-Cewzî û Îbn al-Azraq di heqê kurên Merwan de dinivîsin ku ew hukimdarê Kurmaşê bûne. Her yekî ji wan serleşkerê bûye û bavê wan, Merwan jî xwediye aşekî bûye. Bi vî awayî hukimdar Bad, yê ku ji nava gel derdikeve, bi zewaca xuşka Merwan re

dikeve nava malbateke bi qedr û qîmet. Bi ihtimaleke mezin vê qedr û qîmeta malbata Merwan îmkân daye ku li dû mirina Bad di nava Kurdan de lawên Merwan wek hukimdar bêne qebûlkirin. Bi vî awayî ev mîrektî bi navê malbata/binemala Merwan, ya bi tesîr, hatiye naskirin; ne bi navê Bad.

-Em di skala demê de diçin kîjan dewrê?

-Merwaniyan di sedsala 11an de, yanê di dema "showdown" a (şer/ceng?) (Tirkî güç gösterisi) Bîzans û Tirkan ya Milazgirê de hukim kirine. Yanê ew şer li ber sinorê herêma Merwaniyan çêbû. Lê koçberên biserketî yê Tirk di binê rêberiya Selçûkan de çûn rojava û Anatolyaya Navîn.

Merwanî di navbera Eşîrên Ereb û Tirk de dimînin û têne felîşandin


-Merwaniyan di vî şerî de ro-leke çawa lîstin?

-Ji ber ku Sultanên Selçûkiyan tevî vazalên xwe yê li Mezopotamyayê lê geriyabûn ku rêya koçberên Tirk ji herêma xwe dûr bigrin û wan ber bi Anatolyaya Xrîstiyar ve bişînin, Diyar Bekr ji talankirinê hate parastin. Bi qabiliyeteke baş ya dîplomatîk Merwaniyan ziraeta li mîrektiya xwe parastin - digel xirabbûna devûdorên wan yê Xrîstiyar.

-Fîgurên sereke yê mîrektiya Merwaniyan kî ne?

-Di kronolojiyên Îslamî de gelek caran mîrê Merwanî, Mîr Nasr ed-Dewle, wek

**“Di binê hukimê
Nasr ed-Dewle de
neteweyên wek Kurd,
Ermenî yan jî Suryanî
dikarîbûn bibin
xwedyê tesîra
polîtîk û kultura xwe
pêşde bixin”**



qiralekî Kurd ji “Çîrokên Hezar û Şevkê” tê tarîfkirin. Wî ji 401 heta 453yê hicrî (mîladî: 1010/1011 heta 1061) hukim kiriye û ew ji aliyê hukimdarên mezin yê cînar wek Merwanîyê 1ê ku wek mîrê Diyar Bekrê hatiye qebûl kirin. Serkeftina wî aştî, aboriyeke pêşdeçûyî û pêşvebirina çandê ye.

-Nasr ed-Dewle merivekî çawa bû? Hûn çawa dikarin wî terîf bikin?

-Elbet ew ne keşîşek bû, lê ew merivekî ewqas ji dil bû ku wî li welatê xwe parastina heywanan jî dikir.

Bi saya têkiliyên malbatî bi mîrên piçûk yê devûdorê re wî îttifaqeke herêmî û sistematîk ava kir. Bi vî şiklî wî çareser kirina îxtilafan bi rêya muzakere û lihevhatinê hêsan kir û serxwebûna xwe li hember çespên hegemonîk yê ji derve zexm kir. Dewlemendiya ku wî bi dest xistin ji bilî parastinê (bi avakirina sûrên li dora bajêr), avakirina rê û pireyan û başkirina bidestxistina avê (bi avakirina kanalîzasyonan li bajêr, sistêmên avê) ne.

Endûstriya wê demê ji çêkirina tekstîlê pêk dihat—li Meyafarqînê (îro Silîva) hevrişim û li Amîdê (îro Diyarbekir) cawê keten bû. Lê dewlemendiya aborî ya Meyafarqîn û Amîdê deyndarê cihê xwe ye ku li ser rêya bazirganiya navneteweyî ye. Rêya di nava Azerbeycan û Sûriyeyê ku heciyên ji Îranê bi kar dianîn, di ser Exlatê re derbasî Diyar Bekrê dibe (seyyahê dema Nasr ed-Dewle, Nasirê Xosrow di Şerefnameya xwe de bi berfirehî behsa vê rêya hanê dike).

Her wiha, rola bajarê Meyafarqînê jî mezin dibû. Di kendalê ava/çemê Bedlîsê re him ew rêya ji Exlatê diçe Meyafarqînê, him jî ya ji Dicleyê ber bi Ermenîstanê û Behra Reş diçe, derbas dibûn.

Di binê hukimê Nasr ed-Dewle de neteweyên wek Kurd, Ermenî yan jî Suryanî dikarîbûn bibin xwedyê tesîra polîtîk û kultura xwe pêşde bixin. Meyafarqîn bû navenda alim, edîb, şaîr, dengbêj, mûzîsyen, astrolog û hekîman. Gelê ji rêzê jî ji piştgiriya ilim û perwerdeyê

îstifade kir, ji ber ku pirtûkxane û li Meyafarqînê nexweşxaneyek (di sala 414/1023-1024 ji aliyê Mîr Nasr ed-Dewle) hatin avakirin.

-Mîrektiya Merwanîyan çi qas Kurd bû?

-Mîrektî, vazalên wan û şervan di waqayînameyan de wek Kurd tî nîşandan û Kurdbûna wan mesela di nav arîstokratên şervan yê Ereb de dibe sebebê gengeşiyên. Lê di çavkaniyan de min nikarîbû tespît bikim, ka şexsiyetên ji dîwana Merwanîyan bi zanebûn Kurdbûna xwe dane pêş yan na.

Bi ihtimaleke mezin mirovan xwe li gorî tebeqeya xwe, xwe tesnîf kirine. Mesela serhildana 1092-1093yan ya Meyafarqînê, dikare wek pro-kurd û antî-tirk were dîtîn, lê gava meriv di çarçoveyê mezin de li serhildanên Marw, Nişapur û Helebê mêze dike, meriv dibîne ku hemû serhildan, mîna Meyafarqînê, ji nava gelê ji rêzê (aubaş, eyar, exdat) dertê û arîstokratên bajêr (wucuh) xwe li Selçûkiyan digirin.

Dersê didî xwendekaran
Xizan û feqîr û jaran
Dibî gula destê yaran
Kelemê çavê neyaran

Ji zarokan pir hez dikî
Bo hîn bibin tu lez dikî
Hundirê te hevdu dixwe
Ji kerba lêvan gez dikî

Kar dikî li dibistanê
Bihar, payîz, zivistanê
Ji nav mirovan tu bûyî
Dergevanê gulistanê

Ev doza pêxemberan e
Xwendekarê te bira ne
Bi xwendinê dikevin pêş
Dibin mînanî çiran e

Mamoste yekî dilsoz e
Dike karekî pîroz e
Perwerdehiya mirovan
Ji xwe re kiriye doz e


Tu mîna dayik û bavan
Şemal didî wekî tavan
Xwedê alîkarê te be
Mamostê min malî ava

Rawestîne tu nizanî
Hînkirinê baş dizanî
Wek bilbilê li gulistan
Stranbêjî xweş hozanî

Tu zana yî hunermend î
Geh li bajar geh li gund î
Wek şêran karê xwe dikî
Tu hêja yî, serbilind î

Tu bi sebr î bi sebat î
Tu bi ked î bi xebat î
Qevd qevd gulan pêşkêş dikim
Tu ser ser û çavan hatî

Mamostê min, mamostê min
Tu dilşa bibî dostê min



Serhildanên Merwaniyan ên salên 1092-1093yê pro-kurd û antî-tirk in

-Dostên Merwaniyan kî bûn, dijminên wan kî bûn?

-Hebûna mîrektiyên Kurdên wê demê bi wê ve girêdayî bûye ku wan di navbera sê împaratoriyan bi hev re di reqabetê de (xelîfetiya Fatimî û Ebbasiyan tevî Bîzans) bûn cî digirtin. Xisûsiyeta siyaseta Merwaniyan ew bû ku ew bi her sê hêzan re di tîkiliyê gelekî baş ya dîplomatîk de bûn.

Hevrikên talûke ji bo Merwaniyan şervanên kevn ên Erebên Diyar Bekrê bûn û bi dû re jî şervanên Tirk ên hatin vê coğrafyayê bûn.

Dagirkerên Ereb ên dema pêşîn ya Îslamî koçber bûn û bi vî hawî jî rasterast raqîbên Kurdan bûn – mîna eşîrên Tirkan yê bi dû re hatin.

-Sebebê şikestina Merwaniyan çi bû?

-Bi koça Tirkan û îstîlaya Selçûkan mîzana di nav hêzên herêmê de ya ku Merwanî diparast hilweşiya. Merwanî dikarîbûn wek vazalên Selçûkan hebûna xwe dom bikin, lê Diyar Bekra dewlemend di nav herêma Bîzansiyan de ku ji ber diziyê û şer talan bûbû, cazîbeyeke mezin bû. Loma jî sultanê Selçûkiyan li gorî daxwaza serleşkerên xwe tevgeriya û herêma Merwaniyan li wan parve kir. ●

Berriya Mêrdînê û Qaçaxî

KONÊ REŞ

Dema nivîsandina vê gotarê min bi piranî hêviyên xwe berdan ser bîra xwe a zaroktiyê, serwextiya xwe a niha û bîra hinek kalemêrên ku di nav bûyerên qaçaxê de bûn. Û bi wê zanebûna xwe a ezber û wek dîdevanê (şahidê) demekê a dîroka me Kurdên Binxetê, min beşek ji rastiya têkilî û pêwendiyên qedexe û qaçaxiya bi xwîn a ku di navbera xelkên me yên Serxet û Binxetê de dibû, daniye ber çavan û ji xwendevanên zimanê Kurdî re pêşkêşî dikim.

Di zaroktiyê de, bi bîrbûn û naskirina derdora xwe re, ji min re hat diyarkirin ku gundê min Doda li ser sînore; sînore bi mayîn û têldiryanan pêçayî ye, qedexe ye ku em nêzîkî sînore û herdu şivên hesin bibin. Mezinan ji me re digotin; nêzîkî sînore û xeta hesin nebin, wê cendirmeyên Tirkan fişekan berdin we, we bikujin û wê mayîn bi we de biteqin. Trêna nas kir pê re bi tîrsa teqîna mayînan xewa şevan diherimî.

Erê di wê bîreweriya biçûkanî de, min trêna nas kir, ew trêna ku xeta wê di serê erdê me re

derbas dibû. Hingê mezinan em ditirsandin û ji me re digotin; dûrî trêna kevin. Dema trêna bê, xwe bidin paş, bayê wê mirov bi alî xwe de dikişîne û mirov di nav badokên lingê xwe de diperçiqîne. Ew trêna ji ku dihat, diçû ku me nizanîbû. Di wê zaroktiyê de, çendî min dixwest, ez jî rojekê li wê trêna siwar bim û wek rêviyên wê li dinyayê bigerim û bibînim. Car caran bi dizî, di hundirê besta Zorava re an besta Zixur re, min xwe digihand bin pira Zorava an Çûva, di ber û hesinê pirê de diponijîm û min ji xwe re digot; ji aliyê kê, kengî û çilo û çawa ev pira ha hatiye çêkirin. Çima ev sînore bi mayîn di nav me û mirovên me yên Serxetê de hatiye danîn ku ne em dikarin herin bal wan û ne jî ew karin bêne rex me? Qet min nizanîbû ku ew pir Almanan di sala 1917an de çêkiriye û ew xeta trêna, Berlînê bi Bexdayê ve girêdide.

Di wê heyamê de jî, hin caran ji xew şiyar dibûm, min didît ku hewşa me tijî pez û dewar in û ode ji mêvanan dagirtiye


Di sala 1916an de,
bi danîna sînore û
bicîkirina qereqolên
leşkerî yên Tirkan
di seranserî sînore
Sûriyê û Tirkiyê de,
ew pêwendiyên
Serxetiyên û
Binxetiyên qels
û lawaz bûn; her
malek bû du mal,
yek li Serxetê û yek li
Binxetê

ji xelkên xerîb. Min ji diya xwe dipirsî ev kî ne? Li min vedigerand û digot; huş e, te çî ji waye, mêvan in. Hingî min nas dikir ku Serxetî ne. Gelek caran wan mêvanan mewîj, bastêq, helîl û nokên daxlî ji me re dianîn. Di wan rojên mêvanan de, ez û birayê xwe di nav kar û barên malê de diwestiyan. Gelek şevan jî xew li me diherimî, ji ber qupîna tivingên ku heta berê sibehê dom dikirin, nexasim ku me dengê teqîna mayînekê bibihîsta, hingê xew û tebat li bavê min nedibûn mêvan, cixare di pey cixarê re vedixwar/dikişand, heta ku dibû sibe û di ber xwe de digot; gelo kî ye evê ku mayîn pê de teqyaye? Hatiye kuştin an birîndar e?

Ji destpêka çerxê 20an, heta berî ku sînor bi mayîn û teldiryanan di navbera Sûriyê û Tirkîyê de bê danîn û pêçan, çûn û hatina Serxet û Binxetê hêsan bû Xelkên Berriya Mêrdînê ji sûka bajarê Mêrdînê bêthir ji sûka bajarê Mûsilê, lazimî û alavên xwe yên malê dikirîn. Ji kevin ve Berriya Mêrdînê bi van herdu bajaran ve girêdayî

bû. Hingî Nisêbîn wek gundekî bû, bi tenê çend aşên avê lê mabûn. Û gelek caran ji etar û bazirganên Mêrdînê, ewên ku li Berriya Mêrdînê, gund bi gund digeriyan, lazimiyên xwe pêk dianîn. Jixwe xelkên gundên Berriya Mêrdînê ervanên/ardên xwe dibirin aşên Mêrdînê, Darê û Nisêbînê hûr dikirin/dihêrandin. Piştî mirina Ibrahîm Paşayê Millî di sala 1908an de, peymanî Saykis-Beko di sala 1916an de, bi danîna sînor û bicîkirina qereqolên leşkerî yên Tirkîyan di seranserî sînorê Sûriyê û Tirkîyê de, ew pêwendiyên Serxetîyan û Binxetîyan qels û lawaz bûn; her eşîrek bû du eşîr, her malek bû du mal, yek li Serxetê û yek li Binxetê û wiha bira ji bira, xal ji xwarzê, ap ji birazê qut bûn. Lê gelê Kurd yê ku bi vîn û îradeya xwe a ku ji kevir hişktir e, bi vê plana her du dewletan nehat kedîkirin, bi tev şeweyên berxwedanê hewl da ku pêwendiyên herdu rexên xetê ji hev qut nebin û wiha dest bi rêkên qedexê kir. Lê sed mixabin, ji encamên wan rêkan bi hezaran ji neferên gelê Kurd

bi mayîn û guleyên cendirmên Tirkîyan hatin kuştin, ji bilî yên ku lingekî wî an du lingên wî hatin jêkirin. Berî çandina mayînan Mêrdînîyan xwê û sabûna xwe ji Qamişlo dianî. Wek ku min got, berî ku mayîn bêne danîn, xelkên Berriya Mêrdînê, lazimiyên xwe yên malê wek cil, caw û pêlavan, alavên cotkirinê wek; halet, gîsin, das, kurtan, melhêb, misas, hevsar, sing, tekelen Ereban û alavên malê yên din wek; zembîl, mekeb, kevçiyên darî, misînên sifir, hesik û firaxên xwarinê yên têvel... hem jî beşt, mircaq, komir û mewîj, bastêq, nokên daxlî, hejîr, helîl û hwd. ji etar û bazirganên Mêrdînê dikirîn. Ew etarên ku ev malê xwe bi rêkên qedexê û bertîlkirina leşkerên Tirkîyan yên ku zêrevaniya sînor dikirin, derbasî bazara (sûka) Amûdê û Qamişlo dikirin û difirotin xelkê. Lê bi danîna mayînan re, rê ji ber derbasbûna van lazimiyên rojane yên xelkên Berriya Mêrdînê hat birîn. Û bi demê re ew rêkên çûn û hatinê bûn qedexê û qaçaxiyê wiha dest pê kir. Qaçaxî çî ye, di jiyana



Serxetî û Binxetiyân de cihê vê diyardeyê Qaçax ew malê ku li Sûriyê heye, li Tirkîyê nîne û bi dizî derbasî Tirkîyê dibe û vajî vê yekê, an ku ew mal e yê ku ne bi regekî fermî ji dewletekê derbasî dewleteke din dibe. Qaçaxçî ew mirov in ku wî malî bi dizî, bê destûra dewletê derbasî dewleteke din didin. Rêber; ew kesên ku rê şanî qaçaxçiyân dikin.

Bi danîna mayînan re qaçaxçî di Doda de jî dest pê kir û qaçaxçî û rêberên qaçaxçiyân çêbûn.

Qaçaxiya ku di gundê min Doda re dibû, mîna qaçaxiya tevayî gundên Berriya Mêrdînê yê di ber sînor de bû. Ew mayînen ku di sala 1958an de li seranserî sînor hatibûn çandin û guleyên cendirmên Tirkan yê kujek, nikarîbûn hêza pêwendî û berdewamiya têkiliyên Serxetiyân û Binxetiyân qut bikin û bimirînin; nikarîbûn xal ji xwarzî, ap ji birazî bi dûr bixînin. Vêca çûn û hatina qedexe dest pê kir, bi wê çûn û hatinê re jî qaçaxiyê serê xwe hilda.

Doda gundekî ava û sînorî ye, di navbera du bestan û du pirên ku trê di ser wan re derbas dibe hatiye avakirin. Di wê heyamê de Doda navenda van gundên derdora xwe bû; Xerabkortê, Gundik û Tilkêfê. Qereqola wê di sala 1948an de hatibû avakirin, piraniya xelkên van her çar gundên Binxetî û xelkên van gundên Serxetê yê hemberî wan; Qesra (Qesra Serçixan), Çûva, Menderê, Zorava, Sirêçkê, Sarincê mirov û xizm û karên hev bûn. Erê heta berî danîna mayînan pêwendî,

ez ji Berlînê

Selîm Temo

ez ji Berlînê dinivîsim kurê min
li sînorê du ewrên zelal ku dipalîn wekî nedîtîyan
li otêla asîmanî wênayê agirekî kor
digindire li pey şopa maran
yek bi şaşîtî li deriyê min ku derî è min be dide û
uzrê xwe dixwaze bi sê zimanî
û bayê li çeman şuştî liba dibe li ber şibaka min

bajêr wekî meşkeke çelqilî çelqilî çelqilî
hinarikên te hatin bi milên min girtin birin
li ser kulîlkên bi tavê reng nedane danîn
li ser çekên zengarî firûya tenêti
min ne warek heye ne bajarek ne lîsek
ji bilî dengê te çi fikarek

wa ye sibehê anîn stêrkên li pişt ewran veşartî
ez rabim şeraba mayî birêjim
bi ser kulên nûhatî ve
ku birîsim kesera derketiyekî

çûn û hatina xelkên van gundan ji herdu rexên xetê ve hêsan bû, lê bi danîna mayînan re ew derfeta têkilî û pêwendiyên ji ber wan hat birin. Vêca ji neçarî berê xwe dan hevdiştin û pêwendiyên qedexe û wiha çûn û hatina di nav mayînan re, bi bertilkirina cendirmên sînor dest pê kir. Cara pêşîn hatin û çûyîna qedexe di nav gundên Serxetê û Binxetê de ji gundê Qesra (Serçixan), yê Serxetê û gundê Gundik û Tilkêfê yê Binxetê dest pê kir. Nexasim ku xelkên van her sê gundan bira û pismamên hev bûn. Hem jî ku Qesra li ser her du şivên hesin bû, rawestgeha trêne (Îstasyon) lê hebû û mayîniyê nebûn, bi tenê têldiryan hebûn û bi sînorê Binxetê ve bû. Ji ber çûn

û hatin di nav erdên Tikêfyan û Gundikyan re bû, wana rêberriya qaçaxçiyân li Binxetê dikirin û nedihîştin kesî din bike. Ji rêberên Tilkêfê; Mihemedê Elîka, Salihê Izzet û hin mirovên wan yê din hebûn. Ji rêberên Gundikê Ehmê; Brehîmê Çelebî, Ismailê Çelebî û Selîmê Şekir ji Gundikê Şekir bû. Van kesan, bi razîbûna leşkerên Qereqola Doda, xelk derbasî vî aliyê xetê û wî alî dikirin, rêberên Qesriyan jî ku mirovên wan bûn, wan jî cendirmeyên xwe bi pera razî dikirin û xelk derbas dikirin. Dodayî jî çav li wan ketin, dîtîni ku karê rêberriya qaçaxçiyân ji karê danheva keviran ku ew ko kiribûn hêsantir û bi sûdetir e, vêca wan çend malên melakên gund xwe

dan hev û destê xwe danîn ser rêka qaçaxê a besta Zixur, ewa ku Seyid Şerîf û Şêxmûsê Ibrahîmê Ehmedko ji gundê Xerabkortê bi xelkên gundê Çûva yê Serxetê re dikirin. Û wiha rêka qaçaxiyê ji destê Xerabkortiyên ket destê Dodayan de, bi têkilî, bi mirovên wan yên li gundê Çûva (Serxetê) û razîbûna leşkerên qereqola Doda. Û van kesan rêberiya qaçaxên di nav Doda û Çûva de dikirin: Evdilhemîdê Melek, Silo Gilot, Hisênê Aliya, Hisênê Mencê, Şîkrî Ezîz, Cemîlê Gedo û Xelîlê Hecî.

Mafê derbasbûna siwarî tevî bar 50 LS, nefer 20 LS, dewar 10 LS û pez 5 LS bû. (LS, Lîreya Sûrî) Xizmên ji bo palehiyê dihatin û yên diçûn Beyrûdê sînor dibezandin kî bûn yên ku diçûn û dihatin? Mirov dikare wan li sê beşan parve bike; yek jê xelkên wan gundên Serxetê û Binxetê bûn, ewên ku gundên wan bi ber sînor ve bûn û mirovên hev bûn; an ku xweh û bira bûn, ap û birazî bûn, xal û xwarzî bûn, ji bo têkilî û hevdîtîne diçûn û dihatin gel hev. Yê din ew kesên ku di werzê havînan, werzê çinîna dexlan de ji çiyayê Omeriyên an ji Tora Mihelmiyan dihatin li Berriya Mêrdînê paleyî dikirin û dizîvirîn gundên xwe û beşek ji wan, bo kar û xebatê di Sûriyê re derbasî Beyrûtê dibûn. Beşek din hebû, erê navê wan derketibû qaçaxçiyê, lê ew bi xwe rêber bûn, rêberiya qaçaxçiyên mezin dikirin, mayîn radîkirin û ew derbasî vî alî û wî aliyê xetê dikirin. Mebesta min jê, rêberên wan siwariyên ku ji Xurs û Licê tûtin û malê qaçax dianîn û di gundê Qibûrelfazil, yê Silêmanê Botî re dibirin heta bi çiyayê Şingalê...

Mirov nikare di ser navê wan re derbas bibe, li bareşî Qamişlo ev na bi qaçaxiya xwe navdar bûn: Muradê Sêvê (Di sala 1976an de bi mayînekê li sînorê Amûdê hat kuştin), Fewziyo, Omerê Şernexî, Selîm, Çibîro, Aydîn, Ishano. Li Hilêliyê Izzeddînê Mihemed Seîdkê, Salim, Mihemed Emînê Batûşî. Li Amûdê Ebdilwehabê Reşwanî, Cemîlê Hemenê, Ibrahîmê Bilalo, Xelîlê Qorê, Şêxê Eysokê, Sebriyê Elo, Bêrtî, Reşîdo, Ferecê Şêxo Koro.

Di salên 1961-63ê de bo hevdîtina Serxetî û Binxetiyên pêleke nû. Salên 1961-62-63ê de, rola qaçaxan ku di gundên ber sînor re dibû qube û mezin bû, leşkerên Sûriyê û cendirmên Tirkîyê bertil dixwarin û yê bihata kuştin û birîndarkirin an girtin û zindankirin ji kîsê xwe diçû. Di encamê de gelek zarok sêwî diman, lingê gelek zilaman jê dibû û derfêkê gelek dihat girtin. Di eynî wan salan de, şoreşa Barzaniyê nemir li başûrê welat li dar bû, 49 rewşenbîrên Kurd li Bakurê welat di zindanê de bûn û li rojava piraniya endamên Partî di gel Dr. Nûreddîn Zaza û apo Osman Sebrî di zindanê de bûn, vêca ji tîrsa ku Kurd bi raperîneke mezin di Kurdistanê de rabin, hikûmeta Tirkîyê neçar bû ku bêhnvedanekê bide Kurdan û kela dilê wan hinekî sar bike. Navê wê bêhnvedanê "Gorişme" bû, an ku hevdîtina Serxetiyên û Binxetiyên a li ser sînor bû. Ew hevdîtîna (gorişme) di rojên cejnan de li gundê Qesra (Serçixan), di rawestgeha (Îstasyon) wê de pêk dihat. Êvara cejnê mala me tijî mêvan dibû, ji bajarê Heseke û gundên beriya Mêrdînê dihatin, da ku sibeha

cejnê karibin çav bi mirovên xwe yên Serxetê kevin. Dema ku li îstasyona Qesra Serçixan dibû "gorişme", dengê xelkên vî alî têtê û wî alî têtê digiha esmanan; bang hev dikirin, bi hev re dikeniyên û hin bi hev diaxivîn û digiriyên.. Wê gorişmê çend salekê dirêj kir û betal bû.

Hêjaye gotinê, ku di eynî wan salan de hin kesên welatparêz hebûn, bi emrê Partiya Demokratî Kurdî li Sûriyê mayîn radîkirin an ji qaçaxçiyên ku mayîn radîkirin didan hev û ji şoreşa Barzaniyê nemir re dibirin, wek; Oskê Zaxuranî, Letîfê Şêkir ji gundê Letîfiyê, Reşê ji gundê Sêgirkan, Mehmûdê Hesenka ji gundê Dêrûna Qulingan, Ehmedê Sîno ji gundê Babasiyê û Hisênê Ehmê ji gundê Qesra Serçixan a Bûbilanan. Heta ku vê paşiyê ev mirov bi lédana cendirmên Tirkan hat kuştin. Û Tewfîqê Cizîrî û Sebriyê Eliyê Ehmed. Di gel re jî nameyên Partiya Sûriyê ji Partiya Iraqê re dibirin û didan destê Issa Siwar, Esed Xoşewî û Mirhac.

Ma ne hêja ye ku mirov wek van kesan bi bîr bîne. Hem jî hêjaye ku em bêjin, di wan salan de gelek ji Cihûyên Qamişlo di rêka qaçaxçiyên re derbasî Tirkîyê bûn.

Di dawiyê dibêjim; tevî kuştin, lingjêkirin, girtin û êşkencê, hêza berxwedana hebûn û berdewamiya têkilî û pêwendiyên Serxetî û Binxetiyên ji hêza mayîn û guleyên Tirkan mezin-tir bû. Ez jî bi vê hevoka ku li ser gora apê Mûsa Anter hatiye nivîsandin, "Zilm ne qedere" dawî li vê gotara xwe tînim. ●

Qamişlo, 22.08.2011

Nanê kel

HATÎCE MOLLAKENDÎ

haticemollakendi@hotmail.com

Jinikê bi gef û gurr xwe li derê salona biçûçik da; salona ku berê wê sê gav, dirêjahiya wê pênc gav bû. Pênc gav avêt, derê odê bi zerp vekir. Zincîra derî bi wê zerpê li ser bizmara textê derî ket. Çingînî ji bizmara derî û ji zincîrê hat. Jinik kete odê, ber bi mêrik ve meşiya. Bêhnefişk pê ketibû. Heta jê hat bi ser mêrik de qirînî kir, got:

-Êdî bes e. Ez naxwazim her sibe, her êvar diya te bibînim. Mala me hilde, em biçin bajarekî. Min bibe dûrî diya xwe.

Mêrik ji ciyê ku rûniştibû rabû. A rast ji zû de rabibû. Gava ku derî bi zerp vebû, ew li piyan bû jixwe. Mîna kesekî ku were serê du rêyan, lê nizanibe ka bi kîjan riyê de biçe... Li jina xwe dinihêriya. Di çavên wî de ev xwezî dirijiya: Xwezî wextê ku meriv dibû mêrê jina xwe, meriv bikaribûya lawtiya diya xwe jî bigomanda... Di navbera diya xwe û jina xwe de şeqopîlo bibû. Di nava odê de pêgermokê gerand. Çû serê odê, hat binê odê. Ode tije bi tişt û eşya bû. Ji têkberan meriv nikaribû gav biavêta. Di

ber hinek eşyayan re ku meriv xwe şûlal bikira gavavêtina meriv hêsantir dibû. Li dîwar xalîçeya nûrandî... Di camekanê de qedeh û firaxên rêzkiirî... Betaniyên ku hêj di qilifê xwe de qatkiirî...

Û li ser textê mobilyeyan tentene... Firaqşok hêj di nav koliya xwe de li wir bû. Li ser firaqşokê guleke naylonî a bi sor û kesk hebû. Ev gul, gula destê bûkê bû. Roja dawetê dabûn destê wê. Bi ser kincên bûkantiyê ên spî de pirr xweş dixuya. Spî û sor çiqas bi hev re didane çav, dê ew jî piştî zewacê, piştî ku bi hev re bijiyana, dê ewqas li hev du bihatana... Wisa difikirî roja dawetê, gava ku li bûkê û li gula di destê wê de dinihêriya.

Ev du meh e zewicî bûn...

Dîsa li firaqşoka ku hêj di nav koliyê de ye, nihêrî. Belkî ev firaqşok qet ji nav koliyê dernekeve jî. Lewra firaqê du kesan qasê ku makînekê tije bike di rojê de top nabe. Divê tu sê û çar rojan firaqên qirêj biêxî ser hev, paşî dibe têra makînekê. Firaqên qirêj jî ku te di mal de

Di navbera diya xwe û jina xwe de şeqopîlo bibû. Di nava odê de pêgermokê gerand. Çû serê odê, hat binê odê. Ode tije bi tişt û eşya bû. Ji têkberan meriv nikaribû gav biavêta...

hişt, bêhna genî dixê malê. Ji bo bêhna genî di mal de çênebe, divê meriv firaqên xwe rojane bişo. Ji bo firaqê du kesan, makîne ne hewce ye. Gava ku di pêşiya dawetê de wiha gotibû, pişt re jî domandibû:

-Em firaqokê nekirin. Him ez naqedînim jî...

Jinik xeyidîbû... Gotibû:

-Qey tu mêr nîn î kuro, tu çawa naqedîni?

Li ser vê gotinê çûbû Stenbolê. Ji xwe re karek di înceatê de dîtibû. Ji bo perê firaqşoka ku a niha di nav koliya xwe de ye û ji bo hin tiştên din, bi şev û roj xebitibû.

Ji oda ku tijî eşyayên nû û bi deyn bû, derket. Çû... Çû û li hêwana ku sê gav berê wê û pênc gav dirêjahiya wê ye, rûnişt. Mala wan jixwe bi du çavî bû. Ev hêwan û ev ode tenê bû. Lê tişteke nabe. Bila biçûk be. Ê ne mal ê wan nîne. Kirêya malê jî nadin. Malek wiha li bajaran bi kirê bû. Xizaniya li bajaran dîtibû. Feqîriya li bajaran ji feqîriya gundan diwartir e. Meriv di donê xwe de diqele, diqijile. Mala feqîriyê xira bibe.

Di nava wan xeyal û ramanan de mînderek danî bin serê xwe. Li hêwana biçûk xwe dirêj kir. Ramandina wî didomiya: Ku jina min hinek bi xûpak bûya... Hinek bi dilfireh bûya... Hinek bi dilrehm bûya... Hinek jî hay ji xizaniyê hebûya... Hinek jî qijqijok û pitpito nebûya. Û hinek jî... Ev mal heta mirinê têra me hebû. Ma çi dibe? Heta ku diçim di avakarên Stenbolê de dixebitim, bihayê wê xebata xwe jî distînim û tînim, didim



kirêya malekê mîna xolikan... Heta ku zehf dişixulim, lê heq hindik distînim, ji xwe re li vir bisekinim... Bostanê ber derî jî biçînim. Hildim û danim. Du çêlekan jî xweyî bikim. Ma çi dibe? Him bi vî awayî jî ezê hindik jî biwestim.

Gurrmîniya lingên jinikê ev xiyalên wî belawela kirin. Ku mêrikî gurrmîniya lingên wê seh kir, çavên xwe girtin. Xwe li xew danî. Jinik hat. Mîna elokên nêr xwe gijê ser mêrikî kir. Mînder ji bin serê wî kişand. Got:

-Rabe. Ji te re dibêjim rabe. Ez êdî naxwazim wê pîra diya te bibînim.

Mêrik rabû. Li tindikan rûnişt. Li erdê nihêrî. Mîna ku çavên wî rê bikudîne. Wisa li erdê nihêrî. A rast çavên wî rê nedikudan-din. Demên borî di ber çavên xwe re derbas dikir:

Carek çûbû Stenbolê ji bo xebatê. Bi rastî carek na, pîr caran çûbû. Mîna her caran, carekê dîsa ji xwe re di înceatê de dixebitî. Qûm, av û çimento li nav hev dida. Siwax çêdikir. Fayans rast dikirin. Avahiyên kevin hildiweşandin. Avahiyên ku xilas bibûn diwarê wana siwax dikir. Welhasil hemû tişt ji destan dihat.

Rojekê, siwaxa nava bînayê xelas bû. Dest bi siwaxa derveyî

Bersiva kund û titî

Seyda Ronahî

Rojekê teyr û tûr
 Li hevdu kom bûn
 Ji kund re gotin
 Ê dilê xwe sotin
 Kund got;
 Gotina we re sipas
 Warê min tim xirabe
 Ev nav ji min re miraz...
 Pêşda hat qertel
 Giya nêrî pel...
 Got; çima çavên te wir zer in
 Kund got; Dûr bisekine gişt nezer
 in...
 Baz, gav avêt hate pêş
 Got; çiyê te em kirin gêj
 Bibêje çima serê te gir e
 Kund got; aqilê min pirr e
 Şalûrê jî hat pirsî
 Kund hinekî gurizî

Got; nukilê min çûk e
 Dixwaze mîna te bûk e
 Kete nav peyvê Titî
 Got; bes bipeyvîn êdî
 Rêwiyek li rê ye
 Bi ser we de têye
 Teyr û tûr gişt firriyan
 Li hatina rêwî tirsîyan
 Titî got; tu ji bivîre
 Hîn ku ranehêliye kevire
 Kund go; ji min re ne derd û xem e
 Ez tim li devê riya me
 Ez bifirim ji we re ne oxir e
 Xilaskirina canê we zor e
 Rêwî di dest de kevîr
 Nêzikî li titî kir
 Kevîr avête titî
 Firiya go titî titî.

bînayê kirin. Dîwarê qata sisê-yan siwax dikirin. Rabû ser îskeleyê. Qederek siwax kir. Bê taştê çûbû kar. Birçî bû. Tansiyona wî daket. Reşetarî hat ber çavan. Dewxa wî çû. Û ji jor de, ji ser îskeleyê de ket. Êdî ji wir şûn de nizane ka çî bû.

Gava çavên xwe vekirin, dît ku li nexweşxaneyekê bû. Nihêrî ku milê wî yê rastê bilind nabe. Milê wî heta enîşkê di alçiyê de bû. Li devdorê wî tu kes tune bû. Tiptenê bû. Vê tenêtiya wî ji milê wî zehftir dilê wî êşand. Dilê wî şewitand. Ji bo ku tenêtiya xwe nebîne, çavên xwe girtin. Di ber palikên çavên wî re hêstir paliyan. Balgiya wî şil bû. Qederek pişt re kete xewê. Bîstek derbas bû nebû bi axîna hemşîrekê re çavên xwe vekirin:

-Ax! Înşeatên Stenbolê tev li ser piştê we, bi milên we bilind dibin, ax!

Hemşîreyê seroma wî guherand. Dermanekî bi şiringê berda nava seromê. Rengê seromê guherî. Pişt re li serê pêçikên wî yên di alçiyê de nihêrî. Li kaxiza li ber serê wî hinek tişt nivîsand, îşaret kir. Ji odê derket û çû. Li dû wê derî vekirî ma. Di salona dirêj de bejna wê ya zirav meş li ber çavên meriv şîrîn dikir. Meşiya, bi dûr ket. Li milê çepê fetilî. Êdî jê paş nexuya. Çû.

Ku hemşîre ji ber çavan winda bû, bêhemdê xwe giriya. Pirs di serê wî de civiyan: Çima got 'we'?. 'Em' kî ne? Ew çî dizane ku ez kî me? Madem ew min nas dike, ez çima wê nas nakim? Hemin min nas dikir, çima qet bi min re neaxivî? Hat, karê xwe kir û çû. Çima axîna kişand ji bo min? ...

Li şûna kêlên di milê xwe yê rastê de dinihêrî, gava ku axîna hemşîreyê difikirî. Gava ku rabihûriya xwe diramiya, ji

dahatûya xwe jî ditirsiya.

Jinikê bi qîrîna xwe ew ji nav bîranînên wî, ji nav tirsên wî derxist, got:

-Êêê, tu mala me nabî Stenbolê?

-Ka ez çî dikarim mala me bi bime Stenbolê? Xebata milê min tenê têra avê, ceyranê, xwarinê û vexwarinê nake.

Jinik hêrs bû, bi ser de qîriya dîsa:

-Qey tu mêr nînî? Çawa emega milê te têre nake?

Bi vê qîrîne re bêhna nanê germ hate pozê mêrikî. Bîstek din şûn de riqînî ji derî hat. Diya wî derî vekir, got:

-Bûkê, qîza min ha ji te re. Min nanê teze li tendûrê da. Niha nanê we kartû bûye. Nîvro nanê teze, nanê kel bixwin. Ha ji te re keça min. Kerem kin...●

Di edebiyata nivîskî de rola bajarê û nimûneya Petersburgê

ZILKÎF XWEŞHÊVÎ

Di hemû edebiyatên cîhanê de berî edebiyata nivîskî edebiyata devkî hebûye. Helbest, destan, çîrok û xeberojkên pêşîn ne bi rêya nivîsê, bi rêya gotinê gihîştine nişên paşerojê. Serdema edebiyata devkî teqabûlî serdema jiyana koçerî û gundîtîyê dike. Lê piştî ku mirov bi cî û war bûn li gorî dewra xwe nîsbeten bajarên mezin dameziran-din û dest bi edebiyata nivîskî kirin. Îro dema em behsa edebiyatê dikin piranî em behsa edebiyata nivîskî dikin. Ji ber hindê mirov dikare bibêje ku di navbera nivîs, edebiyat û bajarê de têkiliyeke xurt heye û ev her sê unsur ji hev xwedî dibin.


Dema mirov bala xwe dide edebiyatên pêşketî yên cîhanê derdikeve holê ku xwediyê van edebiyatan di heman demê de xwediyê bajar û navendên girîng in jî. Edebiyata Grekî, ku ji kevintirîn edebiyatên nivîskî yên cîhanê ye, hêza xwe ji bajar-dewletên (polis) Grekî digirt. Edebiyata Latîn, ku edebiyatên Ewrûpayê mîratxurên wê ne, di bajarê Roma ya rewneqdar de serî hilda. Edebiyata Fransî, ku di serdema nûjen de demeke dirêj lokomotîfa edebiyata cîhanê

bû, ji himbêza Parîsê derket. Di sedsala nozdehan de edebiyata biheybet a Rûsî deyndarê bajarê Petroyê Mezin Petersburgê bû.

Çawa ku edebiyatên nivîskî deyndarê bajarê in her wiha bajar jî berhemê hêz û desthelatê ne. Lewra piraniya bajarê ji aliyê desthelateke bihêz ve hatine avakirin, paşê bi bazirganiyê bandora xwe li ser derûdora xwe çêkirine û dewlemend bûne. Dewlemendiye avadanî, zanîn, huner û edebiyat jî bi xwe re aniyê û bajar bi vî awayî ji bo derûdorên xwe bûne navendên cazîbeyê. Ev cazîbe di serdemên berê de li dora serayên padîşahan û koşkên wezîr û mîran çêdibûn. Dîwanên padîşahan, di binê wan de jî dîwanên wezîr û mîran bûn malzarokên edebiyatên klasîk. Eger em edebiyata gelêrî bidin aliyekî di vî serdemê de edebiyat ji bo serayê bû û berê xwe dabû serayê. Bo nimûne tragediyayên edebiyata Latîn behsa jiyana esîlzadeyan dikir û ji bo temaşekirina wan dihat leyistin. Di rojhelat de dîwanên helbestvanan piranî xîtabî keyfî û zewqa sultan û desthelatdaran dikir û li benda teqdîr û îhsana wan bûn.

Dema mirov bala xwe dide edebiyatên pêşketî yên cîhanê derdikeve holê ku xwediyê van edebiyatan di heman demê de xwediyê bajar û navendên girîng in jî

Di Serdema Navîn de û bi taybetî piştî salên 1500î li Ewrûpayê hin bûyerên girîng hêdî hêdî bergeheke nû li pêşiya edebiyatê vekirin. Lewra guhertinên aborî, siyasî û fikrî yên ku ji vê serdemê destpêkirin dê di serdema nûjen de bandora xwe li ser edebiyatê jî bikira. Bêguman di Serdema Navîn de rêvebiriyên feodal ên Ewrûpayê her ku diçû hêza xwe xurttir dikir. Bi lihevkirina lord û wassalan li Ewrûpayê seqamgîriyeke nîsbî peyda bû. Di encama vê de jî weku pêngava pêşî rê li rêbirên ser zemîn û qorsanên deryayê hat girtin û ewlehiya bazirganiyê hat temînkirin. Piştî ku li Ewrûpayê çîna burjuvayê xurt bû, van aktorên nû li hin ciyên ku ji bo bazirganiyê guncaw bûn û parastin û ewlehiya wan hêsan bû bajarên mezin avakirin. Bi vî awayî bajarên mezin ên Ewrûpaya Rojava peyda bûn.¹ Bajariyên ku li van bajaran peyda bûn û bi taybetî çîna burjuvayê li beramberî desthelata monarkan pêdivî bi birokeyeke nû ya jiyane dîtîn. Ji ber vî qasî bi destên vê çîna nû bizavên Ronensans û Reformê rû dan. Li bajarên mezin ên Ewrûpayê û bi taybetî jî li Parîsê, li dijî serayê û desthelata kevin felsefeya nû ya jiyane ku jê re Ronensans dihat gotin xurt bû. Di nav vê atmosferê de û piştî vedîtina çapxaneyê û derxistina rojnemayan edîb û şair weku aktorên karîger derketin holê û li hember monarkên otorîter ên serdema xwe û kilîseye ku hîpotek danîbû



ser jiyana xelkê bi rêya edebiyat û weşangeriyê ketin nav hewldanan. Di mehfilên tarî yên Parîsê de û li hin ciyên din ên Ewrûpayê vejîneke esasî rû dida. Bi taybetî 1776an de bi bandora serketina Teverga Serxwebûna Amerîkayê û bi “Beyanameya Serxwebûna Amerîkayê” xwediyên vê birokeya nû di kuçe û kolanên Parîsê de xelk bi rêxistin kirin û di encamê de di 1789an de Şoreşa Mezin a Fransayê pêk anîn. Helbet piştî şoreşê bi qebûlkirina “Beyanameya Mafên Mirovan û Hemwelatiyan” fikrê lîberalîzmê xurt bû û bingeha dewletên neteweyî hat avêtin. Bi pêşketina zanistê û belavbûna endustriyê qonaxa nûjeniyê gihîşt asta kemala xwe û nûjeniya edebî û navendên edebî yên nûjen li ser van bingehên siyasî, aborî û fikrî hatin damezirandin.

Ev bûyerên girîng ên ku li Ewrûpayê rû dan, çawa ji bo siyaseta dunyayê mîladek bû, ji

bo edebiyatê jî destpêkeke girîng bû. Ji vir pê de edebiyatê di şûna esîlzadayan de dê xîtabî raya giştî bikira, ji serayê derketa û berê xwe bida kuçe û kolanên bajar û li seranserî bajar bigeriya. Bi kurtî di serdema nûjen de navendên edebî bi xêra guhertinên siyasî, aborî û fikrî ji bin kontrola serayê û desthelatdaran derketin. Rewşenbîrên azad û hunermendan hinek kolan û mehfilên bajaran wek navendên edebî û rewşenbîrî bi kar anîn û berê xwe dan raya giştî.

Parîs weku navendeke edebî ya Ewrûpayê hêdî hêdî ji van pêvajoyên nûjeniyê derbas bû û bû yekemîn navenda edebî ya nûjen. Nûjeniya edebî ya Ewrûpayê ku mirov dikare di nimûneya Parîsê de bibîne qonax bi qonax û bi hemdê xwe çêbû. Derketina çîna burjuvayê, gulvedana bizavên Ronensans û Reformê, têkoşîna maf û azadiyan, bi rêya huquqê sînorkirina

1 Oral Sander, *Siyasi Tarih*, İmge Kitabevi Yayınları, 2008 Ankara, r. 73-78

desthelatê, pêşketina zanist û geşbûna endustriyê û peydabûna netewe-dewletan ji van qonaxên nûjeniya Parîsê bûn ku nûjeniya edebî afirandin. Lê nûjeniya ku li cîhana derveyî Ewrûpayê serî hilda ji aliyê dînamîk û aktorên xwe ve û ji aliyê rêbaza peydabûna xwe ve ji rêbaza nûjeniya Ewrûpayê cihêtir bû. Ji bo vê nimûneya herî baş rêbaza nûjeniya bajarê Petersburgê ye.

Petersburg di 1703yan de ji aliyê Petroyê I. ve bi armanca ku Rûsya xwe bigihîne medeniyeta nû ya Ewrûpayê û ev bajar bibe sunbula vê medeniyetê li ser Rûbarê Nevayê, li kevîyê Kendava Fînlandiyê tê damezirandin. Pîlan û projeya vî bajarî ji aliyê mîmar û endazyarên Îngilîstan, Fransa, Hollanda û Îtalyayê ve tê çêkirin.² Bi taybetî jî mîmarên Îtalî Domennico Trezzini û Francesco Bartalomeo mohra xwe li ser vî bajarî dixin. Bajar di nav deh salî de li ser çil û du giravan tê avakirin û dibe yek ji metropolên mezin ên Ewrûpayê û her wiha dibe paytextê Împaratoriya Rûsyayê. Petro û çarên li dû wî gelek zanyarên matematîkê, endazyar, huquqnas, zanyarên siyasetê û aborînanan ji derveyî welat vedixwînin. Bi hatina van kesayetên Akademîyeke Zanîstan û Pergala Perwerdeya Teknîkî ku dewletê piştgirî didanê dadimezirînin. Kesayetiyên mîna Leibniz, Christian Wolf, Voltaire, Diderot, Bentham û Herder ji aliyê împaratoriye ve tînin

Gelek nivîskar û helbestvanên bi navûdeng ên Rûsyayê doza azadî, nûjenî û guhertina vî welatî ku dê li bajarê Petersburgê û bi taybetî jî li ser Kolana Nevskiyê rû bidana di berhemên xwe de pêşkêşî xwênerên Rûsyayê û cîhanê kirin

hîmayekirin û berhemên wan ji bo Rûsî tînin wergerandin.³ Di serdemên împaratorîçe Anna, Elîzabeth û Katerînayê de bajar li gorî mîmariya Rojava bi abîdeyên barok, rûwaletên rokok, perspektîfên klasîk û sîmetriyê tê xemilandin û hinek navendên bajar dibin wek seyrangehê.

Bêguman di sedsala 18 û 19an de Petersburg bi her awayî navenda Împaratoriya Rûsyayê bû lê dilê Petersburgê jî li Kolana Nevskiyê hildavêt. Petersburg weku bajar û Kolana Nevskiyê weku navenda edebî û rewşenbîriya vî bajarî paşê dê bibûya îlhama gelek nivîskar û helbestvanên mezin ên Rûsyayê ku di sedsala 19an de yek ji mezintirîn edebiyata cîhanê anî holê. Niha emê hinek taybetiyên vê kolanê raber bikin û paşê emê behsa hinek bûyerên girîng ên ku li ser vê kolanê rûdane û bûne mijara edebiyatê bikin.

Kolana Nevskiyê di Petersburgê de dirêjtirîn, firehtirîn û ronîtirîn kolana bajar bû. Kolan ji Meydana Amîraliyê digihîşt Dêra Nevskiyê û piştî 1851ê jî diçû heta Gara Ekspresê ya Moskova û Petersburgê. Her wiha kolan rastî Rûbarê Moikayê û cûbarên Katerîna û Fontankayê dibû û bi pirên delal bi hev ve dihat girêdan. Di herdu aliyên kolanê de

avahiyên biheybet hatibûn avakirin. Katedrala Meryamayê, Seraya Mihailovskî, Şanogeha Aleksandir, Pirtûkxaneya Giştî û navendên bicamekan ên danûstanê, avahiyên girîng ên vê kolanê bûn. Tiştên herî berçav û sembolîk ên vê kolanê Peykerê Petroyê Mezin Siwariyê Bronz, Seraya Zivistanî û Birca Amîraliyê bûn. Rê bi makadam û asfaltê hatibû çêkirin û bi şev bi ronîya gazê û elektrîkê dihat ronîkirin. Kolan bi otomobîl û trolleybusên xwe, bi sînema û xwepêşandanên xwe nîşaneyê ciwaniya bajar bû. Li ser kolana Nevskiyê hemû pêwîstiyên mirovan dihatin peydakirin. Ji kolanê din ên Petersburgê cihêtir lewheyên dikanên wê piranî bi du zimanî bûn, heta lewheyên Frensî û Îngilîzî jî ên Rûsî zêdetir bûn. Ji bilî van taybetmendiyan madîyên Kolana Nevskiyê kolan ji aliyê beşerî ve jî rengo reng bû. Li ser kolanê tevî esîlzade û zadeganan, zenaetkarên hejar, qehpikên kuçan, sûtên bereday û bohemên bajar jî peyda dibûn.⁴ Nevskî navend û gerîneka van hemû mirovên cûr bi cûr bû. Kolan bi van taybetmendiyan xwe li berçavê Petersburgiyên di demeke kurt de bû efsane, her wiha bû objeya edebiyata serdema xwe jî.

2 Marshall Berman, *Katî Olan Her Şey Buharlaşiyor*, İletişim Yayınları, 1994 İstanbul, r. 237-238

3 b.n.b, r. 239

4 Marshall Berman, *Katî Olan Her Şey Buharlaşiyor*, İletişim Yayınları, 1994 İstanbul, r. 259-262

Gelek nivîskar û helbestvanên bi navûdeng ên Rûsyayê doza azadî, nûjenî û guhertina vî welatî ku dê li bajarê Petersburgê û bi taybetî jî li ser Kolana Nevskiyê rû bidana di berhemên xwe de pêşkêşî xwênerên Rûsyayê û cîhanê kirin. Puşkîn, Gogol, Dostoyevskî, Çernîşevskî, Bîely û Mandelştam bi berhemên xwe şahidiya sêhra Petersburgê û Kolana Nevskiyê kirin. Petersburg di berhemên edîbên navborî de carna wek bajarê xewnan bû carna jî wek ewrekî reş bû li ser xewnên mirovên azad. Bo nimûne, Dostoyevskî di romana xwe ya bi navê "Têbiniyên Ji bin Erdê" de Petersburgê wek bajarê herî sun'î yê cîhanê nîşan dide. Di romana xwe ya "Tawan û Seza"yê de ji bo vî bajarî wisa dibêje: "Ezîzê min, vira bajarê mirovên nivîndok e! Li rûyê erdê bi qasî Petersburgê tu bajarekî din li ser ruhê mirovan bandorên wisa tarî, tûj û xerîb çênake."⁵ Lê Puşkîn berava jî Dostoyevskî Petersburgê wek bajarê xewnan teswîr dike û di helbesteke xwe de wisa behsa Petersburgê dike: "Ey bajar ez heyranê te me/Şahesera Petro ez ji te hez dikim/Hemahengiya avahî û herikîna rûbarên te/Ji kevirên granît rixtimên te/Ji hesinên kutandî caxên te/Ji xewnên ku min di şevên te yên bêhevy, lê ronak de didîtin/Ji odeya xwe ya ku bêyî ez lembeyên wê yên şevê vêxim min lê dixwend û dinivîsand/Û ez ji kuçeyên bêdeng ên ku ji pencereya min ve xuya dibin/Û

ji tîra zêrîn a Avahiya Amîraliyê hez dikim."⁶

Di berhemên edîbên Petersburgê de behsa pêvajoya nûjeniya civakî ya xelkê Petersburgê, peydabûna navendên edebî yên li derveyî seray û koşkên desthelatdar û asîlzadeyan û herikîna navendên edebî ji seray û koşkên wan ber bi kolanên azad ve tê kirin. Cara yekemîn di serdema Nîkolayê Yekemîn de dijayetiya serayê û kolanên Petersburgê rû dide. Desthelat di vê serdemê de fam dike ku tekane mekanê ku nikare di bin tehekuma xwe de bigire Kolana Nevskiyê ye. Kolan di bin çavdêriya hukumetê de bû, lê hukumetê nedikarî li gorî dilê xwe bûyerên vî kolanê bi rê ve bibe. Bi vî taybetiya xwe, Nevskî ji bo kesên xeyrî memnûn dibû qadeke azad û cîyê serî hildanê. Dostoyevskî di romaneke xwe de li beramberî esîlzadeyekî behsa têkoşîna wekheviya karmendekî dike. Ev karmend dixwaze li ser Kolana Nevskiyê mexsûs milê xwe li milê esîlzadeyekî bixe û bi vî awayî xwe pê bide hesandin.⁷

Pêla duyemîn a azadiyê dîsa li ser Kolana Nevskiyê di 1860î de weku xwepêşandaneke polîtîk li tevahiya Petersburgê belav dibe. Lewra di vê serdemê de ango di serdema Alexanderê Duyem de hin reformên lîberal tînin kirin, endustrî pêş dikeve û mirovên

derûdorê ber bi Petersburgê koç dikin û çîneke karker peyda dibe.⁸ Deh sal paşê rewşenbîr û karker dîsa li ser Kolana Nevskiyê tînin ba hev û li dijî desthelatê alaya sor ku li ser "Ax û Azadî" nivîsandiye vedigirin û nerazîbûna xwe derdibirin. Lê di 1905an de Kolana Nevskiyê hemû kolanên Petersburgê bi xwe ve girê dide. Ji xelkên azadîxwaz ên vî bajarî 200.000 jin, mêr û zarok dor li serayê digirin lê 20.000 pasevanên çekdar ên serayê xelkê gulebaran dikin.⁹ Piştî vî bûyerê desthelata otorîter a Împaratoriya Rûsyayê ber bi rûxandinê ve diçe û Kolana Nevskiyê serê zordarên xwe dixwe.

Çîroka avakirina Petersburgê hem nimûneya dirûstbûna navendeke edebî hem jî di sedsala 19ê de nîşaneyê guhertina navenda edebiyatê ji serayê bo kolanên azad berçav dike. Mirov dikare bibêje ku eger bajarê Petersburgê bi wê heybet û rengîniya xwe ji aliyê Petroyê Mezin ve nehata avakirin, nebûna paytextê Împaratoriya Rûsyayê û monarkên wê demê piştgirî nedayê huner û rewşenbîran, bizava guhertinê ew çend xurt nedibû û ji hemûyan jî girîngtir di sedsala 19ê de ew edebiyata biheybet a Rûsî dernediket holê. ●

5 Nedîm Gürsel, Petersburg: 300 Yıllık Görkem, Atlas Dergisi sayı: 122, Mayıs 2003

6 Nedîm Gürsel, Petersburg: 300 Yıllık Görkem, Atlas Dergisi sayı:122, Mayıs 2003

7 Marshall Berman, *Katı Olan Her Şey Buharlaşıyor*, İletişim Yayınları, 1994 İstanbul, r. 283

8 b.n.b, r. 285

9 b.n.b, r. 333

Em zêde neçin û neyên

SELMAN DILOVAN

sdilovan@hotmail.de

M

in di hejmara Nûbiharê ya 114an de bi navê “Delîlên ku nabin delîl” nivîsarek nivîsîbû û rexne li Zilkîf Xweşhêvî girtibû. Di hejmara 115an de wî jî bi navê “Careke din li ser “hat” û “çûn”ê bersiva rexneyên li ser nivîsa xwe daye. Ez pir kêfxweş bûm ku di hejmara dawîn ya Nûbiharê de cure cure nivîsên rexneyî û nirxandinê rûpelên kovarê xemilandibûn.

Birêz Zilkîf Xweşhêvî digel ku yek ne tê de hemî rexneyên min qebûl kirine jî, dîsa bi ‘lêbelê’yekê nerazîbûn û dijberiya xwe jî bi dengê bilind diyar kiriye: “...herwiha Selman Dilovan jî derbarê mînakên de îtirazê hemû mînakên kiriye û rastî û çewtî têkilî hevdu kirine.”

Wek prensîp ez di nivîsên xwe yê rexneyî de li ser şaşiyekê û duduyan nasekinim. Lê weke ku xwendevanan jî dîtî, tiştên ku min gotin girîng bûn û şaşiyên di nivîsê de ne yek û dido bûn. Min di dawîya nivîsa xwe de jî gotibû ku standardek di zimanê me de tune, -ez jî tê de- gellek ji me şaşiyên dikin. Ez bi çavê

musamehe û bexşandinê li van şaşiyên dinêrim. Lê di warê destnîşankirina şaşî û rastiyên ziman de, mijar êdî bexşandin û toleransê napejirîne, lewra rastî binpê dibe. Eger Zilkîf Xweşhêvî li ser rastî û şaşiya bikaranîna ziman tiştêk îddîa nekiribûna, di zimanê wî de çiqas şaşî hebûna jî, min qet dengê xwe nedikir, lewra nivîsên bi wî rengî ne tenê di Nûbiharê de, di pirê kovaran de derdikevin.

Ji ber ku min li cihekî di şûna “cumleyî” de “cumlê” gotiye, Xweşhêvî dibêje:

“Ji ber ku ez di binê mineta wî de nemînim ez jî dixwazim di cumleyên wî yê jorîn de şaşiyekê rast bikim. Kek Selman di cumleyên xwe yê jorîn de du caran gotinên “vî cumleyî” dubare kirine û di cihekî de jî gotiye “cumlê”. Kek Selman dema dibêje “vî cumleyî” peyva “cumle”yê nêr qebûl dike, lê dema dibêje “cumlê” peyva “cumle”yê mê qebûl dike. Selman Dilovan divê biryara xwe ya dawîn bide “cumle” nêr e yan mê ye? Lê ji ber ku ez deyndarê

Birêz Zilkîf Xweşhêvî digel ku yek ne tê de hemî rexneyên min qebûl kirine jî, dîsa bi ‘lêbelê’yekê nerazîbûn û dijberiya xwe jî bi dengê bilind diyar kiriye

wî nemînim di şûna wî de ezê bersivê bidim. Peyva “cumle”yê mê ye û divê wek “vê cumleyê” bê bikaranîn.¹

“Selman Dilovan divê biryara xwe ya dawîn bide”, ... şaşiyekê rast bikim”, “ji ber ku ez di binê mineta wî de nemînim”, “ji ber ku ez deyndarê wî nemînim”... Ev gotinên qerase hemî ji bo peyvekê ne...

Bi fikra min pêdivî tune ku mirov ewqas ger û gêranê ji bo peyveke tenê bike, lewra ev ne şaşiyekê mezin e:

Di Kurmanciya me de hinek peyv hem nêr hem jî mê tîn bikaranîn. Weke “Tiştê tu dibêjî, tišta tu dibêjî; li gora te, li gorî te, fikrê te, fikra te...” Ev duawayî bi taybetî di peyvên biyanî ku ketine Kurdî de xuya dibe. (Ji zimanên ku ez dizanim ev duawayî di Erebi û Elmanî de jî heye.) Peyva “cumle”yê ji Erebi ketiye Kurdî. Bi texmîna min di klasîkên Kurdî de bi maneya hevokê nehatiye bikaranîn. Bi îhtîmaleke mezin ev peyv ji medresê belavî nav gel bûye. Min di medresan de xwendiyê û ev peyv li cem feqî û melayan hem nêr hem jî mê tîn bikaranîn. Bi fikra min nêrbûn belavtir e, loma jî tercîha min ev e. Ev pirsgirêka mêbûn û nêrbûnê di peyvên “qaîde” û “sûret” û hwd. de jî heye. “Li gorî vî qaîdeyî” jî, “li gorî vê qaîdeyê” jî; “Sûreta Beqere” jî, “Sûretê Beqere” jî; “Sûreta (wêne) min” jî, “Sûretê min” jî tîn gotin. Yanî netîce,

“cumle” nêr jî bête bikaranîn û mê jî bête bikaranîn ne şaş e.

Lê eger ev îzaha min jî Birêz Zilkîf Xweşhêvî tetmîn neke, ezê numûneyekê ji gotara wî bidim: Di rûpela 27an de gotiye: “Ev jî qayîdeyê gîştî ye.” Di ya 28an de gotiye: “ev qayîdeyê rêzimanî...” Yanî wî jî eynî tişt kiriye; carekê mê, carekê jî nêr bi kar anîye.

Eger ez mecbûr bibim ku şaşiyekê bi vî rengî destnîşan bikim, dê tercîha min wiha be: Ezê numûneyekê ji gotara Birêz Xweşhêvî bidim: “Birêz Xelîl Birînî behsa “ilmê zanyarî” dîke lê min vî ilmê (“vî ilmê” şaş e, divê tu bibêjî “ev ilmê” S.D.) ku behs dîke nebihîstiye çî cure ilm e (!)” Digel ku ev şaşî ji ya “cumlê” mezintir e û şaşiyên bi vî rengî di vî radeyê de di nivîsara wî de ne yek û dido ne jî, ezê derbas bibim, li ser wan ranewestim.

Di mijareke din de jî dîsa cenabê Xweşhêvî berê xwe daye hevalê xwe lê li xwe mêze nekirîye. Di rûpela 28an de dibêje:

“Xelîl Birînî di 7ê Adarê de li ser malpera Kovara *Bîrê* bi navê “Bikaranîna Du Lêkerên Cewaz” û Zilkîf Xweşhêvî” gotarek nivîsiye, lê ez nizanim ji bo çî sernavê gotara min guhertiye? Lewra min gotibû “Bikaranîna Du Lêkerên Ciyawaz” lê birêz Birînî di şûna “ciyawaz”ê de “cewaz” nivîsiye.”

Dema ku mirov gotinek ji cihekî neqil kir, (îqtîbas kir), divê mirov pir diqqet bike û eynen veguhêze. Heta eger şaşî di nivîsê de hebin jî mafê mirov û destlêdanê tune ku wan rast bike. Tenê mirov dikare bi

notekê yan jî bi bangnîşanekê diyar bike ku şaşî ne ya mirov e, ya xwediyê nivîsê bi xwe ye. Loma jî Birêz Xweşhêvî ji erdê heta bi ezman mafdar e ku rexnê li vê kirina Xelîl Birînî digire. Lêbelê di dewama gotara xwe de dema ku gotinê tîne ser min û gotinên min neqil dîke -bêhemdî xwe be jî- wî jî peyvên min guherandine:

“... eger em cumlê **rasterast** qebûl bikin jî ji hêla gramerê ve şaş e... Hingê rastiya vî cumleyî divê **weha** be.” (rûpela 30.)

Min peyvên **rast** û **wiha** bi kar anîbûn. (Vê jî bibêjim ku ez ferqeke ciddî di nava “weha” û “wiha” de nabînim, tenê ji bo ku ew jî guheriyê destnîşan dikim.) Lê peyva “rasterast” û ya “rast” ji hev cihê ne, divabû neyê guhertin.

Yan divê Zilkîf Xweşhêvî bi çavê lêborînê li şaşiyekê wiha binêre û bibêje ku bêhemdî çêbûye normal e, yan jî dema ku rexne li kesekî girt, divê pêşî ew eynî şaşiyê neke.

Şaşiyên bi vî rengî di çend cihên din de jî hene, lê dîsa ez derbas dibim. Hetta di nivîsa wî ya pêşîn de şaşiyên ku maneyê biguherînin jî hebûn, lê min bi çavê bexşandinê lê mêze kir û behsa wan nekir.

Zilkîf Xweşhêvî rexneyên min di sê xalan de nixandine, di du cihan de şaşiyên xwe qebûl kirine, lê hinek rexne jî pê ve zeliqandine. Di xala sisêyan de jî îddîa dîke ku min ew şaş fêhm kiriye. Ezê niha jî li ser wan bisekinim:

1 Xweşhêvî, Zilkîf: “Careke din li ser “hat” û “çûn”ê”, *Nûbihar*, Hejmar: 115, r. 30.

1. Li ser hevoka “Xebatên destûra bingehîn ya xweseriya demokratîk dikare bê meşandin û bilezkirin.” rexneya min rast dibîne, (rastiya wê **dikarin bèn** meşandin bû) lê dibêje ku wî ji *Netkurdê* girtiye, loma jî *Xwedê giravî* heqê min heye ku berê tîrên xwe bidim wî. Çimkî wî ji bîr kiriye ku çavkaniyê bide û bi gotina wî “redaktoriya” min li ser navê *Netkurdê* qebûl dike.

Ez jî dibêjim, kî şaşiyê bike rexne jî li wî tîrên girtin, ne li kesên din. (Madem qala *Netkurdê* tê kirin, mala wan ava ku sirf bi *Kurdî* weşana xwe dikan, lê êdî nûçeyên wê ji hêla ziman ve qet bala min nakişînin, lewra pirê caran ziman şaş bi kar tînin.) Dema ku mirov cumleyekî ji cihekî bigire û hukmekî bide; bibêje rast e, yan jî şaş e; hingê mirov şîrikê xêr û gunehên wî cumleyî ye. Çi rast be, çî jî şaş be... Ez nizanîm xwendevan çawa difikrin, lê bi fikra min di vir de *Birêz Xweşhêvî* ji *Netkurdê* bêtir berpirsyar e. Lewra *Netkurd* dikare bibêje ku min bêhemdî ev şaşî kiriye, ez îddîa nakim ku ev cumle rast e. Lê *Xweşhêvî* di mijara “rastbikaranîna ziman” de, dibêje ku ev cumleyekî rast e. Dema tu cumleyekî biguherîn û bibêjî rast e, maneya wê ew e ku her tiştê wî cumleyî rast e, şaşî tê de tunin. Loma jî bi gotina herî sivik *Birêz Xweşhêvî* di hilbijartina vî cumleyî û bikaranîna wî de qet ne masûm e.

2. “Wer ji ber perdê yedê beyda bi mu’ciz bête der”.

(Eger *Birêz Xweşhêvî* di dewama vê malikê de du malikên din jî bixwenda, dê rastî “Narit axir ger bi mûyek behsê zulfa

yari bit” [narit, naherit, nahere] bihata. Û ez meraq dikim, gelo yê bigota, “Melayê Cizîrî jî di vir de bi awayekî çewt bi kar aniyê” yan yê dev ji teza xwe berdaya û negota “Ew serê sibehan zû dihere ser karê xwe” çewt e.)

Piştî ku *Zilkîf Xweşhêvî* li vir jî şaşiya xwe qebûl dike, lê ji ber ku îtiraza min ya dawî fêhm nekiriye îddîa dike ku di gotinên min de nakokî heye:

“...lê ez nizanîm ji bo çî hema di bin vê beytê de *Selman Dîlovan* ji tiştê ku gotine wekî bikeve şikê îzahateke weha jî kiriye: “Bi tu awayî “were” û “bête der” di vê beytê de bi hev nakin. Çimkî “were” ji kesê duyem re hatiye gotin “tu”; û “bête der” ji kesê sêyem re, yanî “ew”. Ji van gotinên *Selman Dîlovan* weha tê fêmkirin ku *Selman Dîlovan* “wer”a vê beytê wek fermana kesê duyem qebûl dike û “bête der” jî ji bo kesê sêyem qebûl dike û dibêje ji aliyê kesan ve ev her du gotin hev nagirin. Dîsa *Selman Dîlovan* divê biryara xwe bide eger “wer”ê wek “we + er yanî eger” qebûl dike min li jor jixwe heq dabûyê, lê ku “wer”ê wek fermana lêkera “hatin”ê qebûl dike kesê duyem yan sêyem ferq nake. Di vir de teşeya lêkerê girîng e. Tu vê lêkerê ji bo her şaş cînavkan jî bi kar bînî forma wê naguhere.”

Çawa forma wê naguhere? Ma “were û werin” eynî ne? *Zilkîf Xweşhêvî* bi xwe jî di dawiya rûpela 28an de gotiye: “Dema mirov bala xwe dide van her du forman “were û werin” ...” û wan wek du form qebûl dike, lê li vir dibêje forma wê naguhere. Bi ser de jî dibêje

“were” ji bo her şaş cînavkan jî tê bikaranîn. Nexêr, “were” wek emir tenê ji kesê duyem û pirhejmariya wî/wê re tê bikaranîn: Tu were, hûn werin. Mirov emrê xwe û emrê kesê sêyem nake.

Ji ber ku *Zilkîf Xweşhêvî* gotina min neqil kiriye, ez dubare nakim, lê ji ber ku ber neketiye, ezê bi awayekî din rave bikim:

Yek: “Wer” bi maneya “eger” e, ez li ilmê xwe siwar im, tu şik gumana min jê tune.

Ya duduyan: Min xwest nîşan bidim ku ev cumle ji aliyê avakirina xwe ve jî nabe delîl. Eger em “wer”ê bi maneya “were” qebûl bikin jî nabe. Çimkî “wer, (were)” û “bête der” di hevokê de, ne ji kesê duyem re dibin ne jî ji yê sêyem re. Yan divê tu bibêjî “were, derkeve” yan jî tê bibêjî, “bila were, bila bête der” lê pînek ji vir yek ji dera din (were, bête der) xîtabeke kelevajî ye ku ne bi kêrî kesê duyem tê, ne jî yê sêyem...

Kî ketiye neqeba teng?

3. Mijara xala sisêyan jî beyta “Dê ji çerxa pêncemîn bêtin tenezul kit Merîx” e. Min gotibû, bi fikra min ev mînak jî şaş e. Li ser vê fikra min *Birêz Xweşhêvî* wiha dibêje:

“*Dîlovan* îddîa dike ku min ev “bêtin” wek lêkera arîkar a tebatî qebûl kiriye û bi dîtina wî ev ne lêkera tebatî ya arîkar e belkî lêkera esasî ye û bi serê xwe ye. Carekê min di nivîsa xwe de tiştêkî weha negotiye *Selman Dîlovan* ev wate ji ku derxistiye ez nizanîm?”

Ez bibêjim min ji ku derxistiye:

Di hejmara Nûbiharê ya 113an, di rûpela 38an de Xweşhêvî gotiye: “Bo nimûne dema lêkera “hatin”ê wek **lêkera arîkar a tebatî** digel lêkera bingehîn di dema bê de tê bikaranîn, di şûna ku di forma dema niha û dema bê de wek “bê” bê bikaranîn bi awayekî çewt wek “were” tê bikaranîn. Ji bo vê em dikarin mînakên wisa bidin:” (Min “lêkera arîkar a tebatî” reş kiriye.) Ev yek.

(Ezê li vir parantezeke din jî vebikim: Ji çend hêlan ve mirov dikare îtirazên mezin li vê paragrafa Xweşhêvî bike, lê ji ber ku ez naxwazim zêde dirêj bikim, ezê derbas bibim.)

Di pey vê gotinê re di hemî mînakên wî de tenê **lêkera arîkar a tebatî** heye: “were kirin, bê kirin; pêk werin, pêk bîn; were meşandin, bê meşandin.” Ev dido.

Ya sisêyan: Di pey numûneyan re jî gotiye: “Ji bo rastiya vê qayîdeya zimanê Kurdî mirov dikare ji Dîwana Melayê Cizîrî çend nimûneyên bikaranîna vê lêkerê bide:” Bi gotina “vê lêkerê” jî birêz Xweşhêvî careke din eşkere dike ku lêker yeke tenê ye, behs jî ya “lêkera arîkar a tebatî” ye.

Aha min ji vir derxistiye. Yanî ne behsa “lêkera esasî” hatiye kirin, ne jî ji bo wê numûne hatine dayin. Piştî vê zelaliyê êdî gelo ev numûne ji “lêkera arîkar a tebatî” re tê fêhmkirin yan jî “lêkera esasî” re, bila teqdîra xwendevanên Nûbiharê be. Ji bilî vê, ji paragrafa ku min îqtîbas kirî û heta ku numûne tên dayin tu nişan û elamet tunin ku Birêz Xweşhêvî xwe bispêre wan

û bibêje min wek “lêkera esasî” bi kar aniyê. Dîsa jî madem Birêz Xweşhêvî xwe ji vê şaşiyê bêrî dike, ez bi niyeta wî bawer dikim, illahî nakim stûyê wî, lê wê demê ezê bibêjim: Dema mirov tezek îddîa kir, yan formulasyona tişteki kir, divê mirov li wir mînakê jê re bide ne li cihekî din. Eger mînak ji bo “lêkera esasî” ye, çima di binê mijara “lêkera arîkar a tebatî” de hatiye nivîsîn?

Birêz Xweşhêvî min sûcdar dike ku guya min guman xistiye ser naverokê jî, lê mixabin ew bi xwe jî êdî poşman bûye, li îddîayên xwe xwedî dernakeve. Dema bersiva rexneyên Xelîl Birînî dide, di rûpela 28an de numûneyên “Ezê bêm”, “Ezê werim”; “Tuê bê”, û “Tuê werî” jî kîtaba Celadet Alî Bedirxan neqil dike û dibêje:

“Rast e dema em hemû Kurmancîaxêfan li ber çav bigirin ev her du awa jî tên bikaranîn. Ji xwe min jî di gotara xwe de behsa vê rastiye kiribû, lê mebesta min ew bû ku ez di nav van her du forman de **ya rasttir** berçav bikim.” (Min “ya rasttir” reş kiriye.)

Di gotara xwe ya di hejmara 113an de jî, di rûpela 38an de gotibû:

“Digel vê taybetiya lêkerên “çûn” û “hatin”ê di van demên dawî de di gelek weşanên nivîskî, bihîstî û dîtinî yên Kurdî de her wuha di hinek deverên lokal de ev her du lêker bi **awayekî çewt** tên bikaranîn.” (Min “awayekî çewt” reş kiriye.)

Zilkîf Xweşhêvî jî gotina xwe ya “awayekî çewt” maneya “ya rasttir” derdixê. Xwen-

devan dikarin lê binêrin, hemî numûneyên ku birêz Xweşhêvî dane, li ber wan yan (rast) nivîsiye yan jî (çewt), qet behsa “rasttir”bûnê nekiriye. Digel vê rastiya eyan beyan jî, cenabê Xweşhêvî îddîa dike ku nakokî di nav gotinên min de heye û ez ketime neqebeke teng.

Ez dikarim numûneyên din jî bidim ku nakokiya di nav gotinên wî de hê kûrtir bibe, lê dîsa bila numûneyek bes be.

Ji ber ku min biryara rastî û çewtiya îddîayên wî ji ziman-zanan re hiştibû, gotiye: “Bi vê gotinê Selman Dilovan bi awayekî ji awayan dixwaze bibêje ku ev mijar ne karê min e û ez ewqas jê fêhm nakim...”

Mîna çend cihên din di vir de jî zimanê wî ne zelal e, armanca wî ne diyar e: Li gor şîroveya wî, gelo guya ez bi awayekî ji awayan ji wî re dibêjim, “ev ne karê te ye, tu ewqas jê fêhm nakî”; yan jî xwe re dibêjim, ne kufş e. Ya rast di vê hevokê de îhtimala dawî mezintir e û ez dikarim bi çend tewran bersiva wê jî bidim, lê dîsa jî ezê mafê xwe yê “dengnekirinê” bi kar bînim!...

Digel ku min gotibû, bikaranîna peyva “were” wek emir, tişteki pir eşkere ye û pêdivî pê tune ku mirov ji Dîwana Melayê Cizîrî delîlan bîne jî, careke din Zilkîf Xweşhêvî çûye li “Delîlên ku bibin delîl” geriyaye û nişanî me/min dide. Bila xatîme gotina “Mîrê Suxen”ê be:

“Hacet niye cana yedê beyda bideranîn

Înkari di dîn da nebit îcazi çî hacet”●

Siûda bextewariyê

Yilmaz Guney

Ji Tirkî: Receb Dildar

Jiyanê siûda bextewariyê neda me yarê
 Me ji bilî xwe
 Xemgîniya her kesî kir xemgîniya xwe
 Û êşa her kesî kir êşa xwe lewra
 Li wî aliyê dinyê
 Hêsrên însanekî ku me qet ew nas nedikir jî
 Kezeba me şewitand
 Em ji bo pisîkan giriyan
 Me şîna çûkan girt
 Dilzîziya dilê me
 Carna em li hember jiyanê
 Qels xistin
 Ya rast çiqas tişteki xweş e
 Gava însanek jî bo însanekî din bişewite
 Evîndarê
 Çi tişteki xweş e ku
 Li ber derdê yekî ku wî/wê nas nakî dikevi
 Û jê re li çareyan digeri
 Di hemû jiyanê xwe de
 Ez her tim li ber ketim, her tim şewitîm..
 Jiyan çiqas xweş e, lê delalê...
 Bi kêf û şahî, bi hezkirin
 Bi raman
 Û bi hîskirina janên jêneger
 Yên jiyanê

Newroz

Cemil Telli

Newroza me pîroz be
 Dilê xortan pîr xweş be

Zilma Dehaq xilas be
 Destê Kawa pîr sax be

Ji bo mafên gelê xwe
 Çakûç girte destê xwe

Ew Kawayê hesinker
 Serê Dehaq kir du ker

Wexta wî dest hilanî
 Şahî kete nav Kurdan

Wî zalimî çal kirin
 Dilê xortan şa kirin

Agir dadan ser çîyan
 Ronî da 'erd û ezman

Kawayê rûmetgiran
 Dîrok danî Kurdistan

Ez bi qurbana destê wî
 Zarok azad bûn bi wî

Hemberê zilma Dehaq
 Qehremanê Kurdan î

Ez Cemilê Tetwanî
 Min helbestek pêk anî
 22.3.2011,
 Stenbol

BI ÇEND XALAN REWŞA EDEBIYATA ZAROKAN

AMADEKAR: ROJBÎN ÖZKAN

rojbinozkan@gmail.com



PÊŞKÊŞÎ:

Edebiyata zarokan, di tevahiya edebiyatê de ya herî girîng û hêjayî nirxandin û lêkolînê ye.

Me jî xwest ku, em di vê dosyayê de, bala xwendevanên hêja, bikêşin ser vê babeta girîng.

Gelo di dîroka edebiyata Kurdî de, ji bo zarokan çî xebat hatine kirin? Nêrîn û hêlengên Kurdan çî ne? Edebiyata zarokan di nav Kurdan de çî astê de ye? Bifermin ji pênûsên pênc kesên ku di vê mijarê de şareza ne; raman û rênîşadanên wan ên derbarê edebiyata zarokan de bixwînin.

Birêz, Zeynelabîdîn Zinar, Remezan Pertew, Alî Çiftçî, Alî K. û Selman Dilovan bi pênûsên xwe ve bûn mêvanê vê dosyaya girîng û balkêş...

Ji ber keda wan, ez spasîyên xwe pêşkeşê birêz Z. Zinar, R. Pertew, A. Çiftçî, Alî K. û S. Dilovan dikim, ji bo ku wextên xwe yên hêja ji bo vê dosyayê veqetandin e. Her weha spasîyên taybet bo kekê hêja Suleyman Çevîk ji bo ku ev derfet da min.

Rojbîn Özkan

Zarok û edebiyata bi zimanê zikmakî

RAMAZAN PERTEW

Zarok bi lerizandina efsûnî ya zimanê zikmakî, heza bi çejna şîrê dayîka xwe, kîmyaya zimanê xwe ê taybet ta ku çî caran ji bîr ve neke dadiqurtîne û neqş dîke hucre û mejî û binehişiya xwe. Lorînên ku bi dayikê ve girêdayî ji guh ta mejî ve digêhe binehişiyê

Di pirtûka *Şîrove û Şîroveya Zêde* (Yorum ve Aşırı Yorum, Can yayınları, 2003) de Umberto Eco ji pirtûka John Wilkins ya bi navê *Mercury; Or, the Secret and Swift Messenger* (1641) çîrokekê neqil dîke. Hunera nivîsê dema ku cara pêşî hat îcadkirin ku tiştêkî çîqas ecêb xuya dîkir em dikarin ji helwesta çermesorên Amerîkayî ku di van nêzîkan de hatin kifşkirin, tê derxin: Çermesoran dema dîtibûn ku mirov bi kitêban re dipeyivin gelek şaş mabûn û bi tu awayî bawer nedikirin ku kaxizek bipeyive...

Li ser vê meselê serpehatiyeke xweş a derbarê koleyekî çermesor de heye: *Efendiyê vî koleyê çermesor ligel sepeteke hejîr û nameyekê ew bi rê kiriye. Kole di rê de pirê hejîran xwariye û yên mayî biriye kesê ku jê re hatiye hinartin. Ew mirov dema ku nameyê dixwîne, lê hay dibe ku hejmara hejîrên ku diviya hebe nîne. Ji koleyî re behsa tiştên ku di nameyê de hatine nivîsandin kiriye û ew bi xwarina hejîran ve sûcdar kiriye. Lê çermesorî (digel vî delîlê jî) bi awayekî jixwebawer rastî înkâr kiriye û nalet li nameyê aniyê ku ew şahîdekî sextekar û derewkar e.*

Piştî vê bûyerê, dîsa bi sepetekê mîna wê û bi nameyekê ew ji nûve hatiye hinartin ku tê de hejmara temam ya hejîran yên ku dê bêne teslîmkirin, nivîsandiyê. Vî koleyî dîsa wek cara berê pirê hejîran di rê de xwariye lêbelê îcar berî ku destê xwe bi hejîra

bide (bi armanca pêşîlêgirtina hemû sûcdarkirinên pişt re) nameya ligel sepetê di bin keviyekî mezin de veşartîye, di dilê xwe de weha fikiriye, “ger name nebîne ku ez hejîran dixwim, ewê qala min neke”. Dema sepet teslîmî xwediyê wî kiriye îcar rastî sûcdarkirineke girantir hatiye. Hingê li sûcê xwe mukir hatiye û baweriya xwe bi pîroziya kaxizê aniyê û sond xwariye êdî dê her karê ku bispêrinê bi dilsozî bi cih bîne”.

Her çend Eco vê meselê li ser babeta şîrove û şîroveya zêde (interpretation and overinterpretation/yorum ve aşırı yorum) neqil dîke jî em dikarin rasthatina zarokî bi nivîsînê jî bi heman awayî bişayesînin. Zarok ku cara ewil rastî nivîsan dibin di heman derûniyê de ne. Helwesta çermesorê ku bi nivîsê nizane û helwesta zarok nêzîkî hev in. Ji bo wan tiştêkî ecêb e ku kitêba ku ji pelên kaxizan pêk tê, bê ruh, bê can, bê zimên, çawa dibe mezin radîhêlin destê xwe dixwînin, pê dikenin, xemgîn dibin û pê re dipeyivin.

Di serî de bêyî ku mirov kategorîze bike, divê bê gotin ku temamê berhemên bi zimanê zikmakî sînore tefekur û texeyûl û tesewira zarokan diyar dikin. Ji ber ku zarok hemû tiştên xwe yên ewil, hemû tecrubeyên xwe yên pêşî bi vî zimanî dijîn, bi vî zimanî hîn dibin û di nav hiş û binehişiyê xwe de bi vî zimanî qeyd dikin. Zimanê dayîkê zeviya civaka xwe ye. Zarok jî toximek in ku di nav wê zeviyê de



geşedanê/neşwûnema dikin û mezin dibin. Ev zevî çend fireh û bi bereket be, dê aso û cîhana zarokan jî ewçend mezin, berfireh û dewlemend be. Bi rastî ji nav temamê berhemana de yê edebî xwedî cihêkî taybet in. Ji ber ku tesîra wan li ser mirovan mayînde ne. Hin pirtûk hene heta dawîya jiyana mirov nayên jibîrkirin. Hin karakterên çîrok û romanana hene ku di serê mirov de bêyî ku hay ji xwe hebe mirov wan ji bo xwe model digrin, xwe dişibînin wan. Her weha hin karakter jî hene ku carina mirov ji gelek şaşî û xeletîyan bêyî ku ew bi xwe tecrube kiribin, bi saya tecrubeya wan xelas dibin. Heman tewrî çend risteyên helbestekê ku me jê hez kiribe zû bi zû nayê jibîrkirin. Lewre edebiyat hunereke bi serketî ye ku bi sedsalan tiştên ku mirov fikirîne, difikirin, hîs kiriye, hîs dike an hatiye serî, bi awayekî xurt û dewlemend û jêhatî derdixe holê.

Îro baş tê zanîn ku têkiliyeke xurt û diyar di navbera pêkhatina kesayetiya zarok û zimanê zikmakî de heye. Jixwe dema em behsa zimanê zikmakî bikin hingê hemû cureyên edebiyatê yekser di rêza serî de cihê xwe digrin. Yanî çawa ji bo tendurustîya bedenî ya zarokan xurekên wek şîr, mast, epik, şûştin, hîjyen û hwd. pêwîst in her weha ji bo tendurustîya derûniya zarok jî xurekên zihnî yê wekî axaftina pê re, lorîk û stran û hwd. jî ewçend pêwîst û elzem in. Yanî bê şik em dikarin bêjin ku zimanê zikmakî bi awayekî sistematîk tesîr li ser pêkhatina kesayetiya zarokan dike. Gelo ev tesîr çiqas e û bi çî awayî ye?

Encamên xebat û lêkolînên zanistî bi awayekî zelal eşkere kirine ku beriya zayîna pitik ligel prosesa pêşketinê di zikê dayîkê de kesayeti, nasname û

binyada xwe ya psîşîk jî ava dibe û şikil digre. Her çend taybetiyên genetîkî û binyada kesayeti yê dê û bav li ser avabûna kesayetiya zarokan destnîşanker be jî, di prosesa berî zayîne de ji xwarina dayîkê bigre heta wek jiyana navmalbatî, derûdorî û civakî jî di avabûna kesayetiya zarokan de gelek tesîra xwe hene.

Her weha vekolîner vê yekê jî piştrast dikin ku di vê prosesê de avabûna kesayetiya zarok gelek di bin tesîra pevçûn û ji hev hezkirin û pevragehandina di navbera dê û bav, derdora jiyane û civakê, rewşa cografî û demsalî de ye. Zimanê ku tê axaftin, muzîka ku tê guhdarîkirin, strandina kilaman, lorandina lorîkan û lerzandinên gotinê ku eqsî diyalogan dibin û hwd. her yek ji faktorên avabûna binyada psîşîk a zarokan e. Pitika ku beriya zayîna xwe, wek bedenî, sehekî û derûnî dayika xwe nas dikir, piştî prosesa zayîne, ji bêhna laşê dayika xwe bigre heta bêhna xwêdanê, germahiya bedenê, taybetiyên dengê û digel layê derûnî ve têgehîştina xwe ya dayîkê pêşde dixe.

Hemû cureyên edebiyatê, di serî de çîrok, helbest û her weha hemû vegotinên gelêrî yê wekî; listik, henek, tiştanok, têderxistinok, mamik, metelok, lêhatinok, pêkenok, lorik, stran û wd. Di fêrbûna zimên de bi roleke xwe ya mezin hene. Bi vî awayî zarok hînî zimanê hawîrdorê xwe dibe. Ew bi tenê hînî gotinan nabe, fêrî maneya wan jî dibe. Zimanê ku bi vî awayî hatiye fêrbûn zimanê dayîkê ye. Bi alîkariya vî zimanî zarok dikare fikrên xwe pêşve bibe, bi awayê têgehîştin û hêza xwe ve cihanekê diyar bike û tiştên nû fêr bibe. Ji bo vê yekê mirov di zimanê xwe de dikare fikir, raman û hestên xwe bi awayekî baştir bîne zimên.

Zarok bi lerizandina efsûnî ya zimanê zikmakî, heza bi çejna şîrê dayîka xwe, kîmyaya zimanê xwe ê taybet ta ku çî caran ji bîr ve meke dadiqurtîne û neqş dike hucre û mejî û binehişîya xwe. Lorînen ku bi dayîkê ve girêdayî ji guh ta mejî ve digêhe binehişîyê. Di çaxa mezinatiya xwe de dema zimanê xwe yê zikmakî diaxive, guhdarî dike bi yek banga dengê di binehişîya xwe de derdikeve seyrûsefera

Îro baş tê zanîn ku têkiliyeke xurt û diyar di navbera pêkhatina kesayetiya zarok û zimanê zikmakî de heye

Îro tê qebûlkirin ku ji aliyê qîmeta edebî ve tu ferqa edebiyata zarokan û edebiyata mezinan ji hev nîne. Lewre divê herdu ji berhemê edebî bin

li cîhana xwe ya hundirîn a heyamên xwe ên azadiya saf û bêgunehkariya xwe, yanî ber bi salên xwe yê dergûşî ên lorînan ve. Peyvek hew bo carekê jî guhdarî kiribe, dû re ev peyv di demên pêş de hiç neyê bikaranîn jî, piştî gelek salan eger bê dengdan wê demê yekser li ber çavên wî, bi hemû teferuatên xwe ve zindî dibin. Carinan hew dengê, bêhnek, bayek an sewt û awazek me ji dema niha radike dibe heyamên me ên zarokatiyê.

Her weha ji bilî zimanê zikmakî, xwezaya welêt, hewa xwe, ava xwe tevahî tiştinên aîdê me di vê prosesê de derbasî zîhnê zarokan dibe. Mirov çiqas fêrî zimanên din jî bibe, hin nirxên xwe yê bi naverokeke gelî, wek stran, helbest, lorîk, govend, lîstik, kurteçîrok, çîrok, metelok, tiştanok, mamik, lêhatinok, pêkenok û wd. dikare bi zimanê xwe yê dayîkî ve bixwîne. Wek nimûne, mirov nikare hin lêhatinok û zûgotinokan wergerîne zimanekî din. Dema ku mirov werdigerîne jî dibin wek xwarineke bê ekl û bê xwê û çî tam tê de namîne. Mirov bi saya berhemên wêjeya xwe yê gelêrî ji zimanê dayîka xwe hez dike û bi vî zimanî dipeyive. Hesta aîdiyatiya behra mişterek ên bi neteweya xwe ve çêdike, çevengên neteweyî jî di vê prosesê de bi cih dibe. Ji ber vê yekê divê dê û bav bi xwe jî, çîrok û berhemên gelêrî yê çand û civaka xwe baş bizanibin. Ji bilî xisusiyetên genetîkî yê ji dê û bav derbasî zarok dibin, van hevkarîgeriyên ku tê behskirin ji aliyê hawirdorî û civakî ve di encamê de bi xisusiyetên ferdî û civakî ve kesayetiya temam dibe.

Ev prosesa ku me behskirî di seyra xwe ya tabî de pêk were, mirov bi salên dûrûdirêj ji malbat, hawirdor û welatê xwe dûr bikeve jî kesayetiya xwe ya esasî ya di binehişiyê de û hesta xwe ya aîdbûna bi neteweya xwe çî caran wînda nake. Çî cara ku sedemek an zemîneke minasib hebe bi îşaret û tesîreke biçûk dîsa derdikeve holê.

Nexasim ji bo zarokên Kurd em dikarin bi rêhetî bêjin ku bi vegotina çîrokê ve zarok di heman demê

de dîrok û rewşa xwe ya heytî jî têdigihên û dizanin. Lewre ji ber taybetiya rewşa milletê Kurd, vegotinên gelêrî yê Kurdan jî kirasekî neteweyî li xwe kirine. Em dikarin bêjin di gelek vegotinên gelêrî û berhemên edebî yê Kurdan de ev taybetî xwe rê dide.

Çima pêwîstî bi edebiyata zarokan heye?

Edebiyat nimûneyên dewlemed radixe pêş me ji nav heqîqetên jiyane û ji nav kiryarên mirovan. Her berhemeke edebî rûbirûbûn û rûbirûkirineke parçeyek ji jiyane an parçeyeke ji cihana fantazyane. Her yek ji wan randewuyekê dide xwendevan da li hev bîne wî/wê bi heqîqetên ziravbihîstiyarî ya ji nav dest û tiliyên hunermendekî xwe azad kiriyê. Bi awayekî kurt û sade, mirov dikare bibêje ku karê nivîsîna berhemên edebî, nemirkirina tiştên bûyî û dahatûyê ne. Metnên edebî bi awayekî tebîî di cîhana xwendevanan de bîrxistinên (tedaî) hestî pêk tînin û berê xwendevanan didin lêgerînên nû. Awayê têkiliyên nû yê ku bi hevokan re tene danîn bang li xwendevanan jî dike ku ew jî têkevin nav hest û tefekuran. Çî biçûk û çî mezin bin di encamê de tesîr û fonksiyona metnên edebî li ser wan kême zêde nêzîkî hev in.

Îro tê qebûlkirin ku ji aliyê qîmeta edebî ve tu ferqa edebiyata zarokan û edebiyata mezinan ji hev nîne. Lewre divê herdu jî berhemê edebî bin. Ji “edebiyata zarokan” meqsed edebiyata ji bo kesên emrê wan di navbera 2-14an de ne. Edebiyata zarokan navê giştî yê berhemên weha ye ku ji zarokatiya pêşî heta dewra balixiyê, geşedana zimên û asta fêmkirina zarokan bi awayekî serketî û bi hunereke hostetî pêş dixê, hestên wan hişyar dike, asta zewq û ecibandinên wan bilind dike. Divê ew jî heman wekî yê mezinan xwedî pîvanên giştî yê edebî bin. Lewma ne tesaduf e ku -binêrin- li cîhanê gelek ji hosteyên edebiyatê yê navdar, di warê edebiyata zarokan de jî berhemên wan hene. Edebiyata zarokan berî her tiştî edebiyat e û bi ser de jî gelek rexnegirên edebiyatê, nivîskarî û berhemdayîna di vî warî de li nik cureyên edebî yê dî, hîn sext û dijwar qebûl dikin.

Zarokên milletekî, di rojên dahatûyê de xwendevanê potansiyel in ji bo berhemên (roman, helbest, şano, çîrok) di zimanê xwe yê zikmakî de.



Foto:
Dawud Rêbiwar

Dûrik, mamik, tiştanok û çîvanokên ku zarok di lîstik û yariyên xwe de pê şa dibin, metelok û çîrçîrokên ku bi hesret li bendê ne guhdarî bikin, ev hemû modeleke zimên pêk tînin ku zarok dê di rojên xwe yên pêş de xweziya xwe lê bînin, teqlîda wan bikin û bizarê devê wan bikin.

Pirtûkên zarokan yên di wesfê edebî de, zemîneke hunerî ava dikin ji bo xwendevanên xwe, da pê re bikaribe têkeve nav têkiliyêke dualî jî. Ji lewre mesûliyetêke giran radihêle ser milên xwe ji bo rakirin û perwerdekirina zarokeke li hev di zemîna hest û ramanê de. Mirov dikare halê mamosteyê zarokan bîne ber çavan ku mîna dê û bavên çawa ew modelên esasî ne di temamê jiyana mirovan de, her weha fonksiyona pirtûkên zarokan jî jê kêmtir nîne.

Di temamê sîstemên perwerdeyî de armanca sereke ya perwerdeyê ev e ku, nirx û normên civakî veguhezîne ferdên civakê û bi vî awayî ferdekê tendurust, hevseng, bixwebawer û civakhez mezin bike. Têgîna modelgirtinê di lîteratura pedagojîyê de ji aliyê tevger, helwest û nirxan ve ji xwe rêber girtin û teqlîtkirina figurên mirovan e. Fenomena ku em wekî xwehevî (ozdeşim/identification) bi nav dikin jî bi şertê ku kesîf û bingeh be pirtir di çaxa zarokatiyê de, lê jê şûn ve jî xwedî tesîr e di her qonaxa jiyana me de, da ku em bi şibinê, arasteyî wan bin,

taybetiyên van figurên hevpar bigrin û di nav prosesê de bikine malê xwe. Tesbîteke pir muhîm e ku ew lehengên xwedî taybetiyên neyênî ne eger bêne pêşkeşkirin ev zêdetir model têne girtin di jiyana pêş de. Bingehtirîn şertê perwerdeyî her wekî ku em dizanin geşedana zîhnî ye. Ji bo ku zarok amadeyî hînbûn û perwerdekirinê be divê geşedana wî ya zîhnî tendurust be. Bi gotineke dî, zarok dest û piyek wî tune be jî dikare bê perwerdekirin, lêbelê zarokê ku di geşedana zîhnî de kêmasiyê wî hebe nikare di şertên asayî de bê perwerdekirin. Di perwerdeya zarokan de herçî geşedana zîhnî ye, tê de prosesa pêşketina melekeyên wek îdraç, nasîn, muhakeme û miqayese heye. Her weha prosesa geşedana zîhnî ligel prosesa geşedana biyolojîk di nav têkiliyêke hevbandoriyê de ne. Yek ji armanca perwerdeyê jî ew e ku zarok wateya jiyana xwe binase, ji bo pirs û meroqên ku di serê zarokan re derbas dibin wekî “ez ji ku hatime, çawa ji dayik bûm, mirin çî ye” û wd. bi bersivên mantiqî li hev bîne. Pêşî zarok van pirsan di cîhana xwe ya xeyalî de bi wate dike, bi awayê têgihîştina xwe şirove dike. An jî di çarçoveyêke giştî de dibîne û zêde li ser wan nafikire. Lê çî heye ku bo pêşxistina kesayetiyeke birêk divê bi awayekî têrhatî îla bersivên wan bide. Di vir de gelek caran gotinên mezinan dilê wî rehet nake, her kêmasî û valahiyeke dihele. Girîngiya çîrokê li vir dest pê dike. Mijarên ku

di nav Kurdan de em dizanin ku
alim û edîbên me jî bi awayekî
dîdaktîk û rasterast ji bo zarokên
Kurdan berhem afirandine

di çîrokan de derbas dibin bi rêyekê xwe digihînin cîhana zarokan û muşkîle û sergêjîyên zarokan aktuel dikin û dixin rojevê. Yanî zarok bê ku hay jê hebe xwe di nav cîhana çîrokan de dibîne. Tevlî lehengê çîrokê şerê xeraban dike, direve/dibeze, xwe dide alî, xwe vedişêre, li wan dide û axir bi ser dikeve. Zarok hesta serketinê tahm dike, kêfxweş dibe.

Ji aliyê pedagojîyê ve di nav berhemên edebî de çîrok bêtir xwedî binyadeke hêvojkar in, yanî dîdaktîk in. Di hemû çîrokan de aliyekî fêrkirinê, dersdanê heye. Her wekî ku zarok li dibistanê be û jê re dersên wekî jiyana civakî, qîmetên sincî yên mirovahiyê, helwestên qenc û xerab, hesta huner û estetîk û hwd. bê vegotin. Lewma ye ku fonksiyona çîrokê di zanistiya pedagojîyê de xwedî cihekî giranbuha ye. Yanî, di prosesa perwerdekirina zarokan de çîrokê her tim cihê xwe hebûye. Jixwe bi vî awayî fonksiyoneke çîrokê nebûya, divê çîrok ji zû ve ji holê rabûna.

Çawa ku me li jorê jî got, gelek ji edîb û nivîskarên navdar ên cîhanê di warê edebiyata zarokan de jî berhem afirandine ji bo zarokên milletê xwe. Her weha di nav Kurdan de em dizanin ku alim û edîbên me jî bi awayekî dîdaktîk û rasterast ji bo zarokên Kurdan berhem afirandine. Ji lewre ku wasiteya neqilkirina qîmet û adet û toreyên neteweyî tenê bi rêya nifşên nû yanî bi saya zarokan mumkin e. Hingê divê behrek nehindik ên ji fealiyetên edebî jî ji bo zarokan be. Digel ku hin xebatên dinê hebin jî, ji ber aliyên xwe yên pedagojîk û dîdaktîk em dikarin behsa du berhemên giranbuha yên di warê edebiyata Kurdî de bikin. Hem bi Kurdî/Kurmançî ne û hem jî rasterast ji bo zarokên Kurdan hatine nivîsandin. Yek jê ferhenga Kurdî-Erebî ya menzûm *Nûbihara Biçûkan* e ku ji aliyê Şêx Ehmedê Xanî hatiye nivîsandin, yê duwem jî ferhenga Kurdî-Farisî ya menzûm a bi navê *Mîrsad-ul Etfal* e ku ji aliyê Şêx Mihemed Kerbelayê Axtepî hatiye nivîsandin. Hin risteyên ji van ev in;



...
*Ji paş hemd û selewatan
Ev çend kelimê ne ji luxatan
Vêk êxistin Ehmedê Xanî
Navê "Nûbehara Biçûkan" lê danî*

*Ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan (1683)*
Ehmedê Xanî

...
*Ji piştî Besmele û hemd û selatan
Du sê lefzê di şêrîn ez luxatan*

*Me pev xist û di nav hev kirne te'lîf
Ji bo eclê ku da bi sehlî-texffî*

*Li ser etfal û ewladê Kurdan
Lîsanê Farisî û mexsedê wan*

*Bi Mîrsadût'tîfal min kirye nîşan
Ji mewla min rica ye nef'ê îşan*

*Me her wek Newbihara Şeyxê Xanî
Esasê wê ji bo etfalan danî (1912)*

Mihemed Kerbelayê Axtepî

Pirtûkên ku bi armanca xwendina zarokan hatine nivîsandin dikarin gelek xisûsiyetên muhîm bi zarokan bidin qezençkirin. Bi awayekî giştî em dikarin weha xal bi xal rêz bikin.

-Hişmendî û bîreweriya zimanê dayîkê çêdikin di hiş û mejiyê zarokan de.

-Fehengeke zîhnî çêdikin, ev jî ji bo zarokan dibe paşxan. Eger pêşî peyva “mal” hîn bûbe û demeke ev bi kar anîbe êdî “ev/home/beyt” tu carî şûna wê nagre.

-Pirtûkên edebî wasiteyeke ragihandinê ne, zarok ji destê yekem werdigre, dikeve bin tesîra zimanê pirtûkê. Hêza vegotina pirtûkê çend xurt be, zarok jî ewçend hêza xwe ya vegotinê xurt dike.

-Ji bo model girtin û sublimationê gelek muhîm in, lewra zarok zû hogirî lehengên pirtûkan dibin.

-Awayê bikaranîna tasnîf, kategorîzekirin, pêkanîna têgînan, bibîranîn, baldayîn, tefekur prosesên zîhnî pêş dixin.

-Arîkariya geşedana têgînî ya zarokan dikin û hînbûna têgînên şênber û razber hêsan dikin.

-Pirtûkên bi wêne di bîra zarokan de remz û nîqaşa têgînan çêdikin, bi saya vê venîqaşiyê ev têgîn di bîra zarokan de her dimînin. Her weha têgihanên sehekî (duyu algilari) yê zarok pêş dikevin.

-Metnên ku li gor qaydeyên dengdanê tên xwendin û ji aliyê zarokan ve tî guhdarîkirin tecrubeya derêxistina awayê dangan didin zarokan.

-Meharetên wekî guhdarîkirin, axaftin, xwendin û nivîsînê bi pêş ve dixin.

-Cîhana wan a fantazyê, qabiliyeta wan a texeyûlê dewlemend dikin, fersenda ken û şahî û yariyan didin.

-Ji bo civakîbûna zarokan dibin arîkar, problemên nelihevkerina bi civakê re bi awayekî hêsantir çareser dikin. Zarok dizane ku kîjan helwest di cih de ne û kîjan ne li rê ne.

-Zarok bi wasiteya pirtûkan civak û çandên wekî din nas dike, dibe yekî xerîbdost.

-Asta bixwebawerî û qîmetdana xwe bilindtir dikin.

-Rêyên alternatîf yê ji bo çareserkerina kêşeyan didin ber zarokan.

-Ji bo pêkhatina ruhekî hevpar a neteweyî, sûd jê wergirtina bermayiyên xwe ên millî, destan û çavkaniyên millî ava dikin.

Berhemên edebî bi çî zimanî dibin bila bibin wek malê temamê mirovahiyê bî hesibandin jî, edebiyata bi zimanê zikmakî, berhemên vegotinê gelêrî pirek e di navbera rabirdû û dahatûya dîroka neteweyan de. Berhemên edebî serwetên millî yê milletan in. Hejmara berhemên çend zêde bin, ew millet jî ewçend dewlemend, xwedîgotin û bixwebawer dibin. Zarokên milletekî bixwebawer jî bixwebawer radibin û bi wî çavî li xwe mîze dikin. Ji ber vê yekê nivîskar û edîbên Kurdan eger hevûdu teşwîqî nivîsandina berhemên ji bo zarokan bikin, dê karekî bixêr bikin.●

Çavkanî û pirtûkên tî salixdan:

Boyik, Eskerê, *Oda Çiroka*, Stockholm, 1977, Weşanên Roja Nû.

Celîl, Celîlê- Celîl, Ordixanê, *Destanên Kurdî*, Stenbol, 1994, Zel Yayıncılık.

Cewerî, Fîrat, Antolojiya Çirokên Kurdî, Stenbol, 2003, Weşanên NÜDEM.

Cindî, Heciyê & Evdal, Emînê. *Folklor Kurmanca*, Stenbol, 2008, Weşanên Avesta.

Dilovan, Jîr, *Ji biçûkan re çîrok ji mezinan re dîrok*, Diyarbekir, Şaredariya Sûrê ya Amedê.

Dilidüzgün, Selahattin, *Çağdaş Çocuk Yazını-Yazın Eğitime Atılan İlk Adım*, İstanbul, 1996 Yapı Kredi Yayını.

Kavcar, Cahit, *Edebiyat ve Eğitim*, Ankara, 1999, Engin Yayınevi.

Kerbela, Mihemed, *Mîrsad-ul Etfal: Amadegeha Zarûkan*, Amadekar: Zeynelabidin Zinar, Uppsala, 1989, Weşanên Jîna Nû.

Uzun, Mehmed, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Ankara, 1992, Beybûn Yayınları.

Xanê, Ehmedê, *Nûbar*, Amadekar: Zeynelabidin Zinar, Stockholm, 1986, Weşanên Roja Nû.

Yavuz, Muhsine Helimoğlu, *Masallar ve Eğitimsel İşlevleri*, Ankara, 1997, Ürün Yayınevi.

Yavuzer, Haluk, *Çocuk Psikolojisi*, İstanbul, 2000, Remzi Kitabevi

Yavuzer, Haluk, *Resimleriyle Çocuk*, İstanbul, 2000, Remzi Kitabevi.

Yıldırım, Prof.Dr. Kadri, *Nûbehara Biçûkan Analiz ve Şerh*, İstanbul, 2008, Avesta Yayınları.

Yıldırım, Prof.Dr. Kadri, *Ehmedê Xanî Mem û Zîn Çeviri ve Kavramsal Tahlil*, İstanbul, 2010, Avesta Yayınları.

Xamo, Zinarê, *Antolojiya Çirokên Zarokan*, Stockholm, 2008, Weşanên Apec.

Di çanda Kurdî de zimanekî zarokan ê taybet heye ku ew pê dipeyivin

ZEYNELABÎDÎN ZINAR

Di folklorê Kurdî de û di edebiyata devkî de zarok!

Bêguman di vê gêtiya me de, tu netewe wek Neteweyê Kurd, giringî nade zarokan. Ji ber hindê di Toreya Kurdî de, Edebiyata Zarokan jî pir dewlemend hatiye afirandin..

Jixwe diyar e ku jiyana mirovan, bi dema zaroktiyê dest pê dike. Yanî çî mirovê dema tê dinyayê û heta koça dawîn dike, di şeş pêngavan re dibihure. Ew pêngav ev in:

Pêngava Zaroktiyê.

Pêngava Sengeletiyê (xortik-keçik).

Pêngava Xortaniyê (xort-keç).

Pêngava Zilamtiyê (jin û zilam).

Pêngava Navseretiyê (mêr-jin).

Pêngava Kalîtiyê (kal-pîr).

Ev şeş pêngavên ku li jorê hatin gotin, hemû her yekê wan bi serê xwe, xwediyê çandêke taybet e; ji serî bigir heta nigan, ji ta bigir heta derziyê û ji "A"yê bigir hetanî "Z"yê, çanda wan, tevgera wan, rewşa jiyana wan, bîrûbaweriya wan û rabûn û rûniştina wan ji hevûdu cuda ye.

Ev haweyê ku hate gotin, ne tenê li nava Kurdistan, belê di nava piraniya neteweyên dinyayê de jî heye.

Babetê nivîsa me, ji ber ku *Edebiyata Zarokan* (Çanda Zarokan) e, emê jî, ji tecrûbe û serpehatiyên jiyana xwe, her weha ji lêkolîna xwe ya duwazdehsale li ser Folklorê Kurdî, digel ew tiştên balkêş ku ji nava çîrok û meselokên folklorî hatine bidestxistin û tevî xebata li ser 30 berhemên klasîk, tiştên ku min bi çavan jî dîtine, bi kurtî dê pêşkêşê xwendevanên Nûbiharê bikim:

Di Çanda Kurdî de zimanekî zarokan ê taybet heye ku ew pê dipeyivin. Helbet ev ziman jî bi helwesta mezinan hatiye afirandin û ew deng û pêjna ku ji devê zarokan derdikeve, hatiye berfirehkirin û li gor têgehiştina zarokan weke axaftin hatiye sere-rastkirin. Mesela:

- Dema zarok dest bi axaftinê dikin, pêşî peyvika "ma-ma" û "pa-pa" herweha hin peyvikên wisa yên din jî bi lêv dikin.

Çend peyv ji zimanê zarokan ev in li jêrê:

Bive: Agir, qedexe.

Cîcî: Delal, xweş, xweşik.

Çûçîke: Rûne, danîşe.

Tete: Ha wisa.

Eçî kirin: Lêdan, lîxistin.

Emîke: Bixwe.

Fofa: Xwarin.

Gixe: Pîs, kirêt.

Lolo: Wisa, were.

Ma: Da, dadê.

Pa: Bav, baba.

Wele: Were.

Di vê navê re dema temenê zarokan gehîşt salek û nîv, yan du salan, hin bi hin dê û bavên wan, yan jî hinekên din, hin peyv û bêjeyên ku bilêvkirina wan zehmet e bi zarokan didine gotin, da ku zimanê wan ji bo derxistina hin tîpên gira ên ku di nava bêjeyan de hene "mexrec" a tîpan derxînin û bi lêv bikin.

Jixwe diyar e ku mejiyê zarokan, wek şerîda teyîbê ye û peyvên zû di bingeha mejiyê xwe de qeyd dikin.

Her ku diçe, zarok fêrî zimanekî xwe yê taybet dibin û bi deng û kite û bêjeyan daxwazên xwe dibêjin.

Dema jiyê zarokan digîje salên çar û pênc heta şeş û heşt salan, ew dest bi kultura xwenasîne dîkin û gelek pirsan dipirsin. Pirsên wisa giran dîkin, heta ku dê û bavê wan hin caran zêvir dibin. Herweha di bersiva wan de, navê bavê wan, yê bapîrê wan, bavê bavê û bavê bavê bapîrê wan, ji wan re tê gotin. Ev hawe herwekî perwerdeyeke taybet e ku bi piranî ji aliyê pîrejînan ve ji bo zarokan tê gotin.

Gotineke wisa di nava Kurdan de heye: "Zarokê ku navê heft bavên xwe nizanibe, bîjî ye."

Mesela ez bi xwe jî bi vê perwerdehiyê hatime kesaxtin. Meta bavê min Hawaya gorbihîşt ku zanayeke mezin bûye, navê heft bavên min, bi min daye jiberkirin û gelek rûdanên dîrokî wek çîrok ji min re gotiye.

Di nava van salên temen ên zarokan de, zarok meselokên xwe dibêjin, bi leyztikên xwe ên taybet dileyizin û çî di nava gundan de be, çî jî li taxên bajaran be, dest bi peydakirina heval û dostan dîkin û diçin malên hevûdu, pirsra rewşa jiyana hev dîkin.

Di pirtûka min a bi navê MÎRATEyê de, leyztikên Kurdî yê zarokan û yê mezinan gelek cih girtine. (<http://hem.bredband.net/serkay/Doc/Pirtuk/pirtuk-a/Nr-18.htm>)

Helbet di dawiya van salên temen de, çanda zarokên keç û kur, ji êk cuda dibin. Herweha meselok û leyztikên wan jî, ji êk cuda dibin. Meselokên zarokên kurik, weke **Rovî rovî sindik...** û meselokên zarokên keçik weke **Yekê yekaneke, ezîzanê...** û gwh.

Bi dehan çîrokên Folklorî Kurdî yê zarokan hene. Dema zarok wan çîrokên dixwînin, mejiyê wan vedibe û ber bi asoyeke bêsinor ve diçe

Hêjayî gotinê ye ku bibêjim, cudatiyeke mezin di navbera çanda zarokên li herêmên çiya û ya zarokên li herêmên deştan de heye. Ji vê zêdetir, çanda zarokan li gor çîna malbata wan jî tê guhertin. Mesela, kurê yekî cotkarî û kurê yekî xerat, herweha kurê yekî hesinker û kurê yekî şivan, di warê çanda zarokiyê de ferqeke berbiçav heye.

Di temenê heft, heşt û heta bigîje duwazdeh, sêzdeh saliyê de, mejiyê zarokan ji pirsan dagirtiye. Îcar li gor pirsên zarokan, eger dê û bavên wan, yan hin xizmên wan ên zana hebin, ji zarokan re rûdan û serpêhatiyên dîrokî bi rengê çîrokên dibêjin. Ji zarokan, xasma yê kur, xwe dişûfnin wan lehengên dîrokî û weke wan xwe didin nasandin.

Hin caran dema zarokên kur dileyizin, yek dibe qiral, yan siltan ango serokdewlet, hin ji wan dibin wezîr û kizîr, hinek dibin leşker û çekdarên dewletê, û hinek jî dibin mehkûmê dewletê û dest bi şer û lêdanan dîkin.

Dema şerê zarokan çêdibe, çekên wan şivik in û her yekê wan herwekî ew şiva di destan de tivinga wî ye, her yekê xwe dixwe taldeyên dîwarekî û bi dengê xwe teqereq dîkin. Hin caran çekên wek topan jî bi kar tînin û xwe-liya tenûrê dixin nava naylonekî

û li serê hevûdu dixin, dema ew xweli belav dibe û qada ku lê ne dibe toz û dûman, bi devê xwe dengê hişk derdixin, herwekî ku top teqiyaye. Hin caran jî eger di leyztika zarokan de hebûna hespan pêdivî be, darekî dirêj dixin nava gavên xwe û herwekî siwarê hespekî ne, dengê wek siwaran û yê hespan derdixin.

Zarok hertim pirsra dinya û rewşa jiyana dinyayê dîkin û dixwazin bizanibin ka çawan e.

Bi dehan çîrokên Folklorî Kurdî yê zarokan hene. Dema zarok wan çîrokên dixwînin, mejiyê wan vedibe û ber bi asoyeke bêsinor ve diçe. Dema zarok lehengê wan çîrokên folklorî dixwînin, ew jî xwe dîkin wek wan û pê mîrxastiya xwe didin nîşandan. Piştî jî zarok di nava xwe de wek hawe û wêneyên di çîrokên de, bi hevûdu re têkilî dîkin.

Di çîrokên Folklorî Kurdî yê zarokan de, pir behsa xwendina zarokan hatiye dubarekirin. Ev hawe jî tîneke erênî li zarokan dike.

Di lêkolîna min a duwazdeh salan de, 1.710 sernavên folklorî bi destên min ketibûn û piraniya wan di deh cildên pirtûka min XWENÇEYê de hatine weşandin. 370 sernav ji wan, çîrok in. Ji sedî bêtirê wan çîrokên, yê rawilan (fabîl) in û piraniya van çîrokên jî, ji bo zarokan in.

Çendî ku ev babet pir fireh e û ne karê çend rûpelan e. Divêt di kovara *Nûbiharê* de lêkolînên berfireh li ser babetê bêne kirin. ●

Şûna edebiyata biçûkan di edebiyata Kurdî de

Ali K.

Îro bi navê ‘edebiyata biçûkan’ cûrekî edebiyatê hatiye qebûlkirin. Taybetiya edebiyata biçûkan, li gorî ya mezinan, bi ziman û şêweyekî sivik e. Ev navê “sivik” ne nîşana siviktiya hundirê gotinê ye, bi yekcarî cudatiyeke şiklî ye

Çi sedem in ku wêjevanên Kurdan ji edebiyata zarokan dûr mane? Di vê pirsê de du nuqte hene ku hêja ye meriv li ser raweste. Yek jê, jevkirina edebê wek edeba biçûkan û mezinan, herweha hemû ew tiştên ku weke unsûrên edebê tên dîtîn. Ya duduyan jî, bi rast peywendiya wêjevanan kêr e bi edeba zarokan re?

Jevkirina Edebiyatê

Peyva edebiyatê pêşî berhemên “nivîsandinê” tîne fikra meriv. Ji ber vê yekê, ku bê gotin “edebiyata biçûkan”, dîsa eynî fikr ewê bê hişê meriv; kitêbên ku edebiyata biçûkan, an zarokan di xwe de vedihewînin.

Ku em edebiyatê weke berhemên nivîsandî tenê bibînin, rast e edebiyata zarokan, an edebiyata biçûkan bi nisbet edebiyata mezinan hindik e. Lê ne rast e ku ji peyva edebiyatê tenê nivîsandin bête famkirin. Lewra zargotin û berhemên zaravî jî edebiyat e. Ji dêvîla nêrîneke weng/teng, rastir e ku edebiyatê weke ‘edebiyata nivîsandî’ û ‘nenivîsandî’ jêv bike.

Derheq edebiyata Kurdî de, ku bi nisbet edebiyata dinyayê, berhemên wê yên nivîsandî hindik e, meriv dikare behsa beşa edebiyata biçûkan bike. Ji aliyê din ve, gelo rast e an nerast e ku edebiyat bibe du cih wek edebiyata biçûkan, edebiyata mezinan?

Edebiyat, gotina bi pergal, xemilandî, hûnandî, maneya fireh û kûr, famkirina hêsan û zelal, ne kêr ne zêde, rîstandî û durustkirî ye. Bêguman ev ‘îbareyana ne weke nasandina edebiyatê ez dibêjim, tenê weke

nîşan û taybetiya berhemên edebî (berhemên nivîstî an berhemên zaravî dibin), an tiştê jê re tê gotin edebiyat. Lewra edebiyat milkekî pirr serûber e.

Îcar, ku ev gotinên hunermendane, an hunerkarane bê nivîsandin, wê çaxê meriv dê bêje; edebiyat nivîsandineke hunermendane ye ku mirov hest û nêrînen xwe li gotinan bar dike û dinivîse. Ev berhemana di xezîneya nivîstiya zimên û ferhengê de dibin heyînen edebiyatê û ji van heyînen xezîneyê, hem biçûk hem mezin, hemû endamên komelê sûdê/faydeyê werdigirin, an dibînin.

Herçendî cudakirinek bi vî rengî ne durust be jî, îro bi navê ‘edebiyata biçûkan’ cûrekî edebiyatê hatiye qebûlkirin. Taybetiya edebiyata biçûkan, li gorî ya mezinan, bi ziman û şêweyekî sivik e. Ev navê “sivik” ne nîşana siviktiya hundirê gotinê ye, bi yekcarî cudatiyeke şiklî ye. Di çîrokên zarokan de jî, her gotin û tabîr çend wateyên ji yek cuda di xwe de dihewîne. Çi zarok, çi mezin, gava wan dixwînin, di xeyala xwe de dinyayekê li ser ava dikin. Wek nimûne, zarokek gava çîroka mişkê dihere berşoyê guhdarî dike, nîrxandin û şîroveyên tevan di hişê xwe de dike. Mişkê tevî malbata xwe diçin ser golê borşeyê, lê gol, dewsa simekî dewaran e.

Zarokek li vê çîrokê guhdarî dike, nabêje: çawa dewsa simê heywanan bibe qasî golekê mezin? Mezin jî eynî şubhê nakin. Herdu birr (biçûk û mezin), zanin û qebûl dikin ku di çîrokê de şûna simekî, mînanî golekê fireh be. A ku guhdarê zar lê difikire stendina pahrêke û zewqekê ye. Ew dixwaze dersekê jê bigire.



Çîrok an destana dema tê gotin, ji biçûkan re, ji mezinan re bi heman derecê tê guhdarîkirin. Çi Leylê û Mecnûn be, çî Mem û Zîn be, çî serpehatiyên keçel (gurî) bin, çî yên lehengê wan heywan bin, axir hemû çîrok û destanên gotî, mezinan jî, biçûkan jî lê guhdarî kirine. Ji ber vê sebebê, bi fikra min edebiyata zargotinî nayê jevkirin, lê edebiyata nivîskî dibe ku bê veqetandin ji bo beşan. Çawa ku me got, di edebiyata zargotinî de veqatandineke bi vî rengî zehmet e.

Jiyan heta ku di devereke teng de çerx dibû, mirovan heyînên zimanê xwe dewrî hev dikirin. Mumkin e ji wê demê meriv bêje dema mirov bi hev re dipeyvîn, li hev guhdarî dikirin. Heyînên zimên ferhenga xwe; çîrok, lorîn kilam, şê'r, destan, bi kurtahî heta wê rojê bav û kalê wan çî ji wan re kom kiribûn, wan jî çî li wê zêde kiribûn, li malan, li çolan, li dîlanan, li şewran, welhasil di her devera jiyane de ji hev re digotin û ji hev digirtin. Di dirêjîya jiyane de hem digirtin ji aliyekî ve jî hildiberandin, yanî çêdikirin; kana kilaman, çîrokan, mamikan, şê'ran fireh dikirin. Ji hêlekê ve jî heyînên xwe dixwestin bigihînin nîfşên nû yanî zarokan. Bi danûstandinê ve pêşveçûn û hilberandina zimên pêk dihat.

Lê bi firehîya cih re, bi belavbûnê re însan nema mîna berê digihîştin hevdu. Nivîsandina edebiyatê

ji vî çaxî pêve weke rêbaza danûstandinê hatiye şixulandin. Ku meriv li dîroka edebiyatê dinyayê a nivîsandî dinêre, çiqas zorê bide û paşve bibe encax bigihîje hezar salî. Ew jî ne her ziman, ji nav hezaran, belkî jimara tiliyên yek destî derbas nekin.

Edebiyata Kurdî a zargotinî jî, ku weke beşeke edebiyata Hind-Îranî û Mezopotamî ye, bi hezaran, bi dehhezaran berhem hatine gotin û pîrraniya wan di meydana gotinê de maye, neketine bin qeyda nivîsê.

Wêjevanên Kurd ji edebiyata zarokan dûr mane?

Heta qirnê 20ê, ji bilî kitêbên Şêx Ehmedê Xanî, Nûbara Biçûkan û 'Eqîdeya Îmanê, sirf ji bo biçûkan bi Kurdî kitêb nehatine çêkirin. Bêguman li xwendexaneyan ji bo kesên nû dest bi xwendinê dikirin kitêbên dersê hebûn, lê bi zimanê 'erebî bûn û tenê kitêbên wek elîfbê bûn. Mîna xwendegehên modern ên dema Osmanî û piştî danîna cumhûriyetê, ji bo biçûkan tu kitêbên çîrokan tunebûn.

Rewşenbîr û nivîskarên Kurdî ji serê qirnê 20ê pê ve di hinan de ji wan kovar û rojnameyên weşandine, cih dane berhemên ku mumkin e di beşa biçûkan de bêne qebûlîkirin. Lê ew xebat gellekî kêman in. Ne pergala wan hebû ne jî girêdayê amanceke bi rêkûpêk bû.

Piştî danîna komarê, kesên ku kovar û rojname derxistin tev mirovên bi awayekî di nav rêxistinên siyasî de bûn. Mirovên polîtîze, wê çiqasî şû bike ku edebiyatekê ava bike, an edebiyata berê bide hev û biweşîne.

Tiştêkî balkêş e li gor fikr û nêrîna polîtîze, edebiyat wek karekî meqbûl nayê dîtin û qedrê wê nayê bilindîkirin. Dilketin û xweşîkbûn wek hewesên vala tî jîmartin/dîtin/hesibandin. Şêrînkirina peyvê, bedewiya gotinê ne girîng e, bera rast be bera nexweşîk be. Xweşîkbûna gotinê bi rastbûn û nerastbûna wê ve girêdayî tê dîtin. Gotinên nêrîna polîtîze, sloganîk in. Şê'r di qalibê marşan de ne, roman propagandeya dozê dikin. Mirov tenê dikare bibe evîndarê doza xwe.

Wext tuneke bimîne li hêviya demgirtina/meyîna şê'rekê. Tarîfa zulfê dilberê zaîfbûnê û heram tê dîtin. Ji bo rizgariya zarokan şerr dibe, lê ruhê zarokê jî

Edebiyata Kurdî, hem muhtacê berevkirina zargotina xwe, hem jî muhtacê çêkirina edebiyatê ye. Berevkirin û nivîsandina edebiyatê bi rast pirr îhmal bûye. Nezaniya usûla nivîsandinê jî weke sedemê dibînim

çi hez dike, çi tişt kêfa wî tîne, pê nayê zanîn. Ji vê yekê jî zarok ji tiştê ew dinivîsin aciz dibin, tu tiştî fam nakin.

Di kitêbên wan de, di marşên wan de, mişkek naçe ser avê, jineke bedew a ku sêhr lê nabe, ve-nagere kebokekê û naçe bi cotkarekî re napeyive. Rûviyek bi gurekî, bi şêrekî re hevaltiyê nake. Bizinek naçe zozanan pelên kizwanan naxwe. Yanî edebiyat, tiştêkî berhewa ye ku ruhê şoreşgeriyê nede mirov.

Piştî qirnê bîstan edebiyata Kurdî, ji ber van sedeman, ne zargotiniya xwe berdewam kir, ne jî edebiyateke nivîskî anî holê. Li seranserayî axa Kurdî, edebiyat kêm zêde di eynî rewşê de ma. Ancax vana bîst-sih salên dawî rewş ber bi guherînê ve reng dide. Lê neketiyê çer-xeke sererast.

Edebiyata Kurdî, hem muhtacê berevkirina zargotina xwe, hem jî muhtacê çêkirina edebiyatê ye. Berhevkirin û nivîsandina edebiyatê bi rast pirr îhmal bûye. Nezaniya usûla nivîsandinê jî weke sedemê dibînim. Zanebûn û serpêhatiya udebiyan Kurdî di vî warî de têr nedikir. Gotin ji me re rehet tê, nivîs mîna gotinê ne sanahî ye. Herçendî gotinê serûberekî xwe hebe jî, li gorî nivîsê gelekî azad e. Dikare ji dawiya gotinê, ji dawiya mijarê dest pê bike, paşê bere bere vegere serî. Lê nivîs meydanake teng, bi berbest û qaîde ye. Hê jî meriv dikare bibêje ku em ne pirr serkeftî ne di warê nivîsandinê de.

Dengbêjên me yê gelekî serkeftî, gava tu ji wan re bêjî ka van destanên hûn pirr rind dibêjin û dihûnin, wan ji me re binivîsin, ewê nikaribin.

Çimkî nekirine û nedîtine. Ez vê yekê weke sedema bingehîn dibînim û ev sedem ji me ye.

Berê, nivîskarên Kurd ên ku bi zimanekî din dinivîsin, digel ku bi rê û rêbaza nivîsandinê zanin jî, lê seba Kurdî meydanake li ber xwe nedidîtin û her-wisa mecbûriyet jî tunebû. Belkî ev jî weke sedema ne ji me bête dîtin.

Piştî nîşankirina van sedeman ez dixwazim, weke pêşniyaz nîşanî nuqteyekê bikim. Edebiyata me ya zargotinî divê bê nivîsandin. Elbettê hin nivîskarên hêja yê wek seydayê M. Emin Bozarlan û Zeynelabidîn Zinar li gor derfetên xwe ev heyîna zargotinî derbasî nivîsê kirine û gelek çîrokên me ji wendabûnê rizgar kirine. Lê bi awayekî rindtir û ilmî xebatek pêwîst e. Mumkin e kovarek, an weşaneke vekolînî bê weşandin ku sirf bi çîrok, lorîn, m a - mik, tiştanek, peyvên pêşiyên, lîstinên berê re eleqedar be.

Kovar û rojnameyên me yê niha, kêmkî ji wan sirf ji bo zarokan dertên.

Hîna me xwe ji bandorên siyasî nefilitandiye. Timî li ser mijarên komelî, siyasî û îdeolojîk nivîs diweşin.

Her wisa di televîzyonê de jî bernameyên tîn weşandin, exlebe li pey îspatkirina dozêkê, li pey pesindan an rexnerkirina meseleyan in. Biçûkên me heta zarok bin, ji çîrokan, piştî digihêjin xortaniyê ji berhemên li gor bayê xortaniyê mehrûm dimînin.

Kovareke weke Nûbiharê ku di dawiya 2011an de dê têkeve sala xwe ya 20an, heta niha ji bo zarokan gerek tibabek kitêb û weşanên bo biçûkan belav kiriba, lê hê em li bendê ne. Elbettê bi vê gotinê ve ne ku ez xwe dûr digirim, ez jî ji vê kêmasiyê tîm pîrskirin. ●



Li Ewrûpayê rewşa edebiyata zarokên Kurdan

ALÎ ÇİFTÇÎ

-Rewşa edebiyata zarokên Kurdan a li Ewrûpayê çawa ye?

-Bersiva vê pirsê ne hêsan e ku ez bikaribim bi hêsanî bidim. Ez tenê dikarim li gor tercubeyên xwe dîtinên xwe ji we re bêjim. Ji ber li ser rewşa wêjeya zarokên Kurdan çî li welêt be û çî jî li derveyê welêt be, bi qasî ku ez dizanim tu lêkolîn nehatine kirin, ji ber rewşa siyasî ku ji aliyê herkesî ve tê zanîn!..

Li welatên Ewrûpayê bi taybetî jî li Swêdê û li Almaniyayê ji aliyê penaberên Kurd ve gelek weşanxaneyên Kurdî di van 25-30 salên dawî de li gor îmkanên xwe hinek kitêbên Kurdî weşandin. Di nav wan kitêbên ku hatin weşandin de hindik be jî ji aliyê hemû weşanxaneyan ve kitêbên zarokan jî cih digirin. Piraniya wan kitêban, çîrokên ji folklorê Kurdî û wergerên ji kitêbên zarokan yên Ewropî bûn.

Bi tevayî wexta em li gor hejmara Kurdên ku li Ewrûpayê dimînin/dijîn dinêrin, em dibînin ku li hejmara ku heye, (behsa nêzikî 800 000î dikin. Ev hejmar li gor texmînan in, statîstîkên resmî di destê me de tune ne), xwestin an jî bi gotineke din, tu bazara kitêbên Kurdî tune ye. Dema ez vê gotinê dibêjim, li gor rewşa weşanxaneyên ku bi salan ew kar kirine em dibînin tu weşanxaneyekê nikaribûye bi weşangeriya Kurdî bikaribe xebata xwe bimeşîne. Dema weşanger an jî weşanxaneyek nikaribe bi firotina kitêban xwe fînanse bike nikare karê xwe berdewam ke.

Ji destpêka sala 1980î heta dawiya 1990î em dikarin bêjin li Ewrûpayê di vî warî de gulvedaneke wêjeya zarokan a bi zimanê Kurdî hebû. Lê pir mixabin, bi rewşa siyasî ya Kurd ve girêdayî, em dibînin, di wan salên dawî de rewş ber bi xirabiyê

ve diçe. Daxwaz û bazareke ji bo wêjeya zarokan pir kêmtir bûye. Ne tenê yên zarokan ev her jî bo kitêbên mezinan jî her wiha ye!..

Asîmîlasyon û xwe bi xwe asîmîlekirina di nav Kurdên li Ewrûpayê li gor welêt, hin bi lez dimeşe. Ji bo Kurdên bakurê welêt û Anatoliya Navîn ku li hemû welatên Ewrûpayê belav bûne, ji du aliyên ve rûbirûyê asîmîlê ne. Yek ji aliyê Tirkiyê û organîzasyonên Tirkan (bi taybetî yên olî) ve ye. Ya din jî ji aliyê welatên ku li dimînin ve tên asîmîlekirin. Her çiqas hinek hêz û hezkirên zimanê Kurdî li van welatên Ewrûpayê çêbûne û hewl didin ku di vî warî de xebatên hêja jî bikin, li hember asîmîlasyonê ku min li jor behs kiriye, bê hêz in!

-Xebatên van salên dawî ên weşanxaneyan ji bo zarokan çî ne?

-Xebatên bi rêxistinî yên bi rêk û pêk tune ne. Hinek xebatên ku ez pê dizanim ji aliyê çend kes an jî xêrxwazên zimanê Kurdî ve tên kirin hene, lê li gor salên 1990î kêmtir in. Ji bo weşanxana xwe ez dikarim bêjim ku berê, her sal me di navbera 10-15 kitêbên wêjeyî yên zarokan bi Kurdî diweşandin. Van salên dawî ev hejmar pir hindik bûye.

Di nav kitêbên ku me heta niha çap kirine de pîranî yên ji wergera wêjeya zarokan yên Swêdî ne. Ji folklorê Kurdî me sala borî Antolojiya Çîrokên Kurdî weşand. Ji bilî vê xebatê, me bo nimûne heft kitêbên zarokan li gel kitêbê, bi deng CD jî bi kitêban re weşandin.

Kitêbên ji bo dîrsa zimanê zikmakî yên Kurdî jî hersal sê an çar kitêb jî aliyê weşanxaneyên din ve tên weşandin.●

Mijara kitêbekê çî perwerde û exlaq be, çî jî mîzah û îronî be divê zarokane be

SELMAN DILOVAN

Ji bo ku zimanê dayikê têk neçe divê mirov bi çîrok û kitêbên baş xîtabî zarokan bike. Divê mirov bi tiştên klasîk îktîfa neke û edebiyateke modern jî ji bo zarokan ava bike!

-Divê edebiyata zarokan li ser çî hîman ava bibe û peywendiyên nivîskaran bi zarokan re çî be/çawan be?

-Me pêşî ji bo mezinan dest bi nivîsê kir, me piçûk dan aliyekî. Di edebiyata Kurdî de îro belkî mijara herî qels edebiyata zarokan e. Min bi xwe jî piştî ku zarokên min çêbûn min ev ferq kir. Em di malên xwe de bi Kurdî diaxivin, zimanekî din naxin nav de, ji wan re çîrok û meselokan dibêjin da ku zimanê bav û kalan bi wan şîrîn bibe. Piştî ku zarok dibin 3-4 saflî hingê mirov dibîne zimanê wan mîna ku peykerê berfîn li ber tavê dihele, qels dibe. Zimanên serdest êdî dorê li zimanê dayikê teng dikin. Hevalên wan bi zimanekî biyanî diaxivin, zarokxane/kreş û dibistan bi zimanê biyanî ne. Navê lîstokên wan biyanî ne, gotin, henek, ken û lîstikên wan hemî biyanî ne. CD û kasetên çîrokan biyanî ne, kitêb û kovar biyanî ne, lîstik û alavên wan biyanî ne... Di ser de jî bayê teknolojiyê, hertim kultureke ji me re xerîb dide pêşiya me, ku ji kultura me bêtir bala zarokên me dikişîne.

Herçiqas pedagog dibêjin ku zarok pîrzimanî perwerde bibin baştir e jî, lê di vê pêvajoyê de tadeyî li zimanê qels dibe. Loma jî divê zimanê qels bi çîrok, lîstik, kelemamik, stran û hwd. bikeve jiyana zarokan. Îro zimanê Kurdî jî sed mixabin zimanekî qels e. Ne ku ziman bi xwe, lê bi berhemên xwe yên vî curî ku xîtabî zarokan bikin qels e. Bi gotineke din

zimanê Kurdî di jiyana zarokên me de qels e. Televîzyon, kitêb, kovar, CD û hwd... Jixwe pîrsgirêk ev e: Malzemeyên me kêma in, yê heyî jî rind xîtabî zarokan nakin.

Ji bo ku zimanê dayikê têk neçe divê mirov bi çîrok û kitêbên baş xîtabî zarokan bike. Divê mirov bi tiştên klasîk îktîfa neke û edebiyateke modern jî ji bo zarokan ava bike! Ji bo çêkirina "berhemên baş" pîr tişt divên lê bi fikra min ya herî girîng ew e ku nivîskar zarokan fêma bike, bikaribe bibe zarok. Mijara kitêbekê çî perwerde û exlaq be, çî jî mîzah û îronî be divê zarokane be. Bi taybetî jî zimanê kitêbê divê xwerû û zelal be, peyvên biyanî tê de hindik bin û hevokên xwe li gor muxatabê xwe bin.

Eger mirovek ji bo zarokên Kurmancan çîrokan binivîse û peyvên Soranî bi kar bîne, ezê xatir jê bixwazim. Çimkî divê mirov ne li gorî xwe, li gorî dilê zarokan binivîse, da ku bala wan bikişîne. Eger zimanê çîrokekê ne li gor dilê zarokan be, mijara wê çiqas balkêş jî be, yê zarok jê aciz bibin.

Pîvaneke min ya besît heye: Dema min kitêbek ji zaroka xwe re xwend û hema serê carekê got "yanî çî?"; yan jî bibînim ku hem li min guhdarî dike, hem jî bi tiştêkî din ve dilebike, hingê yan ew çîrok ne li gor umrê zarokê ye, yan jî ew çîrok û bi ser de jî nivîskarê wê ne serkeftî ne. Bi pirranî ihtîmala dawîn rasttir e. Barekî giran e, lê mixabin bêyî van şertan berhemên baş ji bo zarok û ciwanan nayên holê.●

Min bihîstiyê tu qesda seferê dikî*

Mewlana Celaleddînê Rûmî

Ji Farsî: Hayrullah Acar

Min bihîstiyê tu qesda seferê dikî, meke
Meyla heval û hogirekî din dikî, meke

Di cîhanê xerîb î jixwe, xurbet bo te çî!
Tu qesda kîjan xwînîn-cegerî dikî, meke

Xwe ji me medize, ber bi biyanîyan meçe
Bi dizîka tu li kê nezeran dikî, meke

Serûbinbûna felekê ji bo te ye ey meh!
Tu me gêj û xerab û ser û bin dikî, meke

Te çî soz û qerar e? Çî peyman e? Sond çî ye?
Sond û peymanan ji bo xwe sîper dikî, meke

Ka soz û peymanan ku te dabû min ezbenî?
Ji soz û peymanan, xwe serfînezer dikî, meke

Ey ku meqamê te berztir j'hebûn û nebûnê
Ji vî warê hebûnê tu xwe der dikî, meke

Ey ku dogeh û bihişt xulamê emrê te ne
Tu ji bo me bihiştê wek Seqerr' dikî, meke

Di şekeristana te em ji jehrê eyman in
Wê jehrê bi şeker tevlihev dikî, meke

Can bû êtûna agir, ma bo te ev ne bes el
Rûyê min ji firaqê, her tu zer dikî, meke

Wexta veşartî te rû, meh reş bû ji xema te
Qesda xusûfa heyvê, wer israr dikî, meke

Ji xeyda te lêv û dev, hişk dibe ziwa dibe
Çavên me bi hêstiran çima terr dikî, meke

Taqet nîn be j'aqlê te, fêr be rêça aşiqan
Bes êdî şaş û metal, li 'aqil nezer meke

Helawê nadi nexweş, rûgeşî şan wî nadi
Lê wî nexweşî bi xwe, xerabtir dikî, meke

Çavên heramxwarê min, dizê bedewiya te
Ey canê hêjayê diz, li me wer nezer meke

Serî hilde ey heval, wextê gotinê niye
Di bêserbûna 'eşqê de, doza ser dikî, meke

* Mewlana Celaleddîn-i Rûmî, *Kulliyat-i Diwan-i Şems*, (Neşr-i Bediuzzaman Frûzanfer), İntişarat-i Behzad, cild., Tahran, 1329.



Di wêjeya Kurdî de çend çîrokên dersdar

DİLŞAD MÛTÎ

Şûjin

Tê gotin ku di demekê de camêrekî xizan hebû û cîrantiya milûkekî dewlemend dikir. Vî camêrê xizan ava xwe heke pê kerê xwe, heke jî bi milê xwe ji deverek dûr dianî, seba ku bîra avê ji mala wî dûr bû. Wê demê jî av ji dêla firaxên niha, bi meşkan dihate kêşandin. Îcar kurekî milûk hebû û rika xwe dabû vî camêrê xizan. Ji dizîkî ve diçû mala zilêm, bi şûjinekî meşkên avê qul dikirin û av berdida erdê.

Yê xizan dêhn dayê ku meh-wera wî ji ber vê yekê nayê û çû cem milûk û derdê xwe jê re got:

-Ya milûk, wellehî kurikê te li meşkên min ên avê mûselet bûye, çiqas ez ji xwe re avê tînim, diçe bi şûjinekî meşkên avê kun dike û ava min dirjîne erdê. Vêca ez hevî dikim ku tu çareyekî ji vê yekê re bibînî.

Milûk gava vê yekê guhdar dike, gelekî ber xwe dikeve û bi xwe de digome. Ji aliyê xwe tu kêmasiyan nabîne û ji vî camêrî re dibêje:

-Filankes, tu dikarî biçî mal. Emê bifikirin û çareyekî jê re bibînin.

Gava zilamê xizan diçe, milûk bane jinika xwe dike û meselê jê re dibêje. Ji jina xwe re dibêje:

-Hermet ez bi xwe de hesiyam min ji aliyê xwe tiştekek peyda nekir. Tu li cem xwe binêre, ka li cem te tiştekek heye?

Jinik difikire û tiştekek nabîne. Piştî demekî ji mêrê xwe re dibêje:

-Mêriko, bawer im, ez dizanim ev yek ji çi qewimiye. Dema ez bi vî lawikî hemile bûm, ez çûme mala hermetekî û me ji xwe re sohbet dikir. Hin pirdeqal di tepsiyekî de li ser masê bûn. Dilê min gelek çû wan pirdeqalan. Dema jinika xwediyê malê ji bo xizmetekî çû odeyek dî, min jî ji dizî ve bi şûjinekî pirdeqalek ji wan qul kir û ava wê mişte devê xwe. Hebe nebe ev demarê xirabûnê ji wê pirdeqalê ketiyê hundirê lawikê me de.

Tutî

Dibên ku di demekê de ticarekî dewlemend hebû. Ev ti-

car rojekê xwe li ser rêya Hindê kar dike û ji maliyên xwe yek bi yek dipirse, ka çi qewitiyên wan hene. Herkesek daxwazî û qewitiya xwe dibêje. Tutiyekî vî ticarî jî heye, ku dikare biaxive. Ticar ji xwe re dibêje "malava, eve min ji maliyên xwe hemiyam qewitiyên wan pirsîn. Ev tutî jî yek ji mala min e. Bi Xwedê ezê ji wî jî pirsim, hema belkî xwestekên wî hebin." Û ji vî tutiyê xwe jî dipirse, ka çi daxwaziya wî heye. Tutî jî jê re dibêje:

-Filankes, heke tu biçî Hindê, dibe ku tu hin refên teyrikên ji cinsê min bibînî. Ji wan re rewşa min bîne ziman. Bêje ka yek ji wan nikare çareyekî ji min re bibîne. Ev bi salan e, ku ez di vê rekehê de hesîr û hepis kirî, ji dinyayê qut bûyî. Ma çima tu kes ji wan ji halê min napirse û ji bo rihakirina min tiştekekî nakin.

Ticar jî ji teyrikê xwe re soz dide, ku ew vê daxwaziya wê bi cih bîne, heke ew teyrikên ji cinsê wê bibîne.

Ev ticar jî li ser rêya xwe diçe û li Hindê heke mal dikire heke jî difiroşe. Piştî karê xwe jî

qewîtiyên maliyên xwe pêk tîne. Dema di vegeerê de li ser rêya xwe rastî refek teyrên tutiyan têt, kû li ser darekî kombibûn. Daxwaziya tutiya wî têt bîrê û ji xwe re dibêje “Wellehî tutiya min daxwaziyeke wiha ji min kiribû. Ka ez ji van bipirsim û binêrim gelo wê çi bêjin min.” Ticar têt li pêşberî vî refê tutiyan disekine û ji wan re dibêje:

-Teyrikno, min tutiyeke ji cinsê we di mala xwe de heye û vî tutiya min qewîtiyeke wiha li min kiriye. Gotiye; ev çend salê min in, ku ez di qefesê de dîl û girtî me, ka çima tu teyrîkên ji cinsê min tu çareyê ji min re nabînin û xwe di ber min de reht nakin.

Çawa ev zilam ji teyrikan re wiha diaxive, teyrikek ji wan li ser darê dilê wê disekine û ji xwe de dikeve erdê. Gava zilam wiha dibîne, gelekî ber xwe dikeve û ji gotinên xwe poşman dibe. Ji xwe re dibêje “Pehk! Min çi kir. Heft xwezî min negota. Ez bûme sebebê mirina vê teyrîkê...”

Bi dilxemgînî têt malê û di serî de têt cem tutiya xwe. Piştî re tutiya wî jê dipirse:

-Filankes min qewîtiyeke li te kiribû. Ka te qewîtiya min pêk anî?

-Belê min qewîtiya te pêk anî.

-Yanî te teyrîkên ji cûrê min dîtî.

-Belê min dîtî.

-Ê ka îcar wan çi gote te, gava te gazindên min ji wan re anîn ziman?

-Ma wê çi bêjin? Tiştê negotin, lê ez bi gotina xwe gelekî poşman bûm.

-Çima? Çi bû?

-Wellehî, gava min gazindên te ji wan re anîn ziman, teyrîkek ji wan dilê wê di cî de bûrî û ji ser darê got rep û kete erdê.

Gava zilamê ev ji teyrika xwe re got, teyrika wî jî ji xwe de dilê wê bûrî ket. Zilam ji xwe re got; “Min çi bi xwe kir, min mala xwe xira kir. Heft xwezî min qene hema ev tiştê ji teyrika xwe re negota. Îcar ezê çi bikim. Ez bûm sebebê mirina vê jî. Hem ezê teyrîkek wiha ji ku derê peyda bikim.” Bi heft dilê ax û xwezî teyrika xwe tavêjê binê dareke hewşa xwe de û qefesa wê jî bi darê ve dike. Gava ji teyrîkê xwe hinekî dûr dikeve, teyrîk firdide serê darê. Gava zilam teyrîkê xwe wiha dibîne, şaşwazî dibe û ji teyrîkê xwe dipirse:

-Maxa ev te çi bi min kir?

-Filankes, ew bûyera teyrîkê ya te ji min re gotî, ji bo min bû îlham. Min têt deranî ku xilasî di mirinê de ye. Yanî heta mirov xwe nemirîne, mirov xelas nabe.

Dûrbela

Camêrekî hal û wextê wî xweş, demek bi ser de têt û dikeve halê xizaniyê de. Bi xwe maliyên xwe ve têne wê merhelê, ku zad û zewad bi dest wan nakeve û maliyên wî perîşan dibin. Ew jî neçar dimîne û bi gerê dikeve. Di gerê de jî tiştê bi destê wî nakeve. Piştî demekê ev zilam di ber hinekan re diçe, ku bendera xwe hiltînin. Diçe cem wan û dibêje:

-Quwet be ji we re! Camêrno, ez hatime du elb genimê xwe.

Zilamê xwediyê benderê, bi çend kurên xwe ve şaşwazî dibe û dipirse:

-Genimê çi, camêrno? Em te nas jî nakin.

-Çawa hûn min nas nakin? Berî niha bi çend salan min du elb genim bi deyn dabûne we. Wellehî heta hûn genimê min nedin min, ez bela xwe ji we venakim.

Axirî, gotinek ji vî gotinek ji wî, heta zaroyên zilamê xwediyê benderê hêrs dibin û xwe dihelfînin zilamê genimxwaz. Zilamê xwediyê benderê dibîne ku nexweş dibe. Ji xwe re dibêje “bi Xwedê zaroyên min derbena li vî zilamê bidin, hem emê bihetikin û wê serê me têkeve belayê. Ew derbena li me bide dîsê hetk û bela ye. Hema ya baş ew e ku em hêsanî bela vî ji xwe vekin û xêr ji Xwedê.” Ji zaroyên xwe re dibêje:

-Kurên min, ka biseknin. Ez xelet im. Rast e, ku berî niha ez hewceyî vî camêrî bibûm û bi deynê Xwedê du elb genim dabû min. Min ji bîr kiribû.

Û berê xwe dide zilamê û jê re dibêje:

-Filankes, ez hêvî dikim ku tu li qisûra min nenêrî. Maxa yekqet min deynê te ji bîr kiribû. Diviya ez bihatama mala te û min ji te re bianiya. Va te zehmet daye xwe û hatî heta bi van deran. Mala te sed carî ava û tu ser serê min hatî.

Radibin du elb genim jê re dadigrin, li kerika wî dikin û rêdikin.

Dem dibûre û ev camêr dîsa hal û wextê wî xweş dibe û dibe

xwedî mal û serwet. Rojekê du bar fêkî, mewîj û gwîz li ser pişta hespên xwe dike û berê xwe dide mala vî camêrî. Bi pirsê diçe devê mala zilam û li wan dibe mêvan. Ji wan re dibêje:

-Malava, ha va ji we re heqê du elb genimê we. Qenciya ku we bi min kirî ez di heyatê de ji bîr nakim. Hûn camêr in û layiqê her qencyê ne.

Hê ji nû ve camêrê xwediyê malê ji zarokên xwe re rastiye dibêje:

-Zarokno, Welleh tu deynê vî camêrî li me nebû. Lê min dêhn dayê ku belayek jê derkeve. Heku mirov berê xwe ji şer û belayê biguhere, wekî hûn dibînin ew dibe xêr û derdikeve pêşiya mirov. Zilamê bi aqil ew e ku bela bi ser de hat û bikaribe wê dûrî xwe bigre, yan jî xwe dûrî wê bike.

Qenci xwediyê xwe nas dike

Camêrekî extiyar û feqîr hebû, ji xwe re li nav gundan digeriya û diparsî. Yanî bi parse debara xwe dikir. Di ber gera xwe re herdem digot "Kesê qencyê bike ji xwe re dike, kesê neqencyê bike wê jî ji xwe re dike" û ev gotin ketiye ser devê wî û herdem digot.

Rojekê ev zilam hatiye gundekî û ji xwe re dîsa digere. Ji-

nikek gundî li ber tenûrê dîsa dengê vî zelumî dibihîze û hêrs dibe. Ji xwe re dibêje "çî dibêje dîsa ev pîrê heram. Bi xwedê ezê vî jehirdim da hema bela vî ji camêran vebe. " Ev jinik nava nanekî tijî penîr dike û jehra mişkan jî berdide nav de. Nanî dide zilamê extiyar. Zilamê extiyar nanê xwe digre dibe binê tûrikê xwe de û gotina xwe dubare dike.

-Xwedê ji te razî be keça min. Kesê qencyê dike li xwe dike, kesê neqencyê jî dike li xwe dike.

Ev zilam piştî gera xwe ji gund derdikeve û berê xwe dide mala xwe. Dema ku hinekî ji gund dûr dikeve dimeyzêne ku zilamek û zarokê ji çolê ve tîn û li wî diqezidin. Zarok jî gelekî birçî bûye û ji birçiya digrî. Ev zilam ji wî extiyarî re dibêje "xalo Xwedê ji te razî be heke te gezek nan hebe, bide destê vî tîfalî, qey ji birçiya xwe naghîne mal". Zilamê extiyar jî wî nanê ku wê pîrekê li devê tenûrê dayê, dide destê wî zarokî û jê re dibêje:

-Kurê min, Welleh qey ev nan ne qismetê min e, lê yê te ye.

Dema extiyar ji wan dûr dikeve, zarok nanê xwe dide ber geza û di heman demê re tesîra jehrê li ser wî çêdibe dikeve erdê. Zarok dike karr û karr û

kef di devê wî re tavêje. Zilam li nav nanî dinêre û fehm dike ku nan jehirkirî ye. Hema dide pey wî extiyarî û wî digre.

-Hey malmîrat, qey te çî heq li me hebû û tu wî nanê jehirkirî didî destê wî tîfalî? Ev te çima jehir da kurrê min?

Extiyar jî şaş dimîne û dibêje:

-Kurê min Welleh min tu hay ji jehrê nîne. Ew nan li vî gundê hanê xwedîxêrekî bi xêra xwe daye min. Jehirkirî be ne jehirkirî be, haya min jê nîne. Hema min welê berda binê tûrikê xwe de.

Zilam hêrs dibe û dibêje:

-Ka were bide pêşiya min, ka ev çî mal e, da ez bavê wa pişewitînim.

Zilamê extiyar dide pêşiya wî zilamî tevî zaroka jehirkirî ve û wan dibe derê mala wan bi xwe. Ji wan re dibêje:

-Kurê min aha kebanîya vî malê ew nan da min.

Zilam dibêje

-Xalo Welle ev mal mala min e û kebanî jî kebanîya min e.

Kalo dîsa gotina xwe dubare dike û dibêje:

-Lawê min, kesê qencyê bike li xwe dike û kesê neqencyê dike li xwe dike.●

Dapîra Meyremê

HESÊN POLAT

Bavê Meyremê kesekî xanedan bû. Tu caran mala wî bê mêvan nedima. Xwarin û vexwarin, xizmet û azet beşek malbatên xanedan bû. Rast e, tedarikkirina mal û melal gor edetên Kurdan karê mêran bû. Lê xizmet û azet, helandin û dadandin jî li ser milên qîz û jinên malan bû.

Dema berê ne cêran, ne jî alet û makîneyên bi cêranê dişuxuliyên hebûn. Hemû kar û îş bi quweta dest û pîlan dihat kirin. Edetek Kurdan jî ew bû ku mêr û jina herî pîr sermiyanên malê bûn. Ji ber ku kalikê Meyremê çûbû rehmeta Xwedê, li malê mêrê herî pîr bavê wê bû, sermiyanê karên der jî ew bû. Di aliyên jinan de dapîra Meyremê hîn sax bû. Dapîr jinekê pir dîtî û zana bû. Dûv mirina mêrê xwe destên xwe ji îş û karên dinê kişandibû. Sermiyantîya malê dewrî diya Meyremê kiribû.

Dapîrê her çiqas êdî têkilî bi tu tiştî nebûya jî, çavên wê her dem li ser tevgera malê bû. Bi rastî her kesî xatirê wê dizanî û di qerarên xwe yê bingehî de serî li pend û şîretên wê dixis-

tin. Wê jî ferq nedikir navbera piçûk û mezinan, heyana dawiyê gotinên wan guhdarî dikir. Wexta kêmasiyek, an jî şaşitiyek tê de bidîta nêrîna xwe bilêv dikir, wexta nedîta jî “hûn dizanin” digot. Ev peyv nîşana razîbûna wê bû. Wexta bigota “hûn dizanin, çi dikin bikin, ji min re çil!” Her kesî dizanî ku rizaya dapîrê ji bo vê qerarê an jî bûyerê tune.

Meyrem keçek bedew bû. Roj bi roj hev derket, bejn avêt. Bû keçek bejinzirav û jêhatî. Bala hemû xortên der û dorê kişand. Lê baweriya pir kesan bi xwe nebû ku biçin ber derê bavê Meyremê. Tenê malbatek xanedan dikaniya biçe ber derê mala bavê wê. Hêdî hêdî behsa dayîna û xwestina Meyremê dibû. Di wê navberê de dapîr nexweş ket. Nexweşketina porsîpiya malê, behsa zewaca Meyremê paşê exist. Gor edetên Kurdan, dema porsîpî an jî rîsipiyên malê nexweş bin behsa keçxwestin û zewacê şerm bû. Bi xwe Meyremê jî dapîra xwe pir hez dikir. Dema ew biketa navnivîne Meyrem mîna perwane

Meyrem keçek bedew
bû. Roj bi roj hev
derket, bejn avêt.
Bû keçek bejinzirav
û jêhatî. Bala hemû
xortên der û dorê
kişand. Lê baweriya
pir kesan bi xwe nebû
ku biçin ber derê bavê
Meyremê

di dora wê re dihat û diçû, jê re xizmet û azet dikir. Dapîr bi amadebûna Meyremê re pir kêfxweş dibû û jê re dua dikir. Duaya herî zêde dubare dikir jî ev bû:

-Keça min, bextê te vekirî be! Xwedê te nexe ber destên jinek no!

Wê demê bûk bi salan li ba xezûr û xwesiya xwe ser malê diman, cihêbûn mîna şermeke mezin dihat dîtîn. Di malê de jî sermiyanê jinan dapîr an jî diya zava bû. Bûka nû ji bo hemû karên malê ger amadebûna. Jiyan jî aliyê kar ve bi xwe pir zehmet bû. Dema xwesiya bûkê jinek baş bûya jiyan jî baş dimeşiya. Lê dema xwesî jinek nebaş bûya êdî jiyan ne jiyan bû. Dapîrê ev yek baş dizanî. Loma ev duaya xwe ewqas pir dubare dikir.

Mêrê bûkê çer însan dibû bila bibûya di derheqê jina xwe de nedikanî ne baş, ne jî nebaş tiştê bigota. Deng derxistina wî ji bo malbatê şermeke mezin bû. Mêr mêrên malê, jin jinên malê, zarok jî zarokên malê bûn. Di malbatê de ez û tu tunebûn, tenê em hebûn. Her malbatek xwedî şan û şerefa xwe bû. Her kesê malê mecbûr bû ku di nêrîn û kirinên xwe

de şan û şerefa malbatê berçav bike. Dema mirovekî malbatê, xetayeke mezin bikira, ji aliyê malbatê ve tund dihat rexnekirin an jî cezakirin. Dema mirovek malbatê ji aliyê kesên din ve jê re heqaretek bihata kirin, hemû kesên malbatê ji wî re pişt derdiketin û ew diparastin.

Çend hefte bûn ku dapîr nedikanî rabe ser piyan. Roj bi roj diheliya, ji aliyê ve kokimî/pîrbûn, ji aliyê ve jî nexweşiyê mecal jê dabû birandin. Malbatê li gorî îmkanên xwe ew bir li ba pir toxtoran. Li gorî gotin û salixdana nas û dostan toxtor bi toxtor gerandin. Toxtoran jî nedizanî êdî çî bikin. Gotibûn ku bigrin bibin mal, tiştêkî ku em bikarin bikin nemaye.

Dapîrê dizanîbû ku rojên wê jimartî ne. Mîna hemû rojên jimartî ew jî dê rojekê biqedin. Ji lawê xwe re got:

-Kurê min. Ez ji te razî me, Xwedê ji te razî be. Ez naxwazim dûrî mal ruhê xwe teslîm bikim. Ji bo min cihê herî baş li mal e ku li ba malbat û koma xwe rojên mayîn derbas bikim. Ji min re kuncikên oda min ji qesrên xelkên çêtir in. Xwedê çî gotiye, ewê bibe. Ez dizanim ku we jî bo min tiştên ku ji dest we hat, we ew kirin. Min bibin malê!

Bavê Meyremê her tim heyan îmkan tê de bidîta gotinek diya xwe nedikir du. Rast e, ji bo sihheta diya xwe çî ji dest dihat kiribû. Lê dîsan jî nedixwest bêçare diya xwe bibe mal.

Pir di ber xwe re anî û bir, hilanî û danî, tu çareyeke din nehat aqlê wî. Bi xwestina diya xwe kir û ew bir mal. Ji bo diya xwe di kuncikê odê li ber pacê textek danî, nivînên wê li ser textê raxist. Dizanîbû ku her roj qor bi qor nas û dost bîn pirsîn û seradana dayîka wî. Ji ber ku serdan û lêpîrsîna nexweşan di nav gel de wazîfeyek girîng dihat dîtîn û qebûl kirin.

Edetek Kurdan jî ew bû ku kes destvala nedîçû seradan û lêpîrsîna kesî. Herkesî gor quweta xwe helal hazir çî hebûya digirt destê xwe, diçû seradanê. Gora hatina mêvanan ger xizmet û azet jî bihata kirin. Mîna hemû kesên din Meyrem jî di serê sibê heya nivê şevê ji bo dapîr û mêvanên malê amade bû. Ji kaniyê av dianî, mal dimişt, fere dişûşt, sifre dadanî û radikir, solên mêvanan rast dikir û hwd. Ji aliyê ve giraniya xizmet û azeta malê, ji aliyê din ve jî roj bi roj melûlbûna dapîrê, Meyrem bê hal û mecal dixist. Dîsa jî wexta êvaran dapîrê deng lê dikir û digot: "Keça min a delal, ka hinekî were cem dapîra xwe" her tişt ji bîr dikir û diçû ba dapîra xwe, hembêz dikir, cem rûdinişt, duayên wê digirt, destê maç dikir û vedigerî aliyê malê. Ger ji bo razandinê pir dereng neketa, serê sibê dîsa teşqeleya rojê dest pê dikir.

Ji rojan rojek îniyê bû. Pişt banga serê sibê, pêş hildana rojê melayê gund bi dengê xwe yê zîz sela xwend. Hemû guhdar pê hesiyar ku dapîra Meyremê çûye ser dilovaniya Xwedê. ●

Çîroka pîrika Helîmê

RAHMETULLAH KARAKAYA

Di “Herba Umumî” de welatê Serhedê, mîna her derê Anatoliyê, kete nava agirekî giran.

Ûris, ji aliyê Kafkasê dakete heya Mûş û Bedlîsê. Qers, Bazîd, Erzirom, Erzîngan, Xarpêt, Mûş, Bîngol, Bilîs û li Wanê, şerekî dijwar dest pê kir.

Ûris ji aliyekî ve, çeteyên Ermeniyan ji aliyekî din ve di nava şer de bûn. Hemû xort û mêrên Serhedê, ya rastî yên ku destên wan sîleh digirtin, bi rev çûne cephan. Malbat, bi jin û zarok, kal û pîrên xwe ve, koç kirine rojavaya Anotoliyê. Bi hezaran însan, li wê derê ji birçîbûnê, ji neçariyê, ji tunebûnê jiyana xwe wenda kirin.

Dayik ji zarokê, mêr ji jinê, jin ji bav û dayikê veqetiyên. Bi salan ji hev, tu xeber negirtin. Yên şansê wan hebûn, yên li heyatê man, piştî herbê dîsa gihîştine hev. Lê bi piranî, ji ber bayê mirineke bêhempa, li ser erdê winda bûn... Pey xwe mezelek jî nehiştin, ku yek ji wan re Fatîhekê bixwîne. Pey xwe, bi hezaran însanên çavgirî hiştin. Nîfşê ji Herba Umumî û ji Herba

Îstiklalê xelas bûn, heya mirinê, ji wan wendakiriyên xwe re şîn girtin.

Çîroka wan, ji nîfşê nû re gotin, bi saetan giriyan, ax û wax kirin, dua kirin. Ji bo hizûra welat, ji bo serkeftina jiyane, ji bo aştiyê, bi dilekî şewat xwe avêtin ber bextê Xwedê:

“Rebbê Alemîn ê mezin, tu me û welatê me, ji destê dijminan, xwînxwaran, bêwijdanan, çavbirçiyên, heqnenasan biparêze. Saxî û silametiya xwe, hizûra xwe, serkeftina xwe, bereketa xwe, rênasiya xwe, heqşînasiya xwe, ji ser me kêmtir neke. Me ji bin per û baskê xwe mehrûm nehêle!”

Yê li heyatê mabûn, her roj bîst û çar saet, di rêça zar û zêçên xwe yên wendabûyin de dihelîyan.

Kî didîtin, çi dibihîstin, diketin meraqeke bêemsal, wendayîbûyiyên xwe dipirsîn... Ketîbûn rêya zozan û mezra, gund û şehir, yek û yek nasê xwe terîf dikirin, ji wan qasê serê derziyekê be jî, xeber digirtin.

Yek ji wana jî, Mele Abdulhekîmê Cirûna bû... Mele Ab-

Çîroka wan, ji nîfşê nû re gotin, bi saetan giriyan, ax û wax kirin, dua kirin. Ji bo hizûra welat, ji bo serkeftina jiyane, ji bo aştiyê, bi dilekî şewat xwe avêtin ber bextê Xwedê

dulhekîm, lawê Hecî Mele Ebdurrehmanê Cirûna bû... Çirûna û gundê wî yê cîran Nûrs, qasî niv saetê ji hev dûr bûn. Her du jî gundê Hîzana Bedlîsê bûn.

Hecî Mele Ebdurrehmanê Cirûna, seydayekî xwedî medrese bû. Li Serhedê, alimekî bi nav û deng bû. Beddûzzeman Seîdê Nûrsî jî, qasekî kin be jî, li cem Hecî Mele Ebdurrahman xwendiyê. Xweyê du kur û du qîzan e: Mele Eladîn, Mele Abdulhekîm, Rukiye û Helîme.

Hecî Mele Ebdurrehman, pêşiya Herba Umumî diçe ber rehma Xwedê. Merqeda wî, li Miksê ye. Feqiyê Teyran û Hecî Mele Ebdurrehman, li wî mezeli de cîranê hev in. Du lawên wî, di medreseya wî de dixwînin. Lawê wî yê mezin, muntehî dibe û bi navê Mele Eladînê Narê tê nas-kirin. Li Kozluka Sêrtê bi salan miftîtiyê dike. Bi sedan feqiyandide xwendinê. Kalikê rojnamevan û nivîskarê hêja Mahmut Baksî û Lutfû Baksî ye. Mele Abdulhekîm, li Cirûna, li şûna bavê xwe melatiya gund dike.

Herba Umumî dest pê dike. Him Mele Eladîn him jî Mele Abdulhekîm, gazî dîkin eskeriyê. Mele Abdulhekîm, him şûna xwe him jî li şûna kekê xwe eskeriyê qebûl dike.

Xwuşka wan a mezin Rukiye, jina Mele Zahir e. Mele Zahir, feqiyê Hecî Mele Ebdurrehman e. Bi jêhatiya xwe, bi zeka û exlaqê xwe, dikeve ber dilê seydayê xwe. Xelata wî jî, dibe zavatiya wî.

Mele Zahir, jina xwe Rukiyyê, hildide dibe gundê Xoşgeldî ya Mûşê... Mele Zahir

Bi zor û zehmet, diçine Bedlîsê. Li bajar, roj roja qiyametê ye. Qefle qefle esker, komên zarokên ji malbatên belavbûyî mane, ketine rêyeke bêdawî. Birçîbûn, tunebûn, bêxwedîbûn, nexweşî, birîndarbûn, bêdermanbûn mîna baranê bi ser wan de dibare

, bi alimiya xwe û bi Dîwana xwe ya ku di sala 1925an de bi Kurdî, Erebi û Farisî nivîsiye, navdar e. Rukiye Xanim, pîrika min û ya nivîskar û helbestvan Mezher Bozan e.

Xwuşka wan a biçûk Helîme, hê zarok e. Bi dayika xwe û kekê xwe Abdulhekîm re, li Cirûna dimîne. Ku Herba Umumî dest pê dike, Mele Eladîn jî li Qozlukê miftî ye. Mele Abdulhekîm, ser gazîkirina eskeriyê, dike ku dayika xwe û Helîmeyê bibe mala Mele Eladîn. Seba rêyeke bêomêd, haziriya xwe dîkin. Mezelê bavê xwe ziyaret dîkin. Wext tune ku heya bi dilê xwe seba wî bigrin.

Çunkî welat, nava agirê herbê de gerek nepelixe... Şerekî diwar berdewam e. Şev û roj, gerek xebat nesekine. Azadbûna welat, xelasbûna welat, li ser milên şervanan e. Abdulhekîm, ji aliyekî ve ketiyê derdê dayika xwe ya nexweş û xwuşka xwe ya biçûk ji aliyê din ve jî çavên wî, li cephê ye. Naxwaze heval û hogirên xwe, zêde bi tenê bihêle...

Niyeta wî ew bû ku zêde dereng nemîne, dayik û xwuşka xwe bigihîne mala Mele Eladîn. Dikevine rê, niyeta wî ewe ku li ser Bedlîsê re derbasî Qozlukê bibin. Di rê de dayika wî diçe

ber rehma Xwedê. Piştî bavê wî, siya dayika wî jî li ser wan winda dibe. Bêçare, stûxwar di nava agirekî giran de digevize. Seba girînê, seba şînê tu wext nemaye. Gerek bi lez rê bikudîne, bigihêje warê xwe. Xwe zû bi zû bavêje Qozlukê, dê êdî çavên wî, li pişt wî nemîne. Dê Helîmeyê, teslimê kekê xwe Mele Eladîn bike. Heya piştî herbê jî Xwedê mezin e.

Bizor û zehmet, diçine Bedlîsê. Li bajar, roj roja qiyametê ye. Qefle qefle esker, komên zarokên ji malbatên belavbûyî mane, ketine rêyeke bêdawî. Birçîbûn, tunebûn, bêxwedîbûn, nexweşî, birîndarbûn, bêdermanbûn mîna baranê bi ser wan de dibare. Mele Abdulhekîm, Helîmeyê, bi qasî çend saeten emanetî pîrekê dike. Seba hinek karên xwe berhev ke, diçe nava bajêr. Dê paşê bi qeflekê re bikevin rê, herin warê xwe. Heqê pîrekê jî didê ku heya were, da ku li xwuşka wî xwedî derkeve...

Pîrê, piştî ku Abdulhekîm ji wan dûr dikeve, çav berdide boxçika destê Helîmeyê. Boxçikê ji destê wê dikişîne. Vedike, çend perçe zêr û zivên wê dixê berika xwe, hinek tiştên din jî hildide. Helîmeyê, dixê nava qeflekê ku hema dê biskeke din bikeve rê. Bi xwe jî, ji wê derê bi dûr

Helîme, dîsa digihêje bin siyeke germ. Ew Helîmeyê mîna keça xwe, ew jî wan mîna dê û bavê xwe dibîne. Qefleya wan demeke dirêj li Xelata Sîpanê dimîne. Bi mehan li devdora Behra Wanê digerin. Paşê jî derbasî Bazîdê dibin. Bazîd a ku warê Ehmedê Xanî ye

dikeve, rêça xwe winda dike... Ebdulhekîm, karên xwe xelas dike, dizivire wî warî. Lê dinêre ne Helîme heye ne jî jinika ku wî ew emanetî wê kiriye. Li wî alî, li wî alî dibeze, kê dibîne ji wan Helîmeyê dipirse. Pesnê wê dide, bejn û bala wê tîne ziman. Ji pîrika ku teslim kiriye, behs dike. Na na, erd qelişiyê Helîme ketiye hundirê wê. Dinya, bi ser serê Ebdulhekîm re, careke din hildiweşe...

Li aliyekî herba bêwijdan, bi ser de mirina dayika wî, ewa jî jê re dibe kula bêderman. Afet li ser afetê tîn, gerek meriv bibe kevir ancax li ber wî bisekine. Xwîna reş ji gurçika wî tê, du sê roj li devdorê Bedlîsê digere. Dest davêje kî derê, bê bersiv dimîne. Bi dilekî birîndar, dizivire cepha xwe, dîsa dikeve nava şer.

Helîmeya bêçare, dilşikestî xwe nava qefleke hemû xerîb de dibîne. Roj diçin, şev diçin. Li hinek ciyan koç datînin. Ew qeflana, bi emrê Qumandarê Ordiya Rojhilat Kazim Qarabekir Paşa ve hatine çêkirin. Zarên ku di bin enqazê herbê de sax mane, Ordiyê berhev kiriye, xistiye bin per û baskên xwe. Di wê qeflê de, keçikeke neh-deh salî, bala her kesî dikêşe. Çiqas ku fersend dibîne, digihêje ser avê, destnimêj digire. Nimêja

xwe, di halekî ji xwe derbasbûyî de eda dike.

Qumandarê qeflê, xwe nagire rojekê bi Tirkî jê dipirse, lê tu bersiv nagire. Îcar bi Kurdî diaxive:

-Tu çi kes î? Keça kê yî? Çima di nav vê qeflê de yî?

Helîme, pêşiyê xwe dide naskirin.

-Ez keça Hecî Mele Ebdur-rehmanê Cirûna me. Dayika min, çend roj pêşiyê wefat kir. Kekê min ê mezin li Qozlukê ye, yê biçûk jî li cephan şer dike. Xwenga min jî bûka Mûşiyana e.

Paşê, çîroka xwe ya Bedlîsê tîne ziman. Ew û kekê xwe Ebdulhekîm, niyet dikin ku herin Qozlukê mala Mele Eladîn. Lê li Bedlîsê, bêhemd ji hev dûr dikevin. Hevdu winda dikin. Xwe bê hemd di nava vê qeflê de dibîne.

Qumandarê qeflê, ji dil axî-neke kûr dikişîne, bi çavgirî xeber dide:

-Wey mala min ê... Naxwe tu keça seydayê min ê hêja yî. Ji îro pê ve tu keça min î. Çi daxwaza te hebe, derd û elemeke te hebe, mîna bavê xwe, mîna kekê xwe, bêtirs ji min re bibêje. Xwedê mezin e, elbet ew rojên tarî jî dê derbas bin. Emê dîsa bigihêjin jiyana xwe ya bi hizûr, dilgeş, dilgerm, bêtirs û bê miraz...

Helîme, dîsa digihêje bin siyeke germ. Ew Helîmeyê mîna keça xwe, ew jî wan mîna dê û bavê xwe dibîne. Qefleya wan demeke dirêj li Xelata Sîpanê dimîne. Bi mehan li devdora Behra Wanê digerin. Paşê jî derbasî Bazîdê dibin. Bazîda ku warê Ehmedê Xanî ye. Diyarê Mem û Zîn e. Cîranê Çiyayê Agirî yê qedîm e. Bi Qesra Îshak Paşa, bi nav û deng e. Li wir, rojên tarî û zulûmat, hêdî hêdî ber bi xweşbûnê, ronîbûnê diçin. Zarokên qeflê bi derbasbûna salan bejin avêtine, bûne xort û qîzên nûgiha...

Keçên xama, yek bi yek dizewicin. Yê hinekan xwediyê wan tune, wana dibin. Tayîna qumandarê qeflê jî derdikeve Stenbolê. Dixwaze Helîmeyê jî bi xwe re bibe. Bi salan e di nav mala wan de, bûye mîna zarokeke wî. Helîme jî, pir ji wan hez dike. Pir hînî wan bûye. Lê di navê de, sê-çar sal derbas bûbe jî, hê baweriya gihîştina malbata xwe winda nekiriye. Her roj pênc wext di nimêja xwe de, ji bo wê roja bêhempa dua dike. Di dilê wê de ew bawerî tu car natemire:

-Malbata min a hêja, dê mit-leqe bikeve pey rêça min. Dê min sax yaxut mirî bibînin. Ji bo wê baweriyê, ji qumandar efûya xwe dixwaze, bi wan re naçe Stenbolê.

-Ezê li Stenbolê zêdetir wenda bibim. Vira welatê min e. Xwediyên min, dikarin li vira bigihîjine min.

Xwazgîniyên Helîmeyê jî, tu car kêmbûn nabin. Her carê teklîfên wan red dike. Lê îcar

ku qumandar dê here, naxwaze çavên wî li paş bimînin. Dixwaze Helîmeyê bide malbateke nas, ku ew bêxwedî, bêwar nemîne. Di nav xwazgîniyan de, ji eşrafên Bazîdê Sofo Axa jî heye. Sofo Axa, Helîmeyê ji bo lawê xwe Nureddin dixwaze. Kekê Nureddin, xwarziyê Xelîfe Usiv e. Xelîfa Usiv, li Serhedê bi alimtiya xwe, bi helbestvaniya xwe navdar e. Nîşana wan, daweta wan, di nav demeke kin de çêdikin. Helîmeya qîza Hecî Mele Abdurrehmanê Cirûna, êdî bûka Sofo Axa ye.

Jiyaneke nû, mirazekî nû êdî ber wê ye. Sal derbas dibe, diwelide. Zaroka wê ya yekemîn Rabia tê dinê. Pişt re Mihemed Zekî, Elî Riza, Yusuf Ziya û Emîne lê zêde dibin. Dibe dayika pênc zaran. Lê tu carê, çavên xwe ji rêya malbata xwe nagire. Welat, her roj hêdî hêdî be jî tesîra herbê ji ser xwe davêje, dikeve jiyana berê. Helîme, zêdetir dikeve helecane, dikeve hêviyeke bêdawî, bêsebir.

Rind dizane, kekên wê Mele Eladîn, Mele Abdulkêkîm, xwenga wê Rukiye, di pey rêça wê de ne. Mele Abdulkêkîm jî, mîna roja wendabûnê hê jî kuçe kuçe, mezra mezra, gund gund, şehir şehir li pey rêça wê ye.

Bîst sal paşê li Wanê, dîsa mîna her carî ji hinekan re behsa xwenga xwe dike. Camêrek, li Bazîdê, bûkên ku ji qeflan anîne, bi nimêj û taetê tê naskirin dizane.

-Min pesnê bûka Sofo Axa pir bihîst. Di biçûkatiya xwe de heya îro tu carê nimêj û taeta xwe bernedaye, wisa tê digo-

tin. Lê ez navê wê nizanîm. Ji ku derê ye jî, tu melumatên min tune.

Mele Abdulkêkîm, qet wext derbas nake, dikeve rê. Îcar ew jî pir bi omêd e. Nava du-sê rojan de xwe digihîne Bazîdê. Mala Sofo Axa dipirse. Bi helecane diçe ber qonaxa Sofo Axa. Gupe gupa dilê wî, li derî dixê. Xwe dide naskirinê. Armanca xwe dibêje. Ku behsa xwenga xwe ya windabûyî dike, çavên mazûbanan dibiriqin.

-Ya ku tu pesnên wê didî, bûka me ya hêja Helîme ye... Ew zarok jî xwarziyên te ne.

Li dîwanê, coşiyêke mîna firtonê derdikeve. Mizgîniyê didine Helîmeyê. Stêr bi çavên wê dikeve. Her du destên xwe vedike, bi deqîqeyan ji Rebbê Aleman re şukir dike. Minneta xwe, baweriya xwe, hezkirina xwe, teslîmîyeta xwe tîne ziman.

Bîskeke din, ew û kekê xwe Mele Abdulkêkîm, digihêjin hev. Bi deqîqeyan li ber hev disekin û digrîn. Mîna Çemê Muradê hêstir ji çavên wan dirijin. Yê cem wan jî dikevin nava wê helecana bêemsal.

Êdî roj, ji bo Helîmê zêdetir ronî dibe, dibiriqê. Zêdetir bi miraz derbas dibe. Tama jiyane zêdetir xweş dibe, geş dibe. Rojên tarî, jiyana bêdawî, jiyana bêarmanc, ciyê xwe bi hezkirinê, bi hevgihîne re diguhere.

Mele Abdulkêkîm, hefteyekê zêdetir li mala xinamiyên xwe dimîne. Paşê Helîme û du xwarziyên xwe hildide, berê xwe dide Bedlîsê. Diçîne gundê

bav û kalan Cirûnayê. Cirûnaya ku nava darên gûz, sêv, hirmî, hinar, bindeq û rezên tirî de xemiliye. Malbata xwe ziyaret dikin. Diçin ser mezelen dê û bavên xwe, Fatiheyekê didine ser ruhê wan.

Diçin mala kekê xwe yê mezin Mele Eladîn. Bi rojan li wir bi mêvanî dimînin. Hesreta bi salan, bi dilê xwe sar dikin. Derbasî Xoşgeldiya Mûşê dibin. Diçin mala Mele Zahir, xwenga xwe Rukiye Xanimê jî dibînin. Her carê, heval û hogirên wan, devdorên wan digrin. Çiroka wan guhdarî dikin, bi wan re dikevin keserê, bi wan re stêran dirêjin. Ji bo her çar xuşk û birayyan jiyaneke nû dest pê dike.

Roj tê Helîme, bi xwenga xwe Rukiyyê re mirovatiyê jî datîne. Keça xwe Rabiyyê dide xwarziyê xwe Mele Seîd. Ji zewaca Mele Seîd û Rabîyyê, neviyê wî yê yekemîn Mihemed Şîrîn dibe. Di navê de demek dirêj derbas nabe, Mele Seîd diçe rehma Xwedê. Rabîe, bûka xaltîka xwe ya delal, stûxwar dimîne bi lawê xwe re.

Dîsa li Kopê diçe mêr. Îcar jî navê mêrê wê Seîd e û ew jî mele ye. Ji wî jî pênc keçan tîne dinyayê. Her sê lawên Helîmê jî, li medresa xalê bavên xwe, li cem Xelîfe Usif dixwînin. Mihemed Zekî, bi qîzapa xwe re dizewice, du kur û sê qîzên wî çêdibin. Zarên wî niha li Stenbol û Îzmirê dijîn. Elî Riza, dibe hafîzê Qur'anê. Dizewice, dibe xweyî du keç û du kuran.

Pênc sal e li Alaman e. Li wir xebitî û teqawit bû. Yusuf Ziya, dixwîne dibe miellim. Ew jî

xwediyê du kur û keçekê ye. Teqawit bûye. Li Îzmirê dijî. Emîne, xwediyê pênc qîz û kurekî ye. Li Antalyayê dijiya û ti Tebaxa 2011an çû rehma Xwedê.

Roj, meh, sal zû derbas dibin. Zarok dibin xort û qîzên xama. Mezin dibin kal û pîr. Qedera herkesî, mîna Xwedê xwestî rûyê xwe nîşan dide.

Her weha Helîme, di Sibata 1969ê de, mêrê xwe Nureddîn Efendî wenda dike. Pêncî sal berê, bi qumandarê qeflê re naxwaze biçe Stenbolê. Îcar bi mêvanî riya wê dikeve Stenbolê. Du heb xwarziyên wê li Stenbol rûdinin. Zavê wê miftiyê Beykozê ye. Di sala 1972yî de tê li Beykozê, qasî mehekê li mala xwarziyên xwe bi mêvanî dimîne. Paşê dizivire Bazîdê, mala lawê xwe yê mezin. Di Hezîran a 1980ê de jî, diçe ber rehma Xwedê. Keça wê Rabîe, di sala 1989ê de li Kopa Mûşê wefat dike. Lawê wê yê mezin Mihemed Zekî jî di Sibata 1996ê de koç dike alema bêdawî...

Qeder, piştî wefata wan, jiyanê neke nû dixê ber zar û neviyên wê. Merqeda wê, ya mêrê wê, ya lawê wê yê mezin, li Bazîdê cînarên Ehmedê Xanî ne. Zarên wê yê li heyatê ne û neviyên wê jî li Ewropa û li Anatoliyê belav bûne. ●

‘Hesretê dewi

Quda Arxwasî

Arêdok: Recep YİĞİTBAY

Ez,
 Dîyardê tuwêrandê xwuya bîyayê,
 Bandê xwu sero ronîştayê,
 Mî rêştaya xwu birêştayê,
 Rêştaya mî erqî resayê,
 Mî fina kaş kerdayê dîyar,
 Mî pêlekê xwu tuwêra kerdayê,
 Mî cirê çîzikên virastayê,
 Tasa xwu veranayê,
 Mî firr kerdayê doyê xwuyo honko ze vewr,
 Seyda tuwêrandê di ronîştayê ez.

Sibat 2011

henasa cinan ez girtim

Kamran Simo Hedilî

xatirxwestina çavên te
 roj di nava min de veşart
 şev kire
 vizîna guleyên bêhnxwîn
 ewrên giryok
 heyva evîndar radimûsin
 rê mîna laşên kuştî
 li peyî te dirêjî bûn
 çavên min
 di reşkonê tarî de hatine çarmixkirin
 zebaniyên şadîkuj
 mirinê li ber serê min şîr didin
 bi siya bêdeng
 dil giraniya jana çîyan hilgirt
 nalîna hişê min hişiyar kir
 henasa cinên tîrsê
 di tenêtiyê de ez girtim

16.07.2011

Vîdono

AHMET GEMÎ

Gundê ku Cengo lê jiyana xwe didomand li qontara çiyayê Sîpanê Xelatê bû. Gundekî mîna hemî gundên der û dorê bi Kurdewariya xwe ve dihate nasîn. Jiyana bi cotkarî û malxwedîkirinê pêş de diçû. Gund û şênîyên wî bi xwe rind bûn lê tovên ku Bekoyan reşandibûn şax vedabûn û cehalet û dek û dolab tê de pir bûn. Mirîşka cîranan li ber çavên cîranan qaz xuya dikir û kesekî hez nedikir ku dû li ser kuleka cînarên wî hîlbikişe.

Şevên payîz û zivistanan pir dirêj in. Çawa ku mezinan gotiye “şevên kanûnan tir û fisên meymûnan...” ango şevên dirêj û tarî. Gundî di van şevên dirêj de li malekê kom dibûn. Çîrokbêjan bi dor, ji wan re çîrok, cengên Hezretî Elî û Rostemê Zal, Kela Dimdimê... digotin. Gundîyan şevên xwe wiha didomandin. Rojên xwe jî di bin serma û seqemê de li ber dirûnga pez an jî bi leyîstina topa daran/beyzbol ve derbas dikirin.

Rojek ji wan rojan mirovek nenas li gund hêwirî. Wêneyeke gurgekî li ser roze-

teke hesin kolandî bi pêsiira wî ve hilawestîbû. Bi meş û tevgera xwe ve xuya bû ku ne ji wê herêmê ye. Torbeyek li pişt û çend benîşt, şe, mûçing... tê de bû û wiha gazî dikir: Gundîno, malîno ez çîrokan dikirim, kesekî ku çîrokên xwe bifiroşe heye an na!... Ji bo gundiyan ev fersend bi tu awayî bi dest nediket. Tev de ber bi wî mirovê nenas beziyan. Ji bo rêza pêşîn hev dehf dan, ji hev re sixêf gotin. Çîrokir bedel çîrokan mînak Mem û Zîn, Siyabend û Xecê, Mendol Axa... şe an jî neynikek, ji bo çîrokinê fena Eloyê Newêrek, Kumsor û Rovî û Gurg... jî benîştekan dida! Çîrokir bi vî awayî torbê xwe tije çîrok kir, berê xwe da oxirê piştta xwe da felekê û çû.

Êvar hat û gundî fena her caran dîsa li hev kom bûn. Piştî henek û laqirdîyan ji Husoyê çîrokbêj re gotin ku bila çîrokekê bibeje. Huso wisa dest bi çîrokekê kir: Carekê ji caran rehmet li dê û bavên hazir û guhdaran. Carekê ewkek hebû, ewkek... çikek hebû!... gundîno malxerabno min çîrokên xwe ji bîr ve

Gundîno, malîno
ez çîrokan dikirim,
kesekî ku çîrokên xwe
bifiroşe heye an na!...

Ji bo gundiyan ev
fersend bi tu awayî bi
dest nediket. Tev de
ber bi wî mirovê nenas
beziyan. Ji bo rêza
pêşîn hev dehf dan, ji
hev re sixêf gotin

kirine! Welleh tu tişt nayêne bîra min! Bila yekî din bibeje! Qaso, Heso, Simo... gundî li xwe varqilîn ku çîrokir çîrokên wan tev de kirîne. Ew bê çîrok û bê hiş hiştine. Ji wê demê şûn de ji wî gundî re wiha hate gotin: *Gundê Çîrokîroşan!*

Cengo di vî gundî de çavên xwe li jiyane vekiribûn. Mirovekî mildirêj û navmil pahn bû. Birû kêş û enî fireh bû. Xurt û li ser xwe bû. Dema biketa sergovendekê heta bîst mêr newestanda ji wê sergovendê dernediket. Halê wî yê maddî jî baş bû. Debara zar û zêçên wî rind bû. Çend serî dewar, sî-çil heb miyên wî û nêzî gund jî axpîneke wî hebû. Bi kurtasî, jiyana Cengo xweş bû.

Lê di wê heyamê ku Cengoyê jiyaneke baş tê de bidomanda êş li Cengo peyda bû. Cengo çû ser dixtor û hekîman; vir de geriya wê de geriya û encam bi dest xist ku ji wê nexweşiyê re pençeşêr dibêjin. Cengo derzî li xwe xistin û antîbiyotîk xwarin, pûng, sping, kereng, xirabeng... lê tu feyde bi dest nexist.

Dermandarekî jê re got ku ger tu guhê kerekî jê bikî û xwîna wê vexwî tu yê baş bibî. Cengo rahişt kêra xwe yê ku Hecî Kemalê rehmetî jê re ji qilochê gamêş û perçek tirpana şanîşan çêkiribû û ber bi girikê keleş ve çû. Kerê boz girt û guhê wî jê kir. Istekaneke tije xwîna sor û gevez kir. Şûnde vejeriya... ew tediwiya han jî bi kêrî tu tiştî nehat. Dawiya dawîn pîrejînekê ji Cengo re got ku hemama pincarê dê jê re bibe şîfa.

Pismamekî Cengo hebû. Navê wî Biro bû. Bejnbilind bû. Tiliyên wî qalind û dirêj bûn. Zexm û xurt bû. Pirça bêvilên wî mîna du firçeyên rihkurkirinê seqitîbûne ser simbêlên wî yên boq. Timî kolozekî Rûsî dida serê xwe û di nav gund de fort didane xwe û digeriya. Ne tenê mirovekî xwenenas bû, Xwedênenas jî bû. Kêrn fersend bû. Lê pir sînsî/kone bû. Dikaribû sed cûcîkên cûlixan di bin xwe de veşêre û haya kesekî jê nebe. Ji ber wê pexîliya wî gundiyan jê re "Kerose" digotin.

Kerose bi nexweşiya pismamê xwe ve jî bilî dibû. Lewre ew û Cengo hevalê hev yên man û nemanê bûn. Kerose ji bo hema-pincarê jî Cengo re vîdonekî mazotê ê ku nêzî sed litreyî hildide anî û aliyekî vîdon vekir. Vîdon tije ava kelfî kir û hinek catrî, selemesk, rihan hûr kir nav wê ava kelfî û Cengo kir nav wê ava ku bêhnên têvel jê difûriyan. Paşê textek da ser devê vîdon, kulavekî koçerî li ser text raxist û li ser rûnişt. Cengo di nav avê de germ bû paşê jî cendekî wî nerm bû. Bêhn lê çikiya. Li text da, gazî û hewar kir lê Kerose xwe lê danenî. Piştî demekê Kerose li xwe varqilî ku pismamê wî yê xoşewîst di hemamê de ye. Zûtirîn wext rahişte text. Text hilanî dît ku pismamê wî bêrih û can di vîdon de vezeliyaye!

Li ser vê bûyerê gundiyan ji Cengo re "Vîdono" gotin û dema ku ji zarên wî re jî bidana çîran wisa digotin: *Zaroyên Vîdono! Em gora Vîdono de...* ●

Gul

Yılmaz Yalçın

gul ji min dûr çûye,
di dil de nêz bûye.
li xerîbiyê pel daye
strî di dilê min de maye.

ji bîrkirina gulê
bîranîna dilê min e
hêviya min nemaye
dil dîsa bi gulê ve ye

gul rêwî bû
di evîna dilê min de
her dem mêvan bû
di qesra çavê min de

ji ber çûyîna gulê
mêvanê çavê min bûye xwîna
spî
rêya dil de şilî sor dibare

Vajeya didîy

BEDÛZZEMAN SAÎD NÛRSÎ

Açarnok: Şaban Şenates/Meymandar

Bîsmillahîrra'hmanîrra'hîm

الَّذِينَ يُؤْمِنُونَ بِالْغَيْبِ

Eger ti qayîlê îmanî di çî se'adet û re'hmetêndo gird, ew çî tam û rehatyênda bêteri bivînê, biewnî nê 'hîkayedê temsîlîra û goşdarey biki:

Wextêra di merdimîy hem qandê kêfî, hem jî qandê tîcaretî kewnê ray û şînê seya'hatên. Înanra jew xwodbîn û bêtalîh bî şî kiştên. O bîn jî xwudabîn û bextîyar bî, şî kiştâ bîni.

Qando ki merdimo ki xwodbîn hem xwodgam, hem xwodendîşo, vera cerîmedê bedbîneyda xwu, xwu çîman di guneno welatêndo bol xrab. Nê welatê ney di hergi merdimê 'acîzîy û bêçareyê zor û zodareyda nê zaliman dest di haho kenê. No merdim, hergi ca û geyrayîşdê xwu di wina 'halê axîn û waxîni vînen. Welat, pêro kewto şîklêndê şînxaneyêndê umûmî bin. Bixwu jî qando ki no halo çekûdaro biçîle cira nêaso, bêserxoşey tey çare nêvînen. Çîki herkeso cira dişmen û x erîb aseno. Ew çoşmanra jî cenazanê bixofan û sêkuranê bêomidan bermî di vînen. Wijdîyanê ci, ci 'ezabî mîyan di verdano.

O bîno xwudabîn xwudaperest bî, heqendîş bî, ew whêrê xulqê hera û rindî bî. Xwu çîmî di kewno welatêndo bol weş. Îşte no merdim hergi ca di, hergi geyrayîşdê xwu di şênayênda şên û umûmî vînen. Hergi ca di şabîyayenên, hergi ca di kormişkanên, hergi ca di mîhrîcanên, hergi ca di zîkr û cezbexaneyên, ew hergi ca di roşanêndo şêno umûmî vînen. Herkes cirê xerîbdost, herkes cirê merdim û merdimşînas aseno. Welatî 'hemî di vatenanê "coydar bê û berxwudar bê"yan aşnaweno, ew cira terhîsatêndo umûmî aseno; 'heme ca di bi şênemegîya tehîlî û tekbîran vero vengê niqaran û zirnayan û lûlîyandê oxir kerdena eskeran aşnaweno.

Bêtalî'ho siftekên hem vera qehr û qotikandê xwu, hem jî vera qe'hr û qotikandê şarî qehrêno. Laberê no merdimo bextîyar hem vera şabîyayenda xwu, hem jî vera şabîyayenda şarî şa beno. Ew hem boya xwu hera keno, hem jî tîcaretêndo weş kewno ci dest. Ellahdê xwurê şukur keno, dima ageyreno raştê merdimdê bînî yeno, cirê vano: "Yahû ti

Dima aqîlê korbextî ame ci ser, poşman bî, va: "Heqqeten ez bîbîya dîwane, ez bîbîya xînti! Ellah tora razî bo ki, to ez 'halêndo ce'hnimîra reynaya."

bîyê ze dîwane! Xirabeya ki to pîze da, daya to rîro; huwaten û kêfweşey aya torê bermî, ew terhîs jî oyo torê virran kerdîş û talan bîyayîş aseno. Aqilê xwu arêdi xwu ser, qelbê xwu safî ki. Ta ki no perdeo bimûsîbet to çîman verra wedarîyo, ti raştî bişê bivînê. Heqqeten welato ki Melîkê ci son'hed 'Adîl bo, mer'hemetkar bo, besteperwer bo, dûzanperwero muqtedîr bo, ew muşfîq bo zêdê şîkdê toyê wehmî xirab nêbeno. Hem welato ki tey eserê averşîyokîy estîy bê û averşîyokeya ci çîman vero bo, zêdê asayîşdê toyê wehmîkarî nêbeno û nêaseno."

Dima aqilê korbextî ame ci ser, poşman bî, va: "Heqqeten ez bîbîya dîwane, ez bîbîya xîntî! Ellah tora razî bo ki, to ez 'halêndo ce'hnimîra reynaya."

Hey nefê mino kor! Bizani ki o merdimo siftekên kafiro. Yan jî fasiqêndo cahîlo. No dinya, çîmandê ey vero şînxaneyêndo umûmîyo. Ey çîman vero coydar, o sêkuro ki sîllandê abirîyayîşî û vinî bîyayîşî vero oyo tim bermeno. 'Heywan û însan jî o 'ewareo ki lepanê 'ecelî bin di oyo tim parçe beno. Mewcûdato ki girdo û zê ko û dengizano jî ey çîman vero cirê zêdê ze cenazandê birîh û bixofîyo. Ew hewna zêdê nînan, ewhamê cîyê canxraş û cankeşê ki ci 'helênenê, kufr û serşîyayenda cira vijênê, bi manewîyeta ci încîraxî kenê.

Merdimo bîn jî mumîno îmandaro. Cenabê Heqî şînasneno, ci tesdîq keno. Çîmandê ey vero no dinya, zîkîrxaneyêndo rehmanî, te'hlîmgehêndo beşerî û 'heywanîyo. Ew meydanê

îmtî'handê îns û cinnîyo. Eyrê mergê înasani û 'heywanî jî pêro terhîsêno; kê ki wezîfeyê coyde xwu dî û ard ca, do bi şênemegîya, bêqehr û bêfelaket, bi şabîyayena nê dinyadê fanîra şîro adîniya heqîqî; ta ki ê wezîfedarandê bînanrê jî ca abîyo, ê jî bêrê nê meydandê îmtî'hanî di bixebitîyê û wezîfeyê xwu bîyarê ca. Zayena 'heywanî û dinya amîyayena beşerî jî pêro riştena eskerey û wezîfedê înana, ew sîle'hî bin kewtişê cîyo. Coydar (zî'heyat) pêro eskero, wezîfedaro, mesrûro, şabîyayeo, ew me'hmûro serraşt (misteqîm)o razî bîyayeo. Veng jî pêro, yan zîkr û tizbeantişê destpakerdenda wezîfî, ew şukr û oxînîna ki paydosîra yenoyo, yan jî delaleya kar kerdîşîya.

Nezêdê ê mu'mînî di mewcûdat (bîyaye) 'heme Seyyîdê Kerîm'î û Melîkê Re'hîm'îrê dostêndo xizimkar, dostêndo me'hmûr, ew kitabêndo şîrîno. Hewna zêdê nînan xeylên îmanê tamweşîy û gandarîy û coydarîy û boyweşîy îmandê eyra herrikênê, vijênê teber û gan danê ci.

Dêmax kî îman, xwu mîyan di dendikênda Tûba'ya Cennetî'ya manewî çarneno, ew kufir jî xwu mîyan di toximê Zeqqumê Ce'hnimî'yo manewî nimneno.

Dêmax ganweşey û silameteşî sîrf Îslameteşî û îmanî da. Madamo ki winao, gereg ma jî tim û tim vajê,

الْحَمْدُ لِلَّهِ عَلَى دِينِ الْإِسْلَامِ وَ
كَمَالِ الْإِيمَانِ ●

04/05/1999

Payîz

Jiyan Ahmed

Çû

Xewnên zarokatîyê

Payîzê pelên xwe raxist

Ne li kolan û daristanan

Hew li goristanan

Dengbêj rawestîyan

Nema bêhn nema nefes

Kesî behs jê nekir

Her tişt bû xewnek

xewnbiroj

Kî hebû kî tunebû

Havînê barê xwe hilanî

Û berê xwe da payîzeke

renghezîn

Hew stran man li ser

zîmanan

Di rengê ne-şahiyê

Deng sivik bû guh giran

Dem bû payîz

Li hemû sûk û sûkakan

Me kalemêran jî êdî

Ji ber vê yekê qey

Berê xwe da goristanan

Memo, her biji (*)

M. EMİN BOZARSLAN

Xwendevanên hêja,
Min ev helbesta xwe ya bi navê “MEMO, HER BIJÎ”, tam 50 sal beri nuha, di payiza sala 1961’ê da nivisibû.

Wek ku tê zanin, şorişa gelê Kurd a Kurdistanê Başûr, di binê serokîya pêşwayê mezî Mîstefa Barzanîyê nemir da, roja 11’ê Îlona 1961’ê dest pê kiribû. Ew şoriş demeka kurt paşê, bi navê “Şorişa Îlonê” hat naskirin û bi wi navî di nava gel da û di diroka Kurdistanê da ci girt.

Pirr baş tê bira min. Despêkirina wê şorişê, li Kurdistanê Bakur di nava welatevînan Kurd da hem çêkirin û kelecaniyeka (heyecan) gelek mezî çêkir, hem ji jî hêviyeka gelek mezî ra rê vekir.

Yek ji wan welatevînan Kurd ji ez bûm.

Hingê di heqê rewşa dinyayê û siyasatên dewletan da tecrîbeyên me pirr tunebûn. Me wisa hêvi û texmîn dikir ku, dê Kurdistanê Başûr hema di nava 4- 5 salan da rîzgar bibe û bigije serxwebûnê û dê li wi beşa welatê me dewletê Kurd a serbixwe bê sazîkirin, Serokê mezî Mîstefa Barzanî ji dê bibe Serokomarê Kurdistanê.

Demeka kurt piştê despêkirina şorişê, ilham hat dilê min ku ez li ser mîrxasi û fêrîsiya eskerên Kurd helbestek binivisim û pêşniyaz bikim ku ew helbest bibe “**Marşa Leşkerê Kurdistanê**”. Her wisa, ez fikirim ku pêşniyaz bikim ku navê “Memo”, ji bo her eskereki Kurd bibe nişan û sembol. Yanî min xwest ku ji eskerê Kurd ra “Memo” bê gotin û ew nav ji hemî eskeran ra bibe nişan û semboleka mûştêrek.

Bi wê hêviyê û bi wê daxwazê, piştê ku min ev helbest nivisî, min di dilê xwe da niyet kir û biryar da ku piştê serxwebûna Kurdistanê Başûr,

ezê bi awayek biçim wir û xwe bigihinim pêşberê baregaha (qerargah) Serok Barzanîyê mezî û li wir ji karbidestî tîka bikim ku min bibin huzura wi, da ku ez vê helbestê yekser bîdim destê wi bi xwe, wek diyariyek ji wi bi xwe ra pêşkeş bikim û jê tîka bikim ku vê helbestê bikê “**Marşa Leşkerê Kurdistanê**”, da ku di merasimên neteweyî û eskerî da bê xwendin.

Min dizani ku Serok Barzanî dê bi meşandîna kar û barên dewleta Kurd gelek meşxûl be. Lê min di dilê xwe da wisa danibû ku eger pêwîst be, ezê li pêşberê baregaha wi demeka pirr dirêj bîminim û sebîr bikim, heta ku çend deqîqe dema wi hebe û destur bide min ku ez biçim huzura wi û vê helbestê ji cenabê wi ra pêşkêş bikim.

Lê belê gelek mixabîna ku ew hêviya me nehat ci û nebû rastiyek. Yanî Kurdistan rîzgar nebû û negîha serxwebûnê. Serok Barzanî ji 18 sal paşê, di sala 1979’an da wefat kir. Ev helbest ji li min ma û ma. Nuha bi ser nivîsina wê ra tam 50 sal dem derbas bûye. Bi peyveka di, helbest nuha bûye 50 salî.

Nuha hem bi munasebeta salvegera 50’yî ya Şorişa Îlonê, hem ji bi munasebeta sala 50’yî ya nivîsina vê helbestê, min xwest ku ez vê helbesta xwe ya 50 sale, di rûpelên “**NÛBIHAR**”a hêja da bîdim weşandin û bi wi awayî, wê hem ji xwendevanên berrêz ra, hem ji jî raya giştî ya gele Kurd ra wek diyariyek pêşkêş bikim.

(*) Ji ber ku M. Emin Bozarslan tipên “î”yê û “i” yê bi kar nayne, lê tipên “î”yê û “i” yê bi kar tîne, em li ser daxwaza wî, vê nivîsara wî û helbesta wî ya jêrîn, bi wan tipan diweşînin.
Nûbihar

Ez hêvidar im ku helbest hem ji aliyê raya gîştî gele Kurd ve bê ecibandın û wek diyariyek bê qebûlkirin.

Mın divê ez vê yeke ji bîdım zanın ku, ev helbest heta nuha dı çu weşanek da nehatiye weşandın. Ev cara pêşin e ku dı rûpelên “NÛBIHAR” ê da tê weşandın û digije pêşberê xwendevanên Kurd ên hêja.

Ez dixwazım vê yekê ji bı taybeti bîdım zanın ku, ez bı xwe ne hozan im û çu iddiayeka mın dı hozaniyê da tune; kare mın ê esli ji ne nivisina helbestan e. Lê belê heta nuha carna bı hın munasebetan, ilham hatiye dilê mın û mın hın helbest nivisine. Çend ji wan dı hın kovaran da hatine weşandın, lê pıraniya wan heta nuha nehatine weşandın.

Dibe ku dı pêşedemê da ez hemiyan bigihinim hev û wek berhevokeka biçûk bîdım weşandın, da ku bigijın destê xwendevanên Kurd. Lê bele ji ber ku gelek karên dı lı ber destê mın hene û bernama mın bı tevayî dagırtı ye, nuha qet fersend û mecala mın tune ku ez helbestan ji çapkırınê û weşandınê ra amade bıkıım. Ez hêvidar im ku dı pêşedemê da ez fersendeka wisa bıbinım û bışêm wi kari pêkbınım.

Digel sılavên germ û daxwazên baş ji hemi xwendevanên birêz ra û bı gıştı ji tevayiya gelê Kurd ra. ●

(1) “Memo” dı vê marşê da nişan û sembol e ji bo her eşkereki Kurdistana azad, her ferdeki leşkerê Kurdistana azad, her çekdarek ji çekdarên dewleta Kurd. Hozên dı dema nivisina vê marşê da, hêvi kirıye ku Kurdistan rızgar bıbe û bı wê hêviyê ev marş lı ser eskerên Kurd nivisiye.

Leşker: Tevayiya hêzên çekdar ên eskeri yên dewletek yan vêkxıstınêk, digel hemi ferdên wan û hemi tıştên wan ên ku ji bo karaniye pêwıst in.

Ev peyvık hevmana “artes” a Farsi, “ceyş” a Erebî û “ordi” ya Moxolı ye. Ehmedê Xani dı “Nûbuhara Biçûkan” da weha ci daye vê peyvıkê: “Ceyş û heşem çi? Leşker

e; esra, bı şev lı rê bir/ Basıl, cıwamêr; û nijde, serıye; qeyl-ı, mir e”.

(2) **Payıvan:** Kesê ku payına kesek, ciyek yan tıstek digire û wi kesi, wi ciyi yan wi tıştı dipê, diparêze. Yani nobedar.

(3) **Mıl:** Beşê axê ye piçek bılınd. Lı vır mana peyvıkê ev e.

(4) **Mınal:** Zarûk.

(5) **Agri:** Çiyayê Agri.

(6) **Pate:** Sılava eskeri. Ev peyvık tım digel kıra-ra “avêtin”ê, digel fı’la “avêtin”ê bı kar tê anin. Wek “pate avêt”, “pate davêjê”, “dê pate bavêje” û wd.

(7) **Çıku:** Lewra; çünki.

Memo, her biji

Marşa Leşkerê Kurdistanê ⁽¹⁾

Tarixa nivisina marşê: Payız, 1961

M. Emin Bozarslan

Bı xwina şehidan newal bûn tiji
Bı wê, serxwebûna welatê’m diji
Memo daye ser mıl tıfinga tiji
Dıparêze axê, Memo, her biji

Bı xwina xwe azad me kır niştıman
Memo çekbıdest, va ye bû payıvan ⁽²⁾
Heta dom bike ev zeman û cihan
Biji, her biji, tu Memo, her biji

Welêt tım minetkar e bo te Memo
Sılavên şehidan ji bo te Memo
Jın û mêr bı hêvi hemil’te Memo
Dınêrin, dibêjin Memo, her biji

Te xwina xwe rêti lı çal û mılan ⁽³⁾
Te singê xwe amanc kırı bo gulan
Dı destê mınalan da qevdên gulan ⁽⁴⁾
Dıdın tew dibêjin Memo, her biji

Dilê dijmanan wa te ler’zand ji tirs
Jı Kurd ra te got “Ez heme, tu metırs”
Bı serbesti tım em dıkın peyv û pırs
Bı xêra te ye ev, Memo, her biji

Te Alaya Rengin bılınd rakırı
Dilê milletê Kurd bı wê şa kırı
Dıjin serbılınd em weki Agri ⁽⁵⁾
Şev û roj dibêjin Memo, her biji

Bı rêzdari sek’ni-w te çek daye mıl
Jı Alayê ra pate avêt ji dil ⁽⁶⁾
Tune qet ji bona te amanc ji bil
Welet û netewe, Memo, her biji

Geli keç û xortên welêt, tev werın
Bı serbesti pêş ve hemi em herın
Tune qet ji bona gelê Kurd mırın
Çı ku nobedar e Memo, her biji ⁽⁷⁾

Mûraya sîya

Ömer Faruk Çetinkaplan

-Ka'bi rê-

Neqşê nimazgeyan dê ma
Qeçekîn da xwura silasnena
Olandê ma di menzerênda qedîm
Xalidêsan sero ma qarşuwa
Qulbe dê odan dê maya

Mûra(ya) sîya
Gîlîya çiman dê mu'mîna

Kitabî qalê to kenê
Ziwanê hecîyandi ti estê
Heybetê to, zerî dana kê
Zemzemê to şîfa
Hacer-ul Eswedîra boya Cennetî yena

Tarîxandi qalê to beno
Qeralê Yemenî Tubba' mektûbên nûşneno Nebî rê
Hewt qirnî kewnê per bi per
Eba Eyyûbî ra mektûba xwu wazeno pêxember

Ka'bi rê pirênê xelat keno Tubba'
Mûra(ya) sîya xwu hadre kena
Qandê Resûlullahî
Pirênê xwu dana xwura
Verê hewtsey ser

Roj yeno
Ka'be newedera virazyeno
Hacer-ül Eswedî ser lej kenê 'eşîrî
Resûlullah kewno mekan
Her çî beno âsân

Mûra(ya) sîya
Roşna çiman dê mu'mîna

Verî hewnên vînena
Kêberê to abyeno
Kewna ray
Mu'mîni zey pilpîlikan perrenê vera to
Nûrê to zey rojya çerx beno daim
Mu'mîni xwu erzenê nûrdê to

Pêlên do nûranî herikyeno
Her mu'mîn jew pêlê
Jew mojê

Bindê dêstê to di jew pisingêna
Tebera menda
Geyrena kêberê to
Destveng meaçarni

Mûra(ya) sîya
Roşna çiman dê mu'mîna

Heyran heyran temaşe dê to dê mu'mîni
Ey Beyta Qedîm
Ey şahidê Fahr-ul Alemîn

To vero heqaretêy bi Nebî rê
Fatîma xwu resnê pêr dê xwu
Hêrsê çima varnay war

Fatîma veşê
Ka'be veşê
Hacer-ül Eswed sîmsîya

Sereyê Ebû Zerî şikya
Kebaîrî virazyay

Ti
Şahidê însana
Şahidê heme zemana

Rojên da newê akewna
Resûlullah nimaz keno vera To
Gulî abyenê to dêsandi
Mûra(ya) Sîya
Bextê to bi Nebîya abiya

Mûra(ya) Sîya
Mîrcana jutenya
Roşna çimandê mu'mîna

Xewn

MURAD POLA

muradpola@gmail.com

Kula zaroktiyê bû di dilê wî de. Bibû hîtekî mezin û tebatî nedidayê. Çi çax tena serê xwe dima, ji kar û barên rojane aciz bibûya, bigota ez hinekî westa xwe deynim, li ser pêşeroja xwe bifikirim, a mîratê ew kula wî dihat dikete bîrê, dilê wî diêşand, nedihîşt tiştê ber re derbas be û here. Ewê birîna bê xwîn hemû tişt li ber wî reş kiribû, ne jin û zar, ne mal û milk û ne jî nav û dengê dunyayê, seba wî kêfxweşî û ji bo wê kula xedar derman bû.

Sibê şevqê rabû, dema ji xew hişyar bû hê malîya wî ranebibû, hêdfîka ji nav nivînan derket, destnimêja xwe girt û nimêja sibehê kir û paşê çû deng li malîya xwe bike, lê kete bîrê ku ew ketiye kincan. Loma kerr di paş de vegeyriya jûra rûniştinê, li ser maseya xwe, ew tiştên xwe yên her roj bi xwe re digerland, tîlefona destan, laptop û ew pirtûka teze dest bi xwendinê kiribû hildan xistine çenteyê xwe. Ya rastî dilê wî hebû taştêyeke muhkem bixwe, lê qêmiş nekir malîya xwe ji xewa şîrîn hişyar bike. Îro kêfa

wî li cih bû, dê biçûya hevalekî xwe yê berê ê dema zaroktiyê bidîta. Hevalê wî piştî mektebê dest bi ticaretê kiribû û îro şirketa wî ya bi karê tekstîlê re mijûl, li gelek welatan şax vekiribû. Ji ber vê pêdiviya hevalê wî bi kesên nas û pêbawer hebûn da ku karê xwe bispêrê û piştî xwe pê germ bike. Lewra merivên xwe-mal nikaribûn xwe bigihînine her derê. Cava wî hevalê xwe li welat dîtibû, li ser van meseleyan hinekî peyivîbûn û dê ew ji bo şaxa wan a li Rûsyayê vebe birêve bibe bişanda wir. Heke ev kara bibûya vî qaydî wî him dê bikaribûya li Rûsyayê karek bidîta da ku bikaribe debara mala xwe pê bike û him jî seba xebatên li wir yên li ser Kurdolajiyê bibûya derfeteke nedîtî, ji vê şûnda li wê derê bimeşanda. Lewra ji çend sedsalan vir ve ye gelek berhemên Kurdî li wir dihatine xwedîkirin. Wekî navendeke sereke ya Kurdolajiyê dihat qebûlkirin. Heke lê bihata û ev kara bidest bixista, dê zimanê Rûskî hîn bibûya û him jî dê ew merema xwe bianiya cî.

Çaxê li qadê çaran ber derê pola rawestiya, hinekî bi kelecana bû. Pêlî zengila dêrî xist û rawestiya. Derî vebû û xortekî ew pêşvazî kir û derbasî hêla mêvanan kir.

Dema ji mal derkete derve pêrgî cînarê xwe yê li xaniyê hember rûdinişt hat, bi serê xwe silav dayê. Ya rastî ev ji du salan zêdetir bû cînarê hevdu bûn, lê dîsa jî hevdu nas nedikirin. Tenê carna kêf û halê hevdu dipirsîn, ew jî heke di nêrdewenan de rastî hevdu bihatana. Îcar jî mîna her carê silav dane hevdu, hetta ji ber ku eceleya wî hebû qet bi deng silav nedayê, tenê hemangî serê xwe jê re hejand.


Berêka dunya sar dibû, berê, par û pêrar van çaxan zûva ye berf barîbû, her der bi berfa çîl û qerqaş nixamtîbû. Lê îsal emrê Xwedê hê berf nebariye, lê hişkî ye, hewa sar e, meriv dizane zivistan e. Gava sal weha sar û bê baran be, wê salê çêre û çandin xweş nabe. Dibe ku îsal jî ji wan salan be. Qet ev nedihate bîrê û bala wî nedikişand. Lewra êdî tu têtîliya wî bi çêre û çandinê re nemabû. Ya rastî wisa nebûbaya jî wî wisa dizanîbû.

Ji bo ku xwe zûtirkê bigihîne civanê, çû ew dikana li koşa kolanê ya texsiyên korsan lê disekinîn, li yekê sîwar bû û berê xwe da meqsedê xwe. Xwedê kirî ev texsiyên korsan jî hene. Qet nebe meriv di rojên tengasiyan de xwe diavêje ser bextê wan û ji xezeba texsiyên din yên fermî difilite. Dema peya bû, hê li kuçe û kolanên meriv kêmbûn. Dibe ku hinekî ecele kiribe. Lê bira bibe, ji

wê zirar nayê. Li seata xwe mêze kir, ji heştan re deh heyê. Li milê rastê dukana sisiyan simîtfiros bû, xwe li wê girt çaxê kete hundir hewayê germ rûyê wî alast. Li fêza dukanê maseyeke vala hebû. Rast çû wir rûnişt, ji garson porsiyonek borekê Kurdan û îskanek jî şîr xwest. Dema li hêviya borekê rawestiyabû, lê nihêrî dît ku karkerên dukanê di nav xwe de bi dimilkî dipeyîvin. Paşê kete bîrê ku li Stenbolê piyasa borekçiyên di destên Kurdên Çêwlikê de ye. Jixwe li Stenbolê borekên herî zêde jê hez dikir borekê Kurdan bû, lewra him tama wê pirr xweş bû û him jî navê wê!

Taştêya xwe qedand û berê xwe da ciyê civanê. Ev semt bi qasî moderniya xwe ewqasî jî kevnare bû, ango du heb demên dijber, berê û nika di nav xwe de diheband. Jixwe taybetiya wê ya herî berbiçavî ev bû. Mirov dikaribû du qernan tevayî li vê taxê bibîne. Avahiya ku hevalê wî ji bo bîroya xwe kirê kiribû jî ji wan xaniyên kevn bû. Her çendî baş nizanîbûya temenê wê çiqas e jî, ji hemû tiştên wê dihate zanîn ku pirr kevn e. Lê baş hatibû restorekirin, mîna xaniyên teze li ser piyan bû. Çaxê li qatê çaran ber derê pola rawestiya, hinekî bi kelecana bû. Pêlî zengila dêrî xist û rawestiya. Derî vebû û xortekî ew pêşwazî kir û derbasî hêla mêvanan kir. Hevalê wî hê nehatibû, lê hindik mabû bê, ji rojnameyên ser masê yek hilda û bê baldarî çavê xwe lê gerand. Nûçeyeke ku bala wî bikşîne tunebû, jixwe ew nûçe ji bo wî kevn dihatine hesabê. Lewra di înternetê de ew hê duh xwendibûn. Tenê nivîseke şîroveyê bala wî kişand. Lê ew jî nexwend, divê gava hişê wî vala be bixwîne da ku kêr bê. Loma navê wê di hişê xwe de qeyd kir û derbas bû.

Bi qasî niv saetê şûnda hevalê wî Ehmed hat û derbasî odeya wî bûn. Piştî kêf û halê hevdu pirsîn, Ehmed jê re got ku di derheq şaxa şîrketê ya li Rûsyayê bi şîrkên xwe re li hev nekirine, lê ji bo ku ev kar bibe dê bixebitin...●



Tu

Mehmet Öncü

-I-

Dibêjim “Hû” Hû Homa ye,
Homa xwediyê “Heq”a ye,
Heq Yêzdanê ku ez daye,
Yêzdan Xwedayê xwe daye...

Ez gustêrka wan nava me,
li dora te perwane me,
ronîkî perwanekî ye,
nezanekî dîwane me...

Elîf î lam û Tu mîm î,
sekn û herek herdaîm î,
dem û dewran û gerdûn î,
armanc û gîhanek Tu yî...

Dibên kesê bêkesan î,
kincqetî bêkirasan î,
rengê rûyê pêxwasan î,
aram û sekna dilan î...

-II-

Geh Tu dibî ava Botan,
li pêşberê Memê Alan,
çelpîna masî û maran,
li ber simê Bozê Rehwan...

Car heye Bekê Ewan î,
çavkaniya fesadan î,
car heye Zîna Zêdan î,
şahbanûya bedewan î...

-III-

Tu him bedew û çikos î,
hevdeketî û quros î,
şerabvexwarek serxoş î,
dewrêşanek “Hû” dikêşî...

-IV-

Rêyî-rêwî û Tu meş î,
westîn û vêsa dilgêş î,
herdem li rîyan diweş î,
sebra dergahê lalêş î...

-V-

Leyl û deqa’lenya Leylê,
Mecnûnê dîdarê’l deqê,
bextereşîya wê eşqê,
çirok û çirokbêj Tu yî...

-VI-

Tu him Rostem î him gurz î,
him aqildarê Guhderz î,
Rexşa ku rehwan dibezî,
dûra di hindirê nêzî...

-VII-

Ferhadê dest bikuling î,
Tu Şîrîn ar û çeleng î,
aram û sebran î reng î,
dilê bieşq de aheng î...

-VIII-

Li hêlekê daristan î,
him neçîr û neçîrvan î,
tîrs û beza xezalan î,
Tu hoviya lawiran î...

-IX-

Carna robar î carna av,
hereka avê de pêngav,
li pişt baranê dibî tav,
Tuyî tav û pêngav û av...

-X-

Yê her dem dimire tu yî,
Kujerê dikuje tu yî,
Sûretê şêr û piling î,
Dem û yê’l demê de tu yî...

-XI-

Dimirî dikevî axê,
dimînî dijî bi avê,
nîşana Te heye l’tavê,
ax û av û tav jî Tu yî...

-XII-

Dem û dewran çerx û geran,
feleka piştixwar û yeman,
tarî-neqenc û Ehrîman,
Tu yî ew qencê dilovan...

Tu hey bê Te kes tune yî,
rast û erwaz-nîşûv Tu yî,
sî û şewq û ronahî yî,
ser û bin pişt û pêşî yî...

Ewîstin û nefret Tu yî,
himpîyar û hesedî yî,
eşqa’ddile maşûq de yî,
zebûn û desthilat Tu yî...

Tu yî yeka d’hezarî de,
hezarê d’nava yekê de,
rehmeta d’nav hêjmarê de,
ew gerdûna bêdawî de...

1992

Ji bo yekîtiya zimanê Kurdî*

Nivîser: **MIHEMED ELÎ EWNÎ****

Ji tîpên Erebi: Wisif Zozanî

Zimanê Kurdî bi rastî zimanekî pir şîrîn û zehf zengîn û rengîn e. Çunkî galgala (mufredat) wî zor, awayê qisebêjî (lehce û uslûb) gelek zehf e. Ew jî ji ber belavbûna Kurdan e li serhedan û parçekirina welatê wan ê delal ê Kurdistan e li navbera du sê millet û dewletan da. Lewma Kurd, ji hev du veqetiyane û ji hev dûr ketine û ji zilm û bêbextiya dijminan, îstîfdat û tehqîra bêganeyan, bajaran û gundan berdane çûne ketine nav newalan û deştan û derketine ser çiyay û zinaran, dûr li medeniyet û mehrûm ji îlm û îrfanê.

Sewa wî zimanê wan ê Kurdî ê pak û delal ji nîmetê xwendin û nivîsandinê mehrûm maye. Û tenê (tenha) li nav gundî û eşîran da hatiye peyv û qisekirin. Ema xwenda û zanayê Kurdan -heke

gundî û eşîrî heke bajêrî be- gîşk bi zimanê bêgane û neyaran îlm û îrfan hînbûne û xwiyan (wan xwe) zana û xwendayên Kurdan hesibandine û hîç li zimanê bav û dê pirs nekirine. Ji ber vê gire û rîbata ku navbera Kurdan hebûye wenda bûye û bi yekcar ji nav wan rabûye. Ne ku li nav her berek ji bera Kurdan a mezin û gewre rabûye. Belku her eşîrekê ji Kurdan xwe tenê Kurd hesibandiye û bi musteqbelê yê dîn nexwestiye eleqedar bibe. Bi vî awayî tevda bêganeyî hev du bûne. Yanî çar-pênc mirovên Kurd eger li cihekî bicivin û dil bikin ku li ser welatê xwînan (xwe) qise bikin û ji belengaziya wî behs bikin, bêşik nikarin bi asanî û bi gengazî miraza xwîtan (xwe bi hevdu) bidin fêmkirin û netuwandin (nikarin) meqseda

Sewa wî zimanê wan ê Kurdî ê pak û delal ji nîmetê xwendin û nivîsandinê mehrûm maye. Û tenê (tenha) li nav gundî û eşîran da hatiye peyv û qisekirin.

* Ev nivîs di 25ê Tîrmeha sala 1933ê de, di kovara Hawarê, jimara 23ê de hatiye belavkirin. Me ji bo bîranîna Mihemed Elî Ewnî dîsa bi herfên latînî ev nivîs amade kiriye. (Wisif Zozanî)

** Mihemed Elî Ewnî ji Kurdên Dimiliyanê ye. Navbera salên 1897 û 1952ê de jiyaye. Dîroknasekî mezin e. Li ser dîroka Kurdan gellek kitêb wergerandine Erebi. Celadet Alî Bedirxan derheqê wî de wiha dibêje: *Mihemed Elî Ewnî Efendî ji xwendayên Kurdan ên welatparêz û miliyetperwer e. Bi xwe ji xelkê Sîwerekê ye. Li Misrê di Ezherê de xwendiyê. Ev deh sal in di dîwana qiranê Misrê de mutercim e. Li Şerefnamê ku vê paşiyê li Misrê hate çapkirin pêşgotineke hêja nivîsandiye.*

xwiyan (hev) hîn bibin. Çunkî her yek li wan bi awayekî qise dike û dilê xwe da dibê: Ez tenê Kurd im. Ê din eger Kurd jî bin, zimanê Kurdî nizanin. Çima? Çunkî zar û şîwê wî nizanin.


Welhal ewan hemû (heme, hemû, gîşk, tevda, giştî) zaro û lawên milletekî yekziman û yeknijad û yekxwîn in. Welê jî li hev nehatiye şîwe û zarên wan, nikarin hev û din nas bikin û xwe bidine naskirin.

Eger xwenda û zanayên milletekî bi vî awayî nikarin bi qise û nivîsa xwiyanî millî destê hev din bigirin û arîkariya xwitan (hev) bikin, bê şubhe ne mumkin e tiştekî din da jî destên hev bigirin û yekfikir û yekneseq bibin. Çira?

Çunkî nîşaneyên yekîtiya miletekî û yekbûna komelekê hebûn û heyîya zimanekî – bi kêmî yanî alel eqel li nivîsanê da- yekneseq û yekawa ye. Bê vê tiştekî din çênabe û nayê diristkirin qet. Niha li vir pîrsek tê bala hemû xwendevan û nivîsevan ew jî ev e: Çawan zimanekî Kurdî yê yekneseq û yekawa (alel eqel) li nivîsanê da tê peydakirin ku hemû Kurdan tê bigihîne û pê miraz û meqşeda xwiyan (xwe) biqedînin û çak (baş) eda bikin?

* * *

Min ev nivîsa xwe li vir nivîstî û bo ku ji (Hawar) re rêbikim, temyîz kirîbû û bi cûhaba wê pîrsê mijûl bûbûm. Ji jimara Hawarê ya şanzdehan da pîrsiyareke hêja doraliya vê mewzuyê, mewzuya nivîsara min da hatibû belavkirin û bi kurtî heyane yekiya gulanê (1ê Gulanê) cûhab dihat xwestin. Wexta ku min ev dît û xwend dilê min vebû û çavên min ronî bû û ez zor pê kêfxweş bûm. Seva wê mecbûr bûm cûhabê ku bo temamiya nivîsara xwe hazir dikirim heman bi te'dîl û texyîreke hindik binivîsim û bidim bo ev pîrsiyarên ku li Hawarê da hatiye belavkirin û paşê vegerim ser temamiya nivîsara (meqale) xwe û doraliya zar û zimanê Kurdî xasma zazayî (dumilî-dunbilî) da hinek zanîne bo hortê û ziman belav bikim ku heyane îro tiştek ji wê nehatiye neşîrkirin. Hêviya min ji mêrê delal û hêja xwediyê Hawarê, me hemû Kurdan ev e ku ji vî nivîsê tiştik dernexe ji ber ku dirêj e û muxalîfê şertê pîrsiyariya Hevendê Sorî ye.¹



Mihemed
Elî Ewnî
(1897-1952)

1. Zimanê Kurdî çawan xwerû û pak dibit?

Ma navê pîrsiyarê divêt weha bit. Zimanekî Kurdî ku tevayî (umumî) çawan tê peydakirin ko hemû Kurdan Kurdmanc, Goran, Lor, Kelhor, Bextiyarî, Zazan, Hawraman... -jor û jêr, rojhilat û rojavayê Kurdistanê da, tê bigihîne û karibin pê binivîsin û bixwînin. Çima ev pîrs lazim e weha bit? Çunkî zimanê ku hemû Kurdan, kêm û zehf têbigihîne hêj peyda nebûye û nehatiye meydanê ku mirov bi paqijî û safkirina wî mijûl bibe û bixerîke.

Her kes zane ku saf û paqijiya zimanekî hanca paş yekîti (wehdet) û lihevanîna zarên wî yên zehf tê tesewurkirin. Ji bo wê cûhaba vê pîrsê ewilî weha didin. Seva gihaştina vî mirazê û peydakirina vê armancê divêt berê herî tiştê çiqas zar û zimanên Kurdî wek Kurdmancî, Babanî, Zazayî, Lorî, Feylî, Bextiyarî, Hawramanî... -hene bi hemû wasiteyan û bi awayekî zanîni (uslub ilmî) were civandin û belavkirin. Yanî her zar û her şîwe da bi kêmî (alel eqel) du-sê kitêbok divêt were çapkirin ku heta zana û nivîsanê Kurdan, karibin jê fêde bibînin û şêr û gotin û nivîsa xwînan (xwe) bi qise û pîrs û galgala hemû zarên û lehcekanî (zaravayên) Kurdî çêkin û durust bikin û karibin qise û pîrsanê bêganeyan berdînin û hêdî hêdî destê wan jê were kişandin heta bitiwînan (bişên) bi awayekî Kurdî yê xalis û muxlis bêjin û binivîsin.

1 Hêvî û daxwaza te li ser seran û ser çavan. (Celadet Alî Bedirxan)

2. Bi çi awayî zarên Kurdistanê ên cihê cihê nêzînê hev dibin û zarekî welê tête pê ku Kurd hemû di zarên hev digihin?

Nêzîngbûna zar û zimanên Kurdî, hêdî hêdî û bi xwe bi xwe an-cax paş civandin û belavkirina wan dibit. Çunkî wê çaxê her yekê ji xort û ciwanên Kurdan ji xwe ra zarêktir -bi zarê xwe- dicibîne tedqîqat û xebata xwe ser wî zarê dimeşîne. Û ev mudayekê dewam dike. Netîcê da çiqas zar û lehceyanê Kurdan hene, têne belavkirin, lakîn bi awayekî zanistî. Û her xwenda û zana û nivîsvan dikare bo nêzîkkirina ezmanê Kurdî û zarên Kurdmancî û Zazayî... nivîsa xwînan (xwe) bi pirs û galgal û awaya hemû zar û zimanê Kurdî tevlihev û têkel bike. Û şev û roj bi vê armancê mijûl bibe. Û bo ku hemû Kurdên zana û nivîskaran, zanîn û tedqîqatê xwiyan (xwe) ku li hemû lehceyanî Kurdî da bikin were xwendin û têgîştin. Divêt îmlayekî (awayê nivîsin) muttefequn eleyhî mewcûd bê, heke latîfî bê heke Erebi. Meselen îmlayê Erebi yê ku pê zimanê Farisî û Osmanî mirî tê nivîsandin. Ji bo Kurdî jî -welew mu-weqqeten- çak e û baş e xasma li mabêna zana û munewweran da. Ne ku wek biranê me yê Kurdên welatê jêrînî Kurdistan ku nivîsa xwiyan (xwe) bi hurûfê muqette'e binivîsin heta metbeê da bibe wek şorbe tevlihev û têkel, mirov nikarîbî ji nav derkevêt.

3. Zimanê Kurdî çawan pêşve diçî û bi çi awayî bi ser dikevit?

Ji hemû nivîsvan û xwendavan ra nas e ku pirsyariya netîceya pirsyariya yekem û duduyan e yanî li paş civandin û belavkirina hemû zarên Kurdî û peydabûna zarekî tevayî, zimanê Kurdî xwe bi xwe

Tewecuhê Xews

Xewsê Hîzan (Seyîd Sibxetulah)-Xeyda

Ji tîpên erebî: Sîpanî.

Dilo melûlo çiya bang dikir li çiyar
 Kanê xelqê li van ciyan
 Digo: Koçer bûn
 Biharê hatin
 Payîzê dageriyan

Dilo melûlo li min li vî dilî
 Dilê min nuqteyek ji nuqta qirê
 Sîtila qetranê di bin de kelî kelî
 Gava malê me li warê jorîn bûn
 Çima te deng nekir
 Vêga bûye mehelê xatir û destberdanê
 Êdî fayde nake gazî û girî

Dilo melûlo çiya li çiya dikir gazî
 Dar û deviyar pelçimê xwe weşandin mane rût û tazî
 Gava malê me li warê jorin bûn çima te dengê nekir
 Vêga malê me hatine wanê jêrîn, danîne li xurnukan
 Teze tu destiyê gulan ji min dixwazî.

bi ser dikeve û pêşçûyî tê hesibandin. Lê sewa ku zû ser bikeve û zehf zengîn û rengîn bibe, lazim e piştî salekê ji van xebatanan civateke hemûwayî-tevayî (mu'temer umûmî) bo ziman were li hev û ji bo yekkirina awayê nivîsin (îmla) û zarên Kurdî (lehecat) û danîna istilahata zanistî-zanîni mijûl bibe û bixerîke. Û qerarata ku ji van xusûsan derêdixe, divêt nik hemû Kurdziman meqbûl bit û bi dil were tenfîzkirin. Û dibit herkes bizane ke(ku) mirovatî û qedr û qîmeta wî bi şuxulandina zimanê bav û bapîr û dê û dotmaman tê naskirin û zanîn. Ji ber wê, lazim e li ser hemû Kurdên welatparêz, zar û zêçên (xwe) xwiyan bi zimanê Kurdî yê tewayî hîn bikin û hemû nivîsa xwe bi vî zimanê dayikê binivîsin. ●

Misir el-Qahîre **Lacî Henî?**

2 Ev leqeba bapîrê Mihemed Elî Ewnî ye. Ev leqeb bo xwe jî şuxulandiye. (Wisif Zozanî)

Zimanê Medreseya Zehrayê û Dibistanên Herêmî

GERNAS

Di sedsala 19an de Ewropa bi her aliyê ve pêşve diçû. Dewleta Osmanî jî têk diçû û paş de dima. Ji bo ew jî ji vê pêşbazîya medeniyetê paş nemîne, rojava ji xwe re model digirt û di her qadê de guherîn çêdikir da ku wekî berê serkeftinan dest bixe.

Wekî her qada jiyanê di perwerdehiyê de jî guherînên mezin pêk dihatin. Ji aliyê din ve, medreseyan Kurdan ji ber van guherînên lezgîn û bênavber bêqîmet dibûn. Ew medreseyan ku berê alimên hêja ji nav xwe derdixistin, ketibûn bêdengiyekê.

Osmaniyan ji ber bayê rojavayê, di warê perwerdehiyê de jî guherînên bingehtin pêk dianîn. Hê di serê 1800an de bi terz û mantiqa Ewropayê dest pê kiribûn mektep ava dikirin. Her wiha van dibistanên bi Tirkî perwerdehî didan, li Kurdistanê jî dihatin avakirin. Ji aliyê din ve dest nedidan medreseyan Kurdistanê, li gorî demê nûjen nedikirin.

Cîhan diguherî, dewlet diguherî, sîstem diguherî. Her

tişt ketibû ber vî bayê guherînê. Divê medreseyan Kurdistanê jî li gorî demê bihatana sazkerin û bi zanistên hemdemî bihatana xemilandin. Lêbelê, dewletê dest nedida van medreseyan, ji aliyê din ve mektebên bi zimanê Tirkî li Kurdistanê ava dikir. Ji ber vê zarokên ku diçûn medreseyan bi zimanê xwe perwerdehiyê qels didîtin, herwiha ji fennên lazimî/zanistên hemdemî jî bêpar diman. Zarokên ku diçûn mektebên nû jî, ji ber ku zimanî fermî/Tirkî nizanibûn jê îstîfade nedikirin, hem jî di van mekteban de ilmên dînî kêmtir dibûn. Yanî ev mektep li bejna Kurdistanê nedihat. Bi vî awayî Kurdistan her diçû paş de dima, nezanî pirtir dibû. Ev cehalet dibû sedema gelek nexweşiyên din jî...

Wanên ku bi vî rewşa kambax dilê wan dişewitî, hewl didan da ku vî pirsgirêkê çareser bikin. Alimê mezin Bedîuzzaman Seîdê Kurdî jî ji van kesên xîretkêş bû. Wî ev nexweşî pir baş dîtibû û niha jê re tedawî lazim bû. Divê dibistan û perwerdehî bihata Kurdistanê. Bi vî fikrê Seîdê

Zimanê dibistanên herêmî seranser bi Kurdî ye, zimanê Medreseya Zehrayê Erebi, Kurdî û Tirkî bi hev re ye. Gelek kes di nivîsar û pirtûkên xwe de vî meseleyê şaş dinirxînin û radigihînin

Kurdî ket rê û bi salan xebitî da ku dibistanên bi zimanê Kurdî û Medreseya Zehrayê bê vekirin.

Lê divê bê fêmkirin ku Seîdê Kurdî dema daxwaza perwerdehiyê dikir zimanê zikmakî şert digirt. Yanî dibistanên ji bo Kurdistanê dixwest divê bi Kurdî bûna. Lewre jixwe mektebên bi zimanê Tirkî hatibûn avakirin.

Dema meriv bala xwe dide berhemên wî, tê dîtin ku ji aliyê zimanê perwerdehiyê ve Medreseya Zehrayê û **dibistanên herêmî** ji hev cuda ne. Ji bo ku zimanê perwerdehiya Medreseya Zehrayê rast û baş bê fêmkirin, divê dibistanên herêmî û zimanê van baş bê fêmkirin. Ji ber vê di vê nivîsê de emê pêşî li ser dibistanên herêmî û zimanê van rawestim.

Zimanê dibistanên herêmî seranser bi Kurdî ye, zimanê Medreseya Zehrayê Erebî, Kurdî û Tirkî bi hev re ye. Gelek kes di nivîsar û pirtûkên xwe de vê meseleyê şaş dinirxînin û radigihînin. Wer fêm dikin ku Seîdê Kurdî dixwaze ku zarokên Kurdan bi Erebî+Tirkî+Kurdî dest bi perwerdehiyê bikin. Yanî dibêjin qey Seîdê Kurdî Medreseya Zehrayê ji bo destpêkê xwestiye. Lê Medreseya Zehrayê zanîngehek e, dibistanek (seretayî, navîn) an jî lîseyek nîn e. Saîdê Kurdî xwestiye di serî de dibistanên bi Kurdî vebin. Zarokên ku li van dibistanên herêmî bi zimanê xwe, bi tabîra îro, heta lîseyê perwerdehî dîtin êdî dikarin biçin Medreseya Zehrayê an jî zanîngeheke din bi zimanên din perwerdehiya xwe bidomînin.

1-Zimanê dibistanên herêmî

Ji bo fêrbûn û fêmkirinê rola zimanê zikmakî çiqas girîng e îro ji hêla pir kesan ve baş tê zanîn. Bi taybetî jî ku ev kes zarokekî ku zimanekî din nizanibe, perwerdehiya bi zimanê wî 'nebe, nabe' ye. Her wiha Seîdê Kurdî jî ji vê meseleyê haydar bû û ev mijara wiha dinirxand: *"Ziman mora qedera mirovan e. Heçî sûretê mirovahiyê ye, di reng û rûyê ziman de xweşikahiya xwe dide der. Ji ber ku zimanê maderzad sirûştî ye, bêyî ku lefz bîn vexwendin tîn bîra mirov. Ji ber ku danûstandin tenê bi maneyê tê kirin, di nav duriyanê de heyirî namîne û agahdariyên dikevin vî zimanî mîna 'neqşên ale'l hacir/ neqşên li ser kevir' mayende dimînin. Û her çi tiştên ku bi vî kirasê zimanê millî bixuyên henûn dibin."*

Di sala 1907an de hat Stenbolê û ji bo dibistanên bi zimanê Kurdî û ji bo projeya mezin Medreseya Zehrayê daxwaznameyek da Abdulhemîd. Ev daxwaznameya wî çend roj şûnde bi sernavê "Kurd dîsa hewcedar in" di rojnameya *Kurd Teavvun* ve *Terakkiyê* de tê weşandin:

"Rewşa gelê Kurdistanê ku di nav milletên Osmanî de girseyeke mezin pêk tînin, ji hêla hikûmetê ve herçiqas bê zanîn jî, derbarê xîzmeta zanistî ya qudsî de destûr dixwazim ku çend daxwazan pêşkêş bikim:

Di vê cîhana şaristaniyê de û di vê dewra pêşveçûn û pêşbaziya de wekî hevalên xwe yê din, ji bo ku Kurd jî

di pêşveçûnê de yekaheng bin, herçiqas bi xîret û xebata hikûmetê li navçe û gundên Kurdistanê avakirina dibistanan bi dilxweşi hatibe pêşwazîkirin jî, di van dibistananên han de tenê zarokên ku Tirkî dizanin jê îstîfade dikin. Zarokên Kurdan yê ku Tirkî nizanin tenê ilmên medreseyê sedema kemalatê dizanin. Ji aliyê din ve mamosteyên van dibistanan zimanê herêmî (Kurdî) nizanin. Ji ber van sedeman zarokên Kurdan ji perwerdehiyê bêpar dimînin. Ev jî bi xwe re tevlihevî û geremolîyê tîne û dibe sedema şemateya 'rojava'yê. Hem jî gel ji ber wehşet û teqlîdê dibin armanca şik û gumanan. Yê ku berê ji her alî ve, ji Kurdan paşdetir bûn, ji vê paşdemayîna Kurdan îstîfade dikin. Ev rewş xîretkêşan dixwe nav fikaran. Û ev her sê xal wekî ku wê di paşeroşê de darbeyeke mezin amade bikin, dilê mirovên pêşbîn diêşînin.

Çareya vê; ji bo bibe mînak û pêşengiya teşvîqê bike li Kurdistanê li sê cihên cuda;

Yek jê li Beytusebabê ku navenda Ertûşyan e,

Ya din li Sasonê ku di nava Motkan û Beyqan de ye,

Û ya din jî li Wanê ku di nava Sîpkan û Heyderan de ye, sê fêrgehên ku tê de fennên dînî û lazimî bi hev re bîn dayîn û bi navê medreseyê ku hînbûyî ye bê avakirin. Qet nebe pênçî xwendekar lê bixwînin û hewceyiyê wan ji hêla hikûmetê ve were dayîn.

Ji xeynê van jinûvekirina hin medreseyên din jî ji bo paşeroja Kurdistanê ji aliyê

maddî û menewî ve sedemeke girîng e. Bi vî awayî wê bingeha perwerdehiyê bê avakirin. Wê li ser vê bingehê yekîtî pêk bê. Her wiha ew hêza mezin a ku tune bibû dê bikeve destê hikûmetê da ku ji bo derve bê xerckirin. Wê Kurd bidin zanîn ku musteheqê edaletê, layiqê medeniyetê ne û dê cewherên xwe yên fitrî nîşan bidin."

Her wekî jê vê nivîsê jî tê fêmkirin ku dibistanên Tirkî vebûne û Kurd jê sûd wernagirin. Nezanî dertê holê. Di vê dewra pêşveçûnê de her kes dide li ser rêya teraqiyê lê Kurd li ser rê dimînin. Çareya vê; divê li cihên ku hatine destnîşankirin de dibistan vebin û zimanê perwerdehiyê divê seranser bi Kurdî be. Bi vî awayî dê Kurdistan geş be. Zarokên ku ji van dibistanan îcaze digirin, êdî dikarin bi zimanên cuda cuda perwerdehiya xwe bidomînin.

Her wiha Seîdê Kurdî di berhema xwe ya *Munazeratê* de jî qala perwerdehiya bi zimanê zikmakî dike. Dema Kurd jê dipirsin: "Ji kirêtiya îstîbdadê û ev çend qenciya meşrûtiyetê re delîlê te çi ye?" Ew bi mînaka hekîmekî vê meseleyê îzah dike. Diyar dike ku hikûmeta îstîbdadê bê lêkolîn û bêyî ku derd û pirsgrêkên gel teşhîs bike, li gorî kêfa xwe derman ji wan re dişîne; yê ku birçî ye û zikê wî diêşê, dermanê hezîmê dişîne û ji wan bacê kom dike û hwd. Ji aliyê din ve ji bo mînaka hikûmeta meşrûtiyetê wiha didomîne: **"Ferz bikin ez hekîmek im. Ev kon bi xwe jî dermanxane ye. Ez tê de me.**

Mirovekî bijarte li temamê gundan û li malan geriyaye, nexweşiyên wan ên cur bi cur teşhîs kiriye, reçeteya xwe nivîsandiye û tê cem min, reçeteya xwe nîşan dide û tê de 'nexweşiya nezaniyê û serêşê heye.' Ez jî afyona fennê serê pêşî di maweya nav zimanê wan de û peyre werdigerînim zimanê fermî û didim."

Yanî Kurd nexweşiya nezaniyê ketine. Divê di serî de bi zimanê xwe, ango bi Kurdî perwerde bibin, piştî zimanê perwerdeyê wergerînin fermî, ango Tirkî.

2-Zimanê Medreseya Zehrayê

Her çiqas me di serî de got Medreseya Zehrayê û dibistanên herêmî ji hev cuda ne, ev nayê vê wateyê ku tu pêwandiya wan ji hev tune. Helbet Medreseya Zehrayê bi Kurdan ve gelek têkildar e. Lewre ev medrese dê li Kurdistanê bihata avakirin. Her wiha xwendekarên Kurd ên dibistan û lîse qedandin, dê bihatana lê bixwendana. Ya girîng alimên Kurd dê tê de mamostetî bikarana.

Lê ji aliyê din ve Medreseya Zehrayê ji bo alema îslamê bû jî. Wê her li her welatên îslamê xwendekar bihatana tê de perwedehî bidîtana. Hem jî li ser erdê Dewleta Osmanî dê bihata damezrandin. Ji ber van her sê xalan ji bo zimanê perwerdehiya Medreseya Zehrayê, Seîdê Kurdî digot: 'zimanê Erebi wacib, Kurdî caîz, Tirkî lazim were girtin.'

Dema meriv pirtûk û nivîsên derbarê Medreseya Zehrayê de

dixwîne, dibîne ku ev hevok şaş hatiye fêmkirin. Ji dûtê mantiq û fikra Seîdê Kurdî hatiye nirxandin. Dibe ku wan kesan Bedîuzzeman baş fêm nekiribin û dibe ji ber nezaniya xwe xelet ragîhandibin û ketibin vê rêyê. Lê ev hevok tê çî wateyê:

Erebî wacib e. Medreseya Zehra zanîngeheke bilind e ku divê mezherê vê fikira Bedîuzzeman be: "Ronahiya wijdanê, ilmên dînî ye. Nûra aqil, fennên medenî ye. Bi mezckirina herduyan, heqîqet tecellî dike. Bi wan herdu aliyên xîreta telebeyan bi per û bask dibe. Gava ku ji hev û din biqetin, ji ya pêşî teessûbî; ji ya din hîle û guman dertên.' Di vê medreseyê de wê ilmên dînî bîn xwendin û alim jê derên. Ilmên dînî bi Erebi ne. Ji ber vê Erebi divê teqez bê xwendin. Lewre alimekî ku Erebi nexwendibe û nizanibe dê jê re çawa alim bête gotin? Lewma Erebi wacib e. Ku nebe, nabe.

Kurdî caîz e. Dema ku Seîdê Kurdî şertên Medreseya Zehrayê rêz dike dibêje. "Ji alimên Kurd ên ku Kurdên zulcenaheyn bi wan bawer in, an jî ji bo hînbûnê divê ji wan kesên ku bi zimanê herêmî aşîna ne, wek mamoste bîn hilbijartin." Her wiha dibêje, "em dixwazin ku îstîqbala gelê Kurd û alimên gelê Kurd temîn bikin." Ji aliyê din ve medreseyek di nav Kurdan de avabûye û bi piranî xwendekarên wê dê Kurd bin. Ji ber van sedeman di perwerdehiyê de ji Kurdî normaltir tiştê tune. Helbet dê dersên bi Kurdî hebin û xwendekar dê Kurdî bizanibin.

Lewma 'Kurdî caîz e' bi awayî 'Kurdî bibe jî dibe, nebe jî' bê fêmkirin xelet e. Lewre ji hevokên li jor jî diyar e alimên Kurd dê mamostetiya Medreseya Zehrayê bikin, xwendekar bi piranî Kurd in û jixwe medrese li Kurdistanê ye. Ji zimanên medreseyê yek jî Kurdî nebe qet dibe gelo? Herwiha wateya peyva 'caîz'ê 1-fermî û 2-derbasdar e. Ji ber vê meriv dikare bibêje ku piştê Erebî zimanê medreseyê yê derbasdar Kurdî ye.

Tirkî lazim e. Wê demê Dewleta Osmanî li Kurdistanê desthilatdar bû. Zimanê fermî yê dewletê Tirkî/Osmanî bû. Ji ber vê dibîsatenek an jî saziyeke din a li ser erdê dewletê bê vakirin, divê bi zimanê fermî jî perwerdehiyê bide. Yan jî heke ev ziman ji hêla xwendekaran ve an jî ji hêla hemwelatîyên din ve neyê zanîn dê pirsgrêk derên holê. Lewma Tirkî lazim e.

Encam

Bedûzzeman dixwest wekî her milletî, Kurd jî bi zamanê xwe perwerdehiyê bibînin. Ji ber vê taleb dikir; bila li şûna mektebên bi zimanê Tirkî, dibistanên bi zimanê Kurdî vebin. Û di van dibistanan bila mamosteyên Kurd an jî yên ku Kurdî dizanin bîn bicihkirin. Her wiha ji bo paşeroja alimên Kurd û gelê Kurd bê temînkirin, bila Medreseya Zehra bê vekirin. Bila zimanê perwerdehiya vê medreseyê Erebî wacib, Kurdî caîz û Tirkî lazim bê girtin. ●

Te nizanîbû

Şemoyê Memê

Gotineke min hebû wextek berê,
 Dî nava lêvan da ma.
 Nêrînek min hebû, li ber çavê te,
 Bi şermayî ma.
 Sondeke min hebû, hê jî heye.
 Wexta min tu didîtî gotin nedihat gotinê.
 Lêvên min dileqiyar,
 Pirs dernediketin
 Dilê min dipîpitî.
 Deng nedihat.
 Min ji te hez dikir
 Te nizanîbû.
 Min gulên sor ji bo te anîn,
 Te nizanîbû.
 Min ji te hez dikir, ji bo te dişewitîm,
 Te nizanîbû.
 Fîkr û xeyalên min hebûn ji bo min û te,
 Û mala me,
 Xewnên min hebûn,
 Min tu di xewnan de hez dikirî,
 Li ser lêvên min sê hevok,
 Nehatin gotinê ji bo te.
 Min ji te hez dikir,
 Te nizanîbû
 Çavên min li ser te, heta tu ber çavê min winda dibûyî.
 Bêhna te ez dîn dikirim,
 Te nizanîbû.
 Agir berda canê min,
 Berê sifte, min nizanîbû.
 Evîn derdekî mezin e, min nizanîbû.
 Min tenê xwest ji te hez bikim,
 Lêbelê te nizanîbû.

Li pirsâ Kurdî nêrîna bê pirsgirêk

ZAHÎT ÖZKAN

Pirsâ Kurdî, pirsgirêkeke ku serê wê dighêje heta beriya Cumhûriyetê. Piştî avabûna Cumhûriyetê jî, berdewam kiriye û hatiye heta roja îro.

Sedemê Pirsâ Kurdî, Kurd bi xwe nînin. Yanî Pirsâ Kurdî, ne ew e ku Kurd, ji ber daxwaza heq û îmtiyazeke ku heq nakin, derketiye holê. Gelê Kurd di hemû dewrên dîrokê de, di war û welatê xwe de, bi awakî xwemalî jiyaye. Û ev gelê Kurdê hanê xwemalî, nasnameya wî, zimanê wî û çanda wî heye. Herwuha Kurd, xwedî mafê netewî, çandî, siyasî û civakî ne.


Sedemê Pirsâ Kurdî yê eslî û bingehîn, ew polîtîka û rêbaz in ku îdeolojiya fermî tetbîq kiriye û daye tetbîqkirinê. Îdeolojiya fermî, gelê Kurd yan înkâr kiriye yan jî daye ber asîmîlasyonê. Evan polîtîkayên îdeolojiya resmî yên înkâr û asîmîlasyonê, Pirsâ Kurdî bêtir giran kiriye. Îro hê jî di mekteban de sube û êvar, di bin navê “Sonda me/Andımız” de, gotinên bi rengê “Ez Tirk im, rast im, jêhatî me...” didin xwendinê. Heyf û mixabin ev polîtîkayên hanê, di vê roja me de jî, berdewam in.

Saziya siyasî ya ku li çareserîya pirsâ Kurdî digere, burokrasî,





kesên rewşenbîr, nivîskarên xwedî nasnameya Îslamî û hwd. ji îdeolojiya fermî pak nebûne. Pêşniyarên çareseriyê yên van kes û saziyên ku ji îdeolojiya fermî pak û paqij nebûne jî, mixabin nikarin rê û encama rast nîşan bidin.

Evan polîtîkayên ku heta roja îro dewlet û kesên ku piştgiriya dewletê dikin, tetbîqa wan kirine, ji bo dewletê bûne xeter û tehlîkeya herî mezin. Ji bo ku ev pirsgirêka hanê bêtir mezin nebe, divê saziya siyasî, burokrasî, rewşenbîr û nivîskarên xwedî nasnameya Îslamî gavekî pêşta, dest ji nêrîna bi pencereya ku rejîm lê dinêre, bikşînin û dev ji polîtîkayên ku heta niha tetbîq kirine, berdin. Gere dest da nasname û perwedeya zimanê zikmakî û çand û heqê siyasî û civakî yên Kurdan bên nasînê. Divê neyê jibîrkin ku çawa Erebb, Çerkez, Fransîz, Yûnan, Ermenî û gelên din, her yekî wan milletekî cuda ye, Kurd jî milletekî cuda ye. Divê ku dayîna heq û huqûqê vî milletî, wek lutf neyê dîtinê. Gere polîtîkayên çareseriyê, bi nêrîn û nezereke nû ve, bêne sererastkirinê. Her wusa jî, divê rê û rêbazên nû, pêk bînin û bînin pêşxistinê. ●

Îdeolojiya fermî,
gelê Kurd yan înkâr
kiriye yan jî daye
ber asîmîlasyonê.
Evan polîtîkayên
îdeolojiya resmî yên
înkâr û asîmîlasyonê,
Pirsâ Kurdî bêtir
giran kiriye



Ji refên Nûbiharê!



Çapên Nû!

